

MEM Û ZÎN

EHMEDÊ XANÎ







EHMEDÊ XANÎ

Türkçesi : M. E. Bozarslan

GÜN YAYINLARI

Başmusahip Sokak, Tan Ap. No. 6

İSTANBUL — 1968

MEM Û ZÎN dı nava pirtûkên bêjeyîyên dinyayê ên nemırda lı qora pêşın cih girtîye. Ev pirtûka gewre bı babetê xwe hevtayê ROMEO Û JÛLÎYET'a Şekspîr û LEYLA Û MECNÛN'a Fızûlî'ye.

Hem bı babetê xwe, hem jî bı fesahet û rûmeta xweya bêjeyî ev pirtûk dilê her xwendevanî bı alî xweda dı kêşe û hêjayîya xwe bı her kesî dı de qebûlkırın.

Xasma lı Rohelatê welatê me dı nava gelên xelkêda ev pirtûk pır û pır hatîye naskırın. Bı wî qasî ku gelek mirovên nexwendî jî lı gorî xwe hinek perçên wê jiber dı kın û carna ku mınasebet tê, jî dev dı xwînin.

Lê mîxabin ku xwendevanên welatê me, ên ku bı zarê Kurdî û Tirkî dı peyîvın tev, jî xwendina vê pirtûka hêja heta nuha bê par mane. Lewra pirtûk bı herfên Erebî hatîye nivîsîn û bı zarê Tirkî ne hatîye wergerandin. Jı ber vî, tenê kesên ku bı zarê Kurdî û herfên Erebî tev dı zannın, dı karın wê bı xwînin. Eşkeraye ku hejmara vana jî pır û pır hendike.

Jıbo vê ihtîyaca han me MEM Û ZÎN'ê hem wer gerand bı herfên Latnî hem jî wer gerand bı zarê Tirkî. Bı vî awayî fersenda xwendina wê, jî xwendevanên ku bı zarê Kurdî û Tirkî dı peyîvın tevra çê dı be.

Jıbo ku mîqayesekırına eslê wê û wergerînika wêya bı zarê Tirkî jî xwendevananra hêsan be, me rûpelên Kurdî û Tirkî lı hember hevdû, rûpelên Kurdî lı alî çepê, ên Tirkî jî lı alî rastê danî. Dı her rûpelekıda bı qasê hevdû ferd hatın rêzkırın.



Jı ber ku ev pirtûk dı dawîya sedsala XVII'anda hatîye nivîsîn, wek pirtûkên hevdemêd wê gışt, dı wêda jî gelek pirsên Erebî û Farisî hene. Tabîî dı wergerînika Tirkî' da me van pirsan jî wek ên Kurdî wer gerand. Lê dı eslê

pirtûkêda me van pirsan ne guhart û li ser halêd wan nivîsî. Ji ber ku her kes bi mana vana nî zane, me di dawîya pirtûkêda ferhengêkî jî van pirsanra çê kir û mana wan di wê ferhengêda bi zarê Kurdî û Tirkî tev nivîsî.



Çîroka Mem û Zîn'ê bi navê «Memê Alan» di nava xelkê Kurdd a gelek belavbûyîye û gelek kevne. Ev çîrok jî berî Mîladêve di nava xelkêda tê gotin û bûye destanekî mîtolojîk.

Hozanê mezin Ehmedê Xanî jî jî çîroka «Memê Alan» îlhama xwe girtiye û bi wê îlhamê wê çîrokê li gorî jîna dema xwe xistiye kirasekî mîşexxes, bi awakî hevdemî û modern nivîsiye. Bi vê yekê hem çîrokê jî windabûnê rîzgar kiriye, hem jî jî bêjeyê Kurdî'ra eserekî nemir diyarî kiriye.

Xanî di vê pirtûkêda li dora evîna Mem û Zînê, jîna dema xwe û wezîyeta wêya komelî, zanîyarî û îdarî jî bi hunermendyekî xurt teswîr kiriye û anîye ber çavan. Başîyê, rastîyê, bê, gunehîyê, jariyê û bindestîyê di şexsê Memê û Zînê da cîvandîye û nîşandaye. Xirabîyê, şalûzîyê, fesadî û durûtîyê jî di şexsê Bekir'da kiriye qalîkekî mîşexxes û li ber çavan ra xistiye.

Ji bil vana zîhnîyeta ku wê demê li ser karbidestên dewletê û çerxa îdarî û siyasî hakimbûye jî bi terzekî hostayî daye fêmkirin; vê zîhnîyeta paşdamayî, sîtemkar, çewt û kufîkî helanîye û li erdê xistiye; tevger û zîhnîyeta karbidestan, xasma rabûn û rûnîştina wan bi gotinên kesên dilreş, kîndar, mefaperest û şalûz anîye rastê, teqbîhî kiriye û adeta li dijê vê sazûmana rîzî û sîtemkar ra bûye.



MEM Û ZÎN berî nuha sê caran hatiye çapkirin:

1 — Sala 1919'wan lı Stenbol'ê, bı herfên Erebî.

2 — Sala 1958'an lı Şam'ê bı herfên Erebî.

3 — Sala 1962'wan lı Moskowa'yê bı herfên Latînî.

Jı bıl vî, gıştê pirtûkê bı zarê Rusî û çend pişkên wê jî bı zarê Elmanî hatîye wergerandin. Hema hema dı hemî ansîklopedîyên dmyayêda qala wê nivîsarê wê tê kırım. Lı welatê me navê wê û jînenîgarîya nivîsarê wê bı kurtî dı ANSÎKLOPEDÎYA, ÎSLAM, fasîkula 68'an, rûpela 1113'anda derbaz dı be.

..

Amanca me jı wergerandin û belavkirina vê pirtûka hêja eve ku, em vê pirtûka nemira kılasîkî jı xwendevanên welatê xwera bı dın karkırın û bı wan bı dın naskırın. Em bawer dı kın ku ev wergerandin û belavkirina me, dê hem jı zêdebûna zanîyarîya xwendevananra, hem jı jı dewlemendbûna pirtûkxana welatê mera bı be xızmetekî. Eger ev bawerîya me bı cîh bê em dê xwe gelek bextewer bı hesibînin.

Jı bıl vî, jıbo ku wergerandina vê pirtûka nemir bı herfên Latînî û bı zarê Tırkî jı mera bû nesîb, em gelek kêfxweşın.

20/10/1968

M. Emîn Bozarslan

JÎNENÎGARÎYA XANÎ

Ehmedê Xanî sala 1651'ê li hêla Hekkarî'yê li gundê Xan'ê hatîye dinê. Dî demekî kurtta bî zanîn û zanîyarîya xwe nav û deng daye, dî vê rastêda gelek pêşda çûye. Dî 14 salîya xweda ketîye jîna nivîsariyê.

Xanî jî bêjeyê Kurdî'ra xîzmetekî pîr hêja kirîye û definkirin. Lê mixabîn ku tarîxa wefata wî ne kifşe. Meqbera wî li Bayezîda Rohelat ziyaretgaha xelkêye.

Xanî jî bêjeyê Kurdî'ra xîzmetekî pîr hêja kirîye û gelek şê'r û eserên qedîrbîlind diyarî kirîye. Şaheserê eserêd wî MEM Û ZÎN'e. Hozan vê pirtûkê sala 1695'an temam kirîye. Der heqê destpêkirina wêda tu wesîqe tunîn. Tê gotin ku sala 1690'î dest bî nivîsîna wê kirîye.

NÛBARA BIÇÛKAN jî pirtûkekî wîyê hêjaye. Ev pirtûk Ferhenga Erebi-Kurdîye, ew jî wek MEM Û ZÎN'ê tev menzûme. Dî serê her pişkekî wêda jî şîretêkî der heqê mefa xwendinê, xebatê, rastîyê û karên weha yên kome-lîda nivîsiye. Tarîxa nivîsîna NÛBARA BIÇÛKAN 1684'e.

Jî bîl vana EQÎDA ÎMANÊ jî bî nezîm nivîsiye. Ev û NÛBARA BIÇÛKAN bî hevdûra çend caran li Stenbol'ê hatine çapkirin.

Xanî dî dema xweda gelekî pêşdakarbûye; çawa ku jî MEM Û ZÎN'ê jî tê fêmkirin li dijê neheqîyê, sîtemê, şûndakariyê û sazûmana feodal cephe girtîye, dî vê rêda pîr tîkoşîn kirîye; alîkariya rebenan, xîzanan, bîndestan û bersîteman kirîye. Wek hûnek zanayên hev-demêd xwe jî karbîdestanra û sîtemkaranra şalûzî ne kirîye, li dû mefayê ne beziye. Kurta gotinê: Tîm û tîm li alî xelkêbûye. Mesela dî pêşgotina NÛBARA BIÇÛKAN'da gotîye ku:

«Min ev nivîsî ne jibo sahib rewacan

Belkî jibo biçûkêd Kurmancan»

Jî vî jî bî eşkerayî tê zanîn ku xızmeta wî jî kesên xwedî rewac û xwedî meqamra, jî hendikên bextewerra ne bûye; jî pîranîya xelkêra, jî zarûkên xelkêra xızmet û xebat kirîye.

Hozanê mezin dî fıkra xweda serbestbûye, bawerîyêd xwe bî wêrîn gotîye û nivîsîye, dî vê yekêda jî tu tîşteki fîkar ne kirîye û jî gotin û nivîsîna rastîyê qet û qet paşda ne maye.

Xanî li dû moda wê demê ya arîstokratîk ne gûye û wek zanayên dîn pirtûkên xwe bî zarê Erebî û Farisî ne nivîsîye. Eserên xwe gişt bî zarê xelkê, bî zarê xweyê dê, bî zarê Kurdî nivîsîye û bûye yek jî pêşrewên bêjeyê Kurdî.

Hozanê nemir, dî meydana bêjeda çawa hunermendbûye, dî meydana felsefê û zanîyarîyêda jî wisa dî pêpîlûkekî bîlînddabûye. Dî vê yekêda jî zanayên Rohelatî hevtayê Fîrdewsî, Sadî, Fîzûlî û yên wek wanbûye. Çawa ku jî pirtûka wî jî tê fêmkirin xwedîyê felsefekî pîr kûr û zanîyarîyekî pîr ferebûye.

Jî bî zarê xweyê dê Kurdî, bî zarê Tirkî, Erebî û Farisî jî baş dî zanibûye.

Gelek mîxabin ku der heqê jîna wîda zanîneki bî sîpartek û wesîqe dî destê meda tunne. Lê ev yek tesellî dî de me ku, eserêd wî navê wî xîstine nava qora mirovên nemir û wî timzîndî kirine.

I

PESNÊ XWEDÊ

Sernameê name namê Ellah
Bê namê wî natemane, wellah

Ey metleê hısnê îşqebazî,
Mehbûbê heqîqî-yû mecazî

Namê teye lewhê nameya îşq
ismê teye neqşê xameya îşq

Bê neqşê te neqşê xame, xame
Bê namê te name, natemane

Namê teye şahê beytê meqsûd
Fîhrîstê mıkatebatê mehmûd

Mazmûnê mirasetatê «lareyb»
Meşhûdê mıkaşefatê bîlkeyb

Mehbûbê qulûbê men lehul-qelb!
Qelban tu di kî bî bal xweve celb

Maşûq-ı tu'wî, bî fexr û nazî!
Aşiq tu'wî, lêk-î bê nîyazî!

Mitleq tu mîfid û mistefadî
 Bê şîbhe mîrîd û hem mîradî!
 Nûrî tu dî hîsnê rûyê dîldar
 Narî tu dî qelbê aşîqê zar! (1)
 Şem'î, ne jî qîsmê nûr û narî
 Şemî, jî eyan tu perdedarî!
 Gencî tu dî nêv tûlîsmê alem
 Kenzî tu eyan jî îsmê adem
 Ev alem û ademî-yû meşhûd
 Ev mîmkun û masîwayê mewcûd
 Hemyan bî teye mîdare û debr
 Feyyazê rîyazê xelqê wel-emr!
 Emrê te bî lefzê «Kun» du alem
 Mewcûd-î kîrîn, xerez çî adem
 Adem bî xwe yek jî herduwane
 Yek herfe jî emrê «Kun», fekane
 Ew herfe heqîqeta mîheqqeq
 Hem emre bî qudreta te hem xelq
 Eşbah-î mîressemîn jî nasût
 Erwah-î mîwessemîn bî lahût
 Ev rûh û cesed bî cebr û îkrah
 Tezwîc-î buwîn bî emrê Ellah
 Nasût-î eger çî rengsefale
 Lahût-î jî pertewa cemale
 Herfa ku me gotî, neqşê hûre
 Lê meqsed û maneya wê kûre
 Zahir te eger numaye suxra
 Batın ewe neqşê xame kubra
 Mewcûde dî wê, şehadet û xeyb
 Meşhûde dî wê, sîyadet û cyb

(1) Aşîqê zar: Evîndarê rebenê qelsê perişan.. Dî be ku ev kelîme dî eslê xweda «Jar» be, lê bî şaşbûn «Zar» hatibe nivîsîn.

Însan bî xwe hem zelame, hem nûr
 Adem jî te hem qerîbe, hem dûr
 Hindî weku cînsê alemîne
 Ew tabîê new'ê ademîne
 Ev renga felek hemî mezzem
 Ev çende melek hemî mîkerrem
 Ev karîgeha ezîm û dewwar
 Ev barîgeha bedî'û seyyar
 Ev çende zemîn digel enasîr
 Ev renga arez digel cewahir
 Ev çende he nî'met û nefaîs
 Ev renga he me'kel û melabîs
 Ev çende he mîddea û metlûb
 Ev renga he mîşteha û mehbûb
 Heywan û meadîn û nebatat
 Metlûb û meqasîd û mîradat
 Bîlcîmle jîbo mera lî karîn
 Fîlcîmle jîbo me ber dî barîn
 Heqqa, ku te xweş nîzam û rewneq
 Tertîb-î kîrîn jîbo me, elheq!
 Em xafîl û atîl û gunehkar
 Mayîne dî qeydê nefsê emmar
 Nînûn me dî qelbê fîkr û zîkrek
 Na kîn bî zîmanê hemd û şîkrek (1)
 Xanî ku nehîn bî qelbê zakîr
 Barî! Bî de wî zîmanê şakîr!

(1) Zîmanê: Dî vê rêzê û rêza pey vêyada «Zebanê» bû,
 me lî şûna wan «Zîmanê» nivîsî.

II

GAZİKIRIN Û LAVAYİYA JI XWEDÊRA

Ey şîkrê te cewhera zebanê!
Wey zîkrê te seyyela cenanê!
 Ey Wahîdê bê şerîkê yekta!
 Wey Wacîdê bê nezîr û hemta!
Ey Baqîyê bê zewalê daîm!
Wey Hadiyê bê fenayê qaîm!
 Ey xalîqê erd û asîmanan!
 Wey xalîqê cîmle îns û canan!
Mîlk û melek û felek bî carek
Bîlcîmle te çê kîrîn, tebarek!
 Subhaneke, kulleme xeletqe!
 Ehsente fe keyfe ma feletqe (1)
Herçî ku te çê kîr, ey nîkûkar!
Heryek dî hedê xweda sezawar

(1) Ev beyt gîş bî zarê Erebiye, mana wê eve: Çi qas tîştên ku te aferandiye, ez jûbo wan te pak u paqîj dî dêrîm, ez hemîyan dî ecîbînîm. Herçî tîştê ku te jî tunneyîyê anîye heyîyê, jî tarîtiyê anîye ronahîyê; bî çî awayî te çê kîrîbe te xweş çê kîrîye, karên te hemî xweşîn.

Ev neh sedefêd-ı pır mırarî
 Durrêd-ı sefid, şefaf û tarî
 Heftêd-ı mîsalê durrê xelten
 Herşêş cîhet û çîhar-ı erkan
 Hersê weledêd-ı pır mewalîd:
 Xezra û sema, dîgel meqalîd
 Lewh û qelem û sewabî û erş
 Heywan û nebat û maden û fers
 Zahır kırım ev qeder sanayî'
 Peyda kırım ev qeder bedayî'
 Heryek jî edem kırım te peyda!
 Îbda'ı kırım te bê heyûla
 Fîlcimle: çı ewwel û çı axır
 Elqîsse: çı mı'mın û çı kafır,
 Heryek jî tera we bûne mezher!
 Ew renga dı wan tu bûyî mezmer!
 Bê hısnê te nîne wan wicûdek!
 Bê nûrê te nîne wan nımûdek!
 Hikmet ewe batınî û zahır!
 Qudret ewe xafî û hazır!
 Nînin te tecezzî-yû temekkun
 Emma we dı van dı kî tewettun
 Goya hemî cîsmekın, tu canî!
 Goya hemî şehrekın, tu xanî!
 Hısna teye zîneta hebîban!
 Reşka teye xeyreta reqîban!
 Meyla teye aşiqan dı kêşit!
 Derdê teye dıl jî ber dı êşit!

Şêrîn te kîre şekîr lî Perwîz!
 Ferhad-î jî rengê eşkê xûnrîz!
 Leyla te kîre bela lî Qeys-î!
 Ramîn bî te ram-î bû lî Weysi!
 Yûsif te çîra numa Zileyxa?
 Wamîq te kusa gîhande Ezra?
 Şêxê weku pênce hec bijarî,
 Dîn kîr te jîbo keça kufarî! (1)
 Nîlûferê nazeperwerî kîr!
 Ew jî te lî mîhrê mîşterî kîr!
 Balayê bîlînd te daye serwan!
 Pabendê bela te da tezerwan!
 Bîlbîl te kîrîn hezar-î şeyda!
 Sorgul te kîrîn jî xarê peyda!
 Xweş rengê te da gîyayê sorgul!
 Xweş dengê te da newayê bîlbîl!
 Ronahî te da serê şemalan!
 Perwane kîrîn bî şewqê talan!
 Mehbûb-î te çê kîrîn dî dîlkeş!
 Meczûb-î te pê kîrîn mîşewweş!
 Ev îşq û mehebbeta dî dîlda
 Ev zulf û selasîlê dî mîlda,
 Aya, ne te çê kîrîn mîqabil!
 Heryek te bî hev kîrîn mîadîl!
 Ayîne te çê kîrîn mîkerrîr!
 Hîsna xwe dî wan te kîr mîsewwer!
 Ayîne lî pêşê tûtîyan gîrt!
 Davek te lî pêşê kûvîyan gîrt!
 Ayîne, jî wan weye ku ave
 Ew eksê, jî wan weye ku tave

(1) Şêx: Şêxê Sen'anî ku lî du keça Padişahê Ermenîstanê çû û jîbo wê çû dêrê, meyê ve xwar, gavenîya berazan kîr, paşê jî keçikê kîr mîsîlman u revand anî. Feqîyê Teyran çîroka wî bî şê'r nivîsiye.

Neqşê te dî bînin ew dî avê
 Na kîn hezerê jî av û davê
 Lebteşne teleb dî kîn zelalê
 Wî dane û damê zîlf û xalê
 Meqsûd-ı ku bû jî pêşve hazır
 Dê qesd-ı bî kîn cemîê nazır
 Tûtî bî xwe, ma şekır dî rêjîn?
 Herçî dî bihên, ewî dî bêjîn
 Wê meqsedê mixteser dî bînin
 Pabende dî bîn, gelek dî mînin
 Meqsûd û mîradê dîl tu şa'yî!
 Emma tu «Tudîllu men teşa» yî!
 Herçî te dî vê bî bî dalalê
 Pabende dî kî bî zîlf û xalê
 Herçî ku tu bîmî ser hîdayet
 Vêra bî girî, bî kî îneyet,
 Hazır wî dî bî meqamê malûm
 Ger xadîme wî dî gêrî mexdûm
 Bê secde te ey cenabê Mabûd!
 Adem kîre qîblegah û mescûd
 Îsa te kusa gîhande ewcan?
 Aya bî çî te hebandî ew can?
 Dersa ku bî xef te gote Îdrîs
 Elbette dî çû meqamê teqdîs
 İblîs'ê feqîrê bê cîneyet,
 Hîndî te hebû dîgel îneyet
 Her rojê dî kîr hezar-ı taet
 Lewra ku te da wî îstîtaet
 Wî secde ne kîr lî xeyrê Mabûd
 Gêra te jî ber derê xwe merdûd
 Yek secde ne bîr lî pêşê exyar
 Qehra te kîre mixelledun-nar
 Elqîsse: jî hîkmeta te agah
 Ferdek me ne dî, tebarekellah!

Îrfantelebêd-1 sahib îdrak
Der heqqê te gotî: «Ma erefnak»
Xanî bî nezaniya xwe der heq
Gumrah-1 bî bit, ne dûre, elheq
Îlla ku meger inîn Xweda bit
Ya raheberê wî Mustefa bit
Yareb! Tu bî heqqê Mustefa kî,
Xanî bî xwera tu aşîna kî!

III

PESNÊ PÊXEMBER

Eşya bî heseb delîl û bîrhan
Na bîn çu meger wicûb û îmkân
 Wacib yeke, zatê Kibrîya'ye
 Mîmkun pire, cem'ê masîwaye
Wî Wacibê mîmkînat-ı berqe'
Mîmkun wî jibo xwe kirne metle'
 Yanî ewî, vî bî bit mîberhen
 Hîsna wî bî der kevit jî mekmen (1)
Gencîneyê cewherê bî bit faş
Sabit bî bitin jî neqşê, neqqaş
 Lê sen'etê wî Hekîmê zana (2)
 Neqşê ewî Qadîrê Tewana
Ne'dbû ku bî bit ewî rîsûmek
Layîq ewî dê hebit rîqûmek
 Herçî weku bûne, bê reqembû
 Lew ewwelê ma xeley qelembû

(1) Ewî vî bî bit mîberhan: Ew Xweda bî van tîştan bî be bî delîl, van tîştan jî heyîya wîra bî bîn delîl.

(2) Zana: «Dana» bû, me li şûnê «Zana» nivîsi.

Ev ewwel û rûh û aqlê ewwel
 Hersêne bî ewwelê miewwel (1)
 Emma me ke wan jî hev tu tefrîq
 Ev renga ewan bî gêre tewfîq:
 Bê: «Şey'ekî wahîdîn bî carek»
 Te'dad û teeddud î'tîbarek (2)
 Ewwel bîrîqî jî hîsnê sermed
 Nûrek bûye maneya Muhammed
 Ew nûr-î bî emrê Alîmul-xeyb
 Bû menşê feyzê alema xeyb
 Erwah-î jî maneya Pêxember
 Çê bûn, mesela nebat û şekker
 Bû eslê eslê cîmle nefsan
 Nefsa sueda û nefsê nehsan
 Hemyan jî wî girtine teferru'
 Hemyan bî wî girtine temettu'
 Hêja ne zemîn, ne ev semabû
 Ew serwerê cîmle enbîyabû
 Xelqa felekan jîbo wîra bû
 Secda melekan jîbo wîrabû
 Ew rehmetê cîmle alemînbû
 Adem di meyanê ma'û tînbû
 Pêxemberê cem'ê cuz'û kulbû
 Adem bî xwe hêj-î av û gulbû
 Ew pencereye cemalê Barî
 Şemsa feleka dîlêd-î tarî
 Gava kete sûretê cîhanê
 Peyxemberê axirê zemanê,
 Wî berzexê mîmkînat û Wacîb
 Wî padîşehê lî şîklê hacîb,

(1) Ev ewwel: Yanî qelem. Bî ewwelê: Bî çêbûna berî tîştên dîn.

(2) î'tîbarek: Ev î'tîbarekîye, wisa hatîye qebûlkirin. Yanî vana di eslê xweda yekî, lê cihê hatine têwkirin.

Mensûx-ı kırım wî dîn û millet
 Ma'lûl-ı kırım elîl û illet
 Fıkrî ku cîhan cemî'î kufre
 Kêşa ji nîbîwweta xwe sîfre
 Xelqê ku hebûn lî rûyê erdan
 Teklîf-ı kırım hemî bî merdan
 Xaqan bî xwe Hindoyê kemînbû
 Fexfûr-ı ji xwanê kase, çînbû
 Qeyser bî qusûrîya xwe qasîr
 Hazır gerîya bî eynê basîr
 Şahê Erebi elem ku ra kîr
 Kîsra'yê Ecem, eceb duta kîr
 Rom û Hebeş û Fîreng û Tatar
 Herçî ku ne kîr bî dîn-ı îqrar,
 Naçar-ı gelek bî şûr fena bûn
 Hetta ku hînek bî dîn teba bûn
 Pûtxane bî agirê dî şuştin
 Ateşgede cîmlekî ve kuştin
 Gava ewî dîn kîr aşîkara
 Dawûdî-yû Sibtî-yû Nesara,
 Tewratê ewan ji bîr kîr ekser
 Încîl û Zebûr-ı çûn ji ezber
 Îsa'yî dema dî xwendî Încîl
 Behsa wî dî kîr bî wehy-û tenzîl
 Go: «Mijde dî dîm, Resûlê Emced
 Dê paşê me bê, bî navê Ehmed»
 Da'wa xwe dî kîr bî dest û ezman
 Destê wî bî şûr, û dev bî qur'an
 Xweşxîlqete, hem Resûle, hem Mîr
 Pîrhîkmete, hem kîtabe, hem şîr
 Naxwande sebeq, mîderrîsê am
 Bê mal û menale, sahib-în'am
 Bê xeyl û heşem, bî xwe cîhangîr
 Bê tebl û elem, cîhan sedagîr

Herçî te dî dî meger her-ew bû
 Leşger jî cinûdê «Lem terew» bû (1)
 Bê xeyme û barîgah û eywan
 Ewran ve dî da lî ser wî seywan
 Hîndî ku jî pêşve baxeberbû
 Ew gende jî piştve babeserbû
 Sîhdan ne dî ket jî wî lî erdan
 Vêkra dî bîhîstî sed xeberdan
 Goyende dî bûn digel, cematat
 Peywende dî bûn digel, nebatat
 Yek new'ê nema jî cînsê heywan
 Nîna bî nîbîwweta wî îman
 Îlla ku hînek jî îbnê Adem
 Bûn derxurê agirê cehennem (2)
 Elqîsse: Dî erd û asîmanan
 Hasîl: Dî cemî'ê îns û canan
 Ev bê meddedêd-î ummîta xwe
 Mîmtaz-î kîrîn bî hîmmîta xwe
 Wer'a wî we rengî dîn qewî kîr
 Şer'a wî sîratê mistewî kîr
 Alîm hemî şîbhê enbîyane
 Abîd hemî pêkve ewlîyane
 Ferdek jî sehabeyêd-î Kubber
 Pênsed jî delawerêd-î kuffar,
 Ew cîmle digel yekê seraser
 Ne'dbû bî mehabetê beraber
 Xelqê heye şîbheyek dî dînê
 Behsê bî cedel bî ket jî dînê,

(1) «Lem terew»: Ev parçekî jî ayetekiye, mana wê «We ne dî dîtin»; Xwdê dî vê ayetêda qala Şerê Huneyn'ê dî ke û dî bêje: «Me jîbo alîkarîya Pêxember'ê xwe hînek sîpahan şand ku we wan ne dî dîtin».

(2) Agîrê: «Ateşê» bû, me lî şûnê «Agîrê» nivîsî.

Qur'an û xeber çî mî'cizatın!
Ayat û sıwer çî beyyînatın!

Bûbekr û Umer çî xweş qerînın!
Usman û Elî eceb guzînın!

✱

Ey Padîşehê bîlîndepaye!
Xurşîdê felek nîşîn û saye! (1)

Ne'tê te bî îlmê mîn mîhale
Meddah-ı jîbo te Zılcelal'le

Ez dê çî bî bêjîm? Ey Şehînsah!
Wessafê teye kelamê Ellah

Şaha! jî tera xweş îsme «Yasîn»
Taha! jî tera tîlîsme «Tasîn» (2)

Her ev bese, ey Hebîbê Muxtar!
Barî jî tera bî jî te sond xwar (3)
Sed carî bî jî te, ey keremkar!:
Ger dê me hebin guneh dused bar,

Sed mertebe ger çî em xîrabîn,
Emma jî te naumîd-ı na bîn
Hetta bî gîhîte Xanî'yê jar
Napak û Pelîd û wacîbun-nar

(1) Saye: Sî. Yanî roja felekê bî qedrê xwe û bî rûmeta xwe jî te pîr kêmîre, lî bin teye, wek ku tu lî serê rûnî, û ew wek sîya teye.

(2) «Yasîn» û Taha: Du navên Pêxemberin her yek di qur'anêda di serê sûrekida hatiye. «Tasîn»: Ev du herfên Erebi'ne, weha tîlî nivîsîn:  û «Tasîn» tîlî xwendin, di serê sûrekî

qur'anêda hatine, lê kes bî mana wan nî zane.

(3) Bî jî te: Bî jîna te, bî umrê te; ev îşarete bî alî ayeteki qur'anêve Ku Xwedê têda bî umrê Pêxember sond xwarîye.

Ew jî bî xîrabî-yû seyînî
Da'wa dî ketin bî ummetînî

Wî bed'emelê wekî kîlaban
Barî bî ke peyrewê sehaban

IV

DAXWAZA MEHDERÊ JI PÊXEMBER Û DAXWAZA EFWÊ JI XWEDÊ

Ey wasîteyê wicûdê kewneyn!
Şayesteyê qurbê «Qabe qewseyn» (1)

Şahîngehê textekê Medîne!
Mî'cîz jî te ew qeder me dîne

Seyra felekan lî nîk te gavek
Fexra melekan jî te sîlavak

Şeqqel-qemera te yek îşaret
Zaxel-besera te yek îbaret (2)

(1) Qurbê qabe qewseyn: Nêzîkiya bî qasê du kevanan; ev îşaret dî ke bî alî vê ayetêve: «Dî mî'racêde Pêxember bî qasê du kevanan nêzê Xwedê bû.»

(2) Şeqqel-qemer: Qetkîrîna Hîvê; ev îşarete bî alî mî'cîza Pêxember ku wî bî îşaretekî hîvê kîrîye du qet. Zaxel - beser; Şîmutîna çav; ev îşarete bî alî vê ayetêve: «Pêxember şeva mî'racê Xwdê dît çavê wî ne şîmutî.» Yek îbaret: Yek gotînekî, ku ew jî dî qur'anêdaye.

Ey Padîşehê serîrê «Lewlak»! (1)

Ra be here asîmanê, çalak!

Hazır jî tera Buraq û Refref

Şatır bî tera Fırîşte ref ref

Da ref'î bî bîn jî ber te perde

Bê perde dîgel Xwedê xeber de!

Bêjê: «Tu Qedîr û Zılcelal'î»

Bêjê: «Tu Qedîm û Layezal'î

Em fanî-yû jar û mîştexakîn

Hadî ne tu bî, xwe em helakîn

Ewwel te jibo çî da me tazîm,

Danî lî serê me tacê tékrîm, (2)

Teshrîfê xîlafetê te da me? (3)

Gava te emanêtê xwe da me,

Malûmê tebû ku em nezanîn

Qedre wî emanetî nî zanîn

Herçî te jibo me kîr îrade

Yek zerre me lê ne kîr zîyade

Haşa jî kemalê re'feta te,

Dûre jî celal û rehmeta te

Kufr û gunehan bî kî behane

Lafq te bî tîn... Eve şehane?

Yekrûne lî nîk te kufr û îman

Yeksûne lî nîk te xuld û nîran

Qehra xwe bî kî eger tu zahîr

Cennet lî me dê bî bîte agir

(1) Lewlak»: Ev serê gotinekî Xwedêye, mana wê «Eger ne tu bûya»; Xwedê jî Pêxember'ra gotiye: «Eger ne tu bûya mîn felekan ne dî aferand.»

(2) Tekrîm: Qedîrbilindî; ev îşarete bî alî wê ayeta ku dî bêje: «Me kurên Adem qedîrbilind kîr»

(3) Xîlafet: Wekîliya Xwedê; ev îşarete bî alî wê ayeta ku dî bêje: Xwedê soz da mîsî manên karbaş, ku dê wan dî erdêda bî ke wekil, çawa ku ên berî wan jî kîrbû wekil...»

Wer feyz-ı bî ket sehabê rehmet
 Dozex lı me dê bî bîte cennet
 Ger kafır û ger gunahekarın
 Bîlcımle jı te umîdewarın
 Kes nîne jı kafır û usatan
 Mezher ne bitın jıbo sîfatan
 Kafır buwîn em bî ismê «Qehhar»
 «Xeffer»e ku em kirin gunehkâr
 Kufrê tu meger ne şî bî bexşî?
 Ger dê gunehan bî me bî nexşî,
 Dê şad-ı bî bın lı me şeyatîn
 Mesrûr-ı bî bın gelek melaîn»

»*

Qet xîrete ey penahê alem!
 Qet laîqe, Ey şıvanê adem!
 Ev gurgê leînê bed, serencam
 Jêkra bî ketın me şıbhê exnam?
 Elqîsse: Bî kî ku dêwê serkeş
 Tenha û tenê bî çîte ateş
 Fîlcımle: Me cımle xas û aman
 Asî-yû seqî-yû natemaman,
 Têkra bî şefaeta xwe xas ke
 Vêkra me jı agîrê xılas ke

V

DERDÊ ME

Saqî! Tu jibo Xwedê kerem ke
Yek cîr'e meyê dî camê Cem ke (1)
Da cam-î bî mey cîhannuma bî
Herçî me îradeye xuya bî
Da keşf-î bî bî lî ber me ehwal
Kanê dî bîtin mîyesser îqbal?
Îdbarê me wa gîha kemalê
Aya buwe qabilê zewalê?
Ya her wehe dê lî îstîwa bî,
Hetta wekû dewrê munteha bî?
Qet mîmkune ev jî çerxê lewleb:
Talî' bî bîtin jîbo me kewkeb,
Bextê me jîbo mera bî bî yar
Carek bî bîtin jî xwabê heşyar

.....
.....

(1) Camê Cem: Qedeha Padişahê Îran'ê Cîmşîd, ku têda gelek tîştên dîr dî xuya, wek Telesqop'ê bûye. Hozan qedeha xwe jî dîrûbandîye bî wê qedehê.

Şûrê hunera me bête danîn
 Qedrê qelema me bête zanîn
 Derdê me bî bînitin îlacê
 Îlmê me bî bînitin rewacê?
 Ger dê hebuwa me serfirazek
 Sahibkeremek suxennuwazek,
 Neqdê me dî bû bî sîkke meskûk (1)
 Ne'dma wehe bê rewac û meşkûk
 —Her çendî ku xalıs û temîzin
 Neqdeyn-ı bî sîkkeyê ezîzın—

.....

Xemxwarî dî kır lı me yetîman
 Tîname derê jî dest leîman

.....

Herçî bire şûrê destê hîmmet
 Zeft kır jî xwera bî mêrî dewlet

(1) Neqd: Zêr û zîv. Lı vır bî mecazî dî mana bêjeda hatiye gotin.

Lewra ku cîhan wekî erûse
 Wê hukmê dî destê şûrê rûse
 Lê eqd û sîdaq û mehr û kabîn:
 Lutf û kerem û eta û bexşîn (1)
 Pîrsî jî dinê min ev bî hîkmet:
 «Mehra te çî?», gote min ku: «Hîmmet»
 Hasil Ku: Dinê, bî şûr û îhsan
 Tesxîr-î dî bî jiboyê însan
 Ez mame dî hîkmeta Xwedê'da
 Kurmanc-î dî dewleta dînêda
 Aya bî çî wechî mane mehrûm?
 Bîlcîmle jibo çî bûne mehkûm?
 Wan girtî bî şûr-î şehre şuhret
 Tesxîr-î kîrîn bîladê hîmmet
 Her mîrekî wan bî bezlê Hatem
 Her mîrekî wan bî rezmê Rîstem
 Bî'fkr jî Erab heta ve Gurcan
 Kurmancîye bûye şîbhê bîrcan
 Ev Rûm û Ecem bî wan hesarîn
 Kurmanc-î hemî lî çar kenarîn
 Herdu terefan qebîlê Kurmanc
 Bo tîrê qeza kîrîne amanc
 Goya ku lî serhedan kîlîdîn
 Her taîfe seddekî sedîdîn

.....

(1) Mana vê rêzê û a berî wê eve: Dinê wekî bûke, huk-
 mê wê jî dî destê şûrê tûjdaye, kî xwedîyê wî şurîbe ew jî
 xwera bûkê dî be; lê qencî û camêrî u bexşîn jî qelen û heqê
 marbîrîn û Kabîn'a bûkêne.. Nexu dî vê berê mîrov bî zor
 bûkê bine û bî ke malê xwe, paşê qencîya xwe bî ke.

Cıwamêrî-yû hîmmet û sexawet
 Mîrînî-yû xîret û celadet,
 Ew xetme jîbo qebîlê Ekrad
 Wan dane bî şûr û hîmmetê dad
 Hîndî jî şecaetê xeyûrîn
 Ew çende jî minnetê nefûrîn
 Ev xîret û ev ulûwwê hîmmet
 Bû manîê hemlê barê minnet
 Lew pêkve hemîşe bê tîfaqîn
 Daîm bî temerrîd û şîqaqîn
 Ger dê hebuwa me ittîfaqek
 Vêkra bî kira me îngîyadek

.....

 Tekmîl-ı dî kîr me dîn û dewlet
 Tehsîl-ı dî kîr me îlm û hîkmet
 Temyîz-ı dî bûn jî hev meqalat
 Mîmtaz-ı dî bûn xwedan kemalat

VI

SEBEBÊ NÎVÎSÎNA PIRTÛKÊ BI ZARÊ KURDÎ

Xanî jî kemalê bê kemalî

Meydanê kemalê dîtî xalî

Yanî ne jî qabûl û xebîrî

Belkî bî teessîb û eşîrî

Hasıl: jî înad, eger jî bêdad

Ev bîd'ete kîr xîlafê mu'tad:

Safî şemîrand, ve xwarî durdî

Manendê durê lîsanê Kurdî,

Înaye nîzam û întizamê

Kêşaye cefa jîboyê amê

Da xelq-î ne bêjîtî ku: «Ekrad

Bê ma'rîfetî, bê esl û bînyad

Enwaê mîlêl xwedan kîtêbî

Kurmanc-î tenê dî bê hesêbî »

Hem ehlê nezer ne bîn ku: «Kurmanc

Îşqê ne kîrî jîbo xwe amanc

Têkda ne dî talibin, ne metlûb
Vêkra ne mihîbbin ew, ne mehbûb

Bê behrene ew jî îşqebazî
Farîx jî heqîqî-yû mecazî»

Kurmanc-ı ne pîr dî bê kemalın
Emma dî yetîm û bê mecalın

Fîlcımla ne cahıl û nezanın
Belkî dî sefîl û bê xwedanın

Ger dê hebûya me jî xwedanek
Alîkeremek, letîfedanek,

Îlm û huner û kemal û îz'an
Şê'r û xezel û kîtab û dîwan,

Ev cîns bî buwa lî ba wî mamûl
Ev neqd-ı bî ba lî nîk wî meqbûl,

Mîn dê elema kelimê mewzûn
Alî bî kîra lî banê gerdûn

Bîna ve rîha Melê Cızîrî
Pê hey bî kîra Elî Herîrî

Keyfek we bî da Feqîhê Teyran,
Hetta bî ebed bî mayî heyran

Çî'bkîm ku qewî kesade bazar
Nînin jî qumaşêra xerîdar

Xasma dî vê esrêda ku himyan
Maşûq û hebîbe bo me hemyan

Yanî j'tîmayê dîrav û dînar
Her yek jî mera we bûne dîldar,

Ger îlmê temam bî dî bî pûlek
Bî'froşî tu hîkmetê bî solek,

Kes na kete mîterê xwe camê (1)
 Ra na giritin kesek nîzamê
 Weqtê ku me dî zemanê ev reng
 Fîlcimle lî ser diravê bû ceng,
 Hez kîr me bî bîne kîmîyager.
 Gava ku me dî ne bû mîyesser,
 Nîsfîyye me pêlekî amel kîr
 Tesfîyyeê cewherê dixel kîr
 Qelbê me ne kîr qebûlê hîle
 Qet bo xerezê ne bû wesîle
 Dîn çû, û ne ket bî dest me dînar
 Paşê jî neçarî bûyne seffar
 Sîfrê xweyê xef me eşkera kîr
 Qurtasîyebû, me lê dua kîr
 Da'wet gerîya bî sîdîq îcabet
 Bû wasîteyê qezayê hacet.
 Ev pûl-î eger çî bê buhane
 Yekrûne û saf û bêbuhane
 Bê hîle û xurde, û temamn
 Meqbûlê mîamela ewamn
 Kurmancîye sîrfe, bê gumane
 Zêr nîne, bî bîn «sîpîde mane»
 Sîfrê meyê sore aşîkare
 Zîv nîne bî bîn ku «Kêm'eyare»
 Neqdê me me bêje «Kem'eyare»
 Bê sîkkeyê şahê şehrewaye
 Ger dê bî buwa bî derbê menqûş
 Ne'dma wehe bê rewac û mexşûş
 Mehbûbe, bî kes ne nam-îzade
 Lew bextesîyah û namîrade

(1) Mîter: Ronahî, roj; yanî kesekî îlmê ku wek camêye jî xwera nake roj û lî pey ronahîye wî na çê.

Qırtasiyeya me bê penahan
 Bê derbê qebûlê padîşahan,
 Ma'lûle lı ba gelek elîman
 Meqbûle lı ba gelek hekîman
 Lê hakûmê weqtê marifetnak
 Mesmû'ı ne kır bı sem'e îdrak
 Mîrê ku bı navê Mîrîza'ye
 Mehza nezera wî kîmiyaye
 Qelbêd-ı zexel dıket belorî
 Pûlêd-ı dexel dı ket fılorî
 Sed barî hebın fılsûse ehmer
 Derhal-ı dı ket bı yek nezer zer
 Î'layî dı ket bı qehrê, edna
 Ednayî dı ket bı lutfê, e'la
 Paşan dı gırıt wekî esîran
 Aza dı ketın wekî feqîran
 Her rojê hezarê bê newayan,
 Her lehze bı lutfê, sed gedayan,
 Zengîn dı ketın bı destê hîmmet.
 Hîkmet ewe na ketın çu mînnet
 Ger dê wî nezer bı da me carek
 Îksîrê teweccîha mîbarek,
 Ev qewl-ı hemî dı kîrne eş'ar
 Ev pûl-ı hemî dı bûne dînar
 Emma nezera wî zêde ame
 Lew xasê nezer jı dıl ne da me
 Ew rehmetê xase bo ewamê
 Yareb! Tu bı dî wî her dewamê

VII

MEYGER! MEYÊ TÊ KE

QEDEHÊ

Saqî! Bî ke camê asîmanî

Raha wekû rûhê cawîdanî

Da em bî kîrîn dîmaxê can ter

Yek lehze bî rahê rûheperwer

Saqî! Tu bî rêje camê mîna

Ava ku dî ket zemîrê, bîna

Şadab-î bî gêre qelbê mehzûn

Medhoş-î bî gêre aqlê mecnûn

Saqî! Bî ke kaseya mîcewher

Wê şîreyê ma'sera mîtehher

Yaqûtê mîzab û la'lê seyyal

Wî durrê xweşab û xemrê tellal

Durdaneyê xwe bî rêje navê

Yanî ereqa wekî gulavê,

Dem dem bî de destê meyperestan

Xelqê ku hînek jî dîl dî destan

Da camê dılan bî bit mîresse'
 Bezma terebê bî bit mîsenne'
 Vî meclîsê meyxuran mîdamî
 Mestane bî ke jî nû mîdamî
 Mîmkun ku jî feyzê bê nîhayet
 Yek qetre bî bit lî mîn îneyet
 Neş'a qedeha meya mîrewweq
 Keyfa îneba rezê bî rewneq
 Ew renga bî ket dî nefsê te'sîr
 Hasıl bî bitî dî qelbê teşwîr
 Yanî bî kevîte canê, şewqek
 Hetta bî gîhîte qelbê, zewqek
 Te'sîrê nefes bî bit jîbo mîn
 Teşrîhê qefes bî bit jîbo mîn
 Tesfîyyeê dîl bî bit me hasıl
 Hevdeng-î bî bîm dîgel enadıl
 Mîrxê dilê mîrde, bête perwaz
 Bê perde bî bit terane perdaz
 Dem şîhbetê bîlbîlan bî nalît
 Geh şîbhê enadılan bî kalît
 Ahan ku verê bî ket sehergah
 Hemware dîgel nesîmê hemrah
 Sed xunçeyê dîl jî ber bî ker bîn
 Sosîn bî zîman û baxeber bîn
 Bîşkoj-î bî pîşkîvî jî xaran
 xwînrêj-î bî bîn demê hezaran
 Sorgul bî girîn bî eşkê şebnem
 Bîlbîl bî kenîn lî rexmê hemdem
 Saqî! Bî de mîn şerabê gulgûn
 Bê dengê def û sedayê Qanûn
 Da şehne û mîhtesîb ne bînîn
 Şahî bî cîvîn, çu xem ne mînîn
 Teşwîş-î bî çîn jî qelbê mehzûn
 Dîsan bî bîm ez jî nû dîgergûn

Mexmûr-ı bı bım, bı kırme lafan
 Serxoş-ı bı bım, bı kım guzafan
 Bê keyf-ı ne şım çu ez bı bêjim
 Dîwane bı bım, duran bı rêjim
 Bedhal-ı bı bım sıran bı der dım
 Bê qal-ı jı batınê xeber dım
 Teşbîhê Neyê bı kım terennım
 Tûtî sîfet ez bı kım tekellım
 Da keşf-ı bı bın jı mın keramat
 Meşhûd-ı bı bın lı mın meqamat
 Şu'be jı meqamê dıl bı awaz
 Gulşen bı ketın guweşt û şehnaz
 Neyrengê jı xewrê dıl bı aheng
 Sed rengê seda bı dım wekî Çeng
 Manendê Rubabê, bê kemange
 Deng bê jı defa me bê tebange
 Zuhre bı bihêt newayê uşşaq
 Reqqase bı bit lı ewcê neh taq
 Sazê dılê kul bı zêr û bem bit
 Sazendeyê işqê Zîn û Mem bit
 Şerha xemê dıl bı kım fesane
 Zînê û Memê bı kım behane
 Nexmê we jı perdeyê derînim
 Zînê û Memê jı nû ve jînım
 Ma'lûl-ı buwîn hebîb û aşiq
 Îro he wekî tebîbê hazıq,
 Derman bı kım ez ewan dewa kım
 Wan bê mededan jı nûve ra kım
 Derdê dı dılê Memê cegerrîş
 Zîn'a jı derûnê dıl cefakêş
 Wê perdegeya efîfe, mestûr
 Wî bê gunehê jı tuhmetê dûr,

Meshûr-ı bî kım bî terz û uslûb
 Mımtaz-ı bî bin mihîbb-û mehbûb
 Ew renga bî kım jî nû serefraz
 Da bêne temaşeyê nezerbaz
 Dîlber lî Memê bî kın girînê
 Aşiq bî kenın bî derdê Zînê
 Hemderd-ı bî kın bî wan sefayê
 Bê derd-ı bî kevne helwelayê
 Xelqê ku jî sîne û jî dîl saf
 Pakîzesırışt û ehlê însaf
 Bîlcımle bî kın jîbo me tehsîn
 Bêjn ku: «Bî qencî hate tedwîn»
 Xelqê jî «Yahîbbuhum», digergûn
 Herçî jî ezel buwî «Yuhîbbûn» (1)
 Da bèn û bî kın hîkayetê gûş
 Hindek bî kırım xwe pê feramûş
 Hindek bî kırım bî can semaê
 Hın pê bî kırım jî dîl wedaê
 Lê hêvî dî kım jî mistefîdan
 Herfan ne girîn lî mistefîdan
 Ev name eger xırabe, ger qenc
 Kêşaye digel wê, mın dused renc
 Nûbareye, tifle, nûresîde
 Her qencî nehın qewî guzîde,
 Lê mın jî reza ne kır temettu'
 Manendê dîzan bî kım tettebbu'
 Nûrestê hedîqeyê fuade
 Masûme, effe, xanezade
 Nûbare eger şêrîn, eger tal
 Metbûe jî rengê new'ê etfal

(1) «Yuhîbbuhum: Ev kelîmekîye jî ayetekî, mana wê «Xwdê wan dî evîne»; yanî kesên qencên ku Xwedê jî wan razîye. «Yuhîbbûn»: Ew Xwedê dî evînın; ev jî kelîmekîye jî wê ayetê.

Mîn hêvî heye jî ehlê halan
 Teqbîh-î ne kîn evan tefalan
 Ev meywe eger ne abîdare
 Kurmançîye, ew qeder lî kare
 Ev tîfle eger ne nazenîne
 Nûbare, bî mîn qewî şêrîne
 Ev meywe eger ne pîr lezîze
 Ev tîfle bî mîn qewî ezîze
 Mehbûbe, libas û goşîware
 Milkêd-î mînin, ne mîsteare
 Elfaz û meanî-yû îbarat
 Înşa'û mebanî-y» îşarat,
 Mewzû'û meqasîd û hikayet
 Mermûz û menaqîb û dirayet
 Uslûb û sîfat û mane û lefz
 Esla ne kîrîn me yek jî wan qerz
 Bîlcîmle netaîcêd-î fîkrîn
 Dûşîze û nûerûs û bîkrîn
 Yareb! Me de destê xelqê nasaz
 Vê şahîdê dîrevayê tennaz (1)
 Ummîd-î ewe jî ehlê îrfan:
 Ew dê ne gîrîn lî mîn çu herfan
 Teşnî'î ne kîn, wekî xeyûran
 Îslah-î bî kîn lî mîn qusûran
 Eshabê kemalê perdepoşîn
 Erbabê xerez dî pîr xuroşîn
 Me'mûl-î ewe jî ehlê razan:
 Ew dê ne kîrîn bî mîn tînazan
 Ez pêlewerîm, ne gewherîme
 Xudresteme ez, ne perwerîme

(1) Şahîd: Rind, mexsed jê ev pirtûke. Dîreva: «Dîruba» bû me lî şûnê «Dîreva» nivîsî.

Kurmancım û kohî-yû kenarî
 Van çend xeberêd-ı girdewarî,
 Îmza bî kırım bî hısnê eltaf
 Îsxa bî kın ew bî sem'ê însaf
 Eshabê xerez ku goh bî dêrın,
 Eyban bî kırım, lı mın veşêrın
 Ava rûwê şairî ne rêjin
 Ger mımıkune, yêkî qenc bî bêjin
 Sehew-û xeletan ne kın teeccıb
 Te'wıl-ı bî kın jıbo teessıb

VIII

PESNÊ MÎRÊ BOTAN Û HERDU

XUŞKÊD WÎ SITÎ Û ZÎN

Neqqaşê sehîfeyê hikayet
Neqqadê sebîkeyê rîwayet

Kêşa bî vî terhî resm û ayîn
Lê da bî vî terzî derb û tezyîn:

Go: Padîşehk zemmanê sabıq
Ra bû dî hikûmeta xwe faıq

Ecnasê mîlel mitî'û mınqad
Nesla wî Ereb, Emîrê Ekrad

Textê wî Cızîr û bextî mes'ûd
Tahî' qewî-yû meqamî mehmûd

Rom û Ereb û Ecem dî ferman
Meşhûre bî navê «Mîrê Botan»

Abaê îzam û cedd-û walîd
Mensûb û mîselselêd-ı Xahîd

Cebbarê felek jî wî hezerkar
 Meslûle jî sellê seyfê Cebbar (1)
 Zîbendeyê mîlk û zeynê dînbû
 Navê wî Emîrî «Zeynîdîn» bû
 Mîrî jî wîra bî zîn-î mewşûf (2)
 Zînet jî wîra bî dîn-î ma'rûf
 Asarê şecaeta wî şahî
 Da girtî jî mahê ta bî mahî
 Mahîyyetê wî medarê dînya
 Şahîyyetê wî şîarê uqba
 Mîhtacê sexaweta wî Hatem
 Mexlûbê şecaeta wî Rîstem
 Hatem jî kemalê hîmmeta wey
 Tomarê sexaweta xwe kîr tey
 Aql û huner û sexa û meydan
 Zebt û neseq û nîzam û dîwan,
 Dîndarî-yû dewlet û dîyanet
 Serdarî-yû sewlet û sıyanet,
 Meşhûne jî her yekê xezînek
 Meknûne jî her yekê defînek
 Bê usr-î jîbo wîra mîyesser
 Bê xusr-î jîbo wîra mîqedder,
 Enwaê newadır û cewahir
 Elwanê nefais û zewahir
 Mecmûeyê mîmkînatê meqsûd
 Wacîb kırıbûn lî nîk wî mewcûd
 Hasıl bî wî mîddea û metlûb
 Wasıl bî wî mîştêha û mehbûb

(1) Meslûle jî sellê seyfê Cebbar: Jî kêşana şûrê Xwedê hatîbû kêşan; di vê ferdêda du mana hene ku jêra di bêjin «Tewriye». Manakî ewbû ku me nivîsî, ya dîn jî mexsed têda jî şûrê Xwedê, Xalid'e; ev jî jî nasla wiye.

(2) Bî zîn: Bî nivê navê wî ku «Zeyn»e, jîbo rastkırına qafiyê «Zîn» hatiye nivîsîn.

Sehna heremê ji nazenînan
 Cennet tîjîbû ji horîînan
 Horî wî dî cennetê gelekîbûn
 Xîlman wî dî hezretê melekîbûn
 Lê zadeyê dûdemanê dewlet
 Nûbadeyê bosîtanê îffet,
 Şehzade dubûn lî nîk wî şahî
 Xursîd-î dubûn lî nîk wî mahî
 Yanî ku ji wî nejadê alî
 Hemsîre dubûn dî laubalî
 Yek serwê rîyazê rasitîbû
 Wê navê bî rasitî Sîtî'bû
 Ya dî ji dîl û hînavê Mîr'bû
 Wê navê ji nîsfê navê Mîr'bû (1)
 Rawî wehe gote min mîemma:
 Ew horî bî navê Zîn mîsemma
 Yek zêde şêrîn, zîyade mehbûb
 Yek rûhê qulûb û horî meqlûb
 Yek esmer û ya diwî zerîbû
 Yek horî-yû ya diwî perîbû
 Ew hor û perî dî bêbedelbûn
 Lewra ku ji nûrê Lemyezel'bûn
 Hîsna ruxê wan çu kes ne dîbû
 Zêra ji cemalê sermedîbû
 Lêvla'l-û semen'îzar û gulrux
 Rewneq şîkenê bî tanê xullux
 Zîlfeyn-î mîsalê tayê Sînbîl
 Xeddeyn-î ji rengê rûyê sorgul
 Ew sorgul û sînbîlêd-î azad
 Bîşkîftî lî qeddê serwê şîmşad

(1) Navê Mîr «Zeynîdîn» bûye, ev bî herfên Erebî weha tê
 nivîsîn: « زین الدین », gava em nivê wiyê pêşîn jê bî qetînin
 dî be « زین », ev jî navê Zînê'ye.

Sorgul ji xweda li ser rehîstî
 Sînbil bî xwe pêkve da herîstî
 Hîsna xetê rux ji xetê yaqût
 Çaha zîqenê ji sîhrê Harût
 Goya kiribû ji miskê bîzî
 Remmalê felek nîqat-î rîzî
 Xal û nuqet û beyaz û humre
 Beyt û Hecer û tewaf û umre
 Ebrû ji kevanê qewsê eflak (1)
 Mîjgan bê guman ji sehmê semmak
 Sermayeyê wehşeta cînûnan
 Mermûze dî dehşeta uyûnan
 Mebhût-î dî bûn dî tîrfetîl-eyn
 Keşşafê rîmûzê hîkmetîl-eyn
 Cebhet dî numa ji terfê îklîl
 Goya li ufuq cenahê Cîbrîl
 Westayî li îstîwayê daîm
 Xurşîd-î dî xîzmeta wî qaîm
 Herçî bî dîya rux û benagoş
 Fîlhal-î bî der dî da jîbo hoş
 Gerden, te dî go dî destê saqî
 Qarûreye, pîrşerabê baqî
 Yan şîbhetê şûşeya nebatê (2)
 Yan mênbeê kanîya heyatê
 Serpence û naxunê mîhenna
 Roncîdeyê xatîrê mîhenna
 Xelqê ku dî dîtin ew kemergah
 Hazîr dî kîrîn ji xewrê dîl «Ah»

(1) Kevanê: «Kemanê» bû, me li şûnê «Kevanê» nivîsî.

(2) Şûşeya: «Şîşeya» bû, me li şûnê «Şûşeya» nivîsî.

Zahir dı kırım ku zend û bazın
 Êdî ne dıman gılî û gazın
 Her çendî ku herdu şıbhê canbûn
 Ew herdu bî hısnê, tew'emanbûn
 Her çendî Sîtî we nazenînbû
 Lê Zîn jî mîsalê horînbû
 Her çendî Sîtî sitêre weşbû
 Lê Zîn bî ruxan heyîve geşbû
 Her çendî Sîtî wekî qemberbû
 Zîn Mihre sifet, zîyade terbû
 Ev herdu wekî du şevçiraxan
 Gava dı meşîne bax û raxan,
 Nalan dı kırım cemađ û heywan
 Talan dı kırım nebat û însan
 Kofî jî cewahıran mîkellel
 Koter jî netrıkan mîselsel
 Serbendê qeseb dı dan cebînê
 Aşiq dı mırın jî dest evînê
 Ev zînet û xeml û qışt û mendel
 Ez pêş û pes û yemîn û qenbel,
 Gava dı meşîn, perî dıgel wan
 Walîh dı kırım welî dı xelwan

~

Ger şêxın û ger mela û mîrın
 Derwêş û xenî û ger feqîrın
 Kes nîne ne talibê cemaîlê
 Kes nîne ne raxibê wîsalê
 Hın raxibê hısnê Layezal'ın
 Hın talibê qalibê betalın
 Lêkîn hemîyan yeke yeqîn dost
 Ferqa ku heye jî mexzê ta post

IX

RINDÎ Û EVÎN

Hindî ku dî qeyserê dî dinya
Vêk dane Xwedê meta'û kala
 Mecmûê xezaînêd-1 Qeyser
 Hetta vigî duxmeya Sîkender,
Durrêd-1 defaînêd-1 Xaqan
La'la ku dî xatema Silêman,
 Her çendî zîyade têrbuhabin
 Bîlcımle bî cuz'ê hısnê na bın
Hisna lı ruxê Sıtî û Zînê
Bû behrekî agirê evînê (1)
 Pêla ku dî girte pêl û mewcan
 Rojê dî kete hadîd û ewcan
Sed can û dîl û ceger dî sotın
Xelqê bî mesel jî wan dî gotın
 Şems û qemeran qîrane pêkve
 Lew mîşterî ev cîhane pêkve

(1) Agirê: «Ateşê» bû, me lı şûnê «Agirê» nivîsî.

Seyyadê cemalê wan xezalan
 Seyyatê sedayê wan delalan
 Dellal-ı sîfet, geleg sîfet şêr
 J'efxan û jî naleyan ne bûn têr
 Rojan û şevan gelek dî nalîn
 Hetta ku dîgel melek dî kalîn

*.

 Hısna ne bitın çu hedd-û xayet
 Na bit jî xwe aşiqan nîhayet
 Lê aşiq û bulhewes cudane
 Hın faîdexwaz û hın fîdane
 Canantelebın hînek jîbo can
 Hın cantelebın jiboyê canan
 Hın weslehebîn jî rengê Tacdîn
 Hın derdeguzîn wekî Mem û Zîn

X

SALIXDANA MEMÊ Û TACDÎN

Da bêne bî ser hîkayeta pêş:
Xelqê ku jî derdê îşqê dîrîş,
Her çendî ku bê hed û qiyasbûn
Amî-yû xewadim û xewasbûn
Lêkîn jî xewadimêd-î mîmtaz
Sed lawê sehêqed û serefraz
Her yek dî meqamê hîsnê, rojek
Her yek bî kelâmê sînesojek
Her yek bî kemalê bedremahek
Her yek bî cemalê sedrê şahek
Ew jî hemî aşiqin dî talib
Ew jî hemî talibin dî raxib
Lêkîn ne bî dîtin û şehadet
Belkî bî bîhîstin û rîwayet.
Bîlcimle dî xîzmeta Emîr'bûn
Fîlcimle jî sîrrê hev xebîrbûn

Serhelqeyê wan perimîsalan
 Sertacê ewan melexîsalan
 Tacdîn-ı dı gotinê cıwanek
 Gohderz'ê zemanê pehlewaneke
 Nesl û neseb û hesêb eyanbû
 Serdefter û serwerê kuranbû
 Babê wî dı gotinê Sîkender
 Lekîn Ereban dı go Xezenfer
 Lewra ku bî gêrî şîbhê şêrbû
 Roja şerê ew hezar-ı mêrbû
 Tacdîn du bîra hebûn dı qellaş
 Manendê du şahîbazê cemmaş
 Daîm dilê dıjminan dı sotın
 Yek Arif, û yek Çeko dı gotın
 Emma wî jî cimle xas û aman
 J'ew çende bîra û bab û maman,
 Lawek kırîbû bîra jîbo xwe
 Nê.. Ez xeletım.. Çıra jîbo xwe
 Roja ku ewî bîra ne dîta
 Teşbîhê şeva çıra ne dîta
 Dinya lı wî têk dı bûye tarî
 Rojbû ku lı wî dı kır tewarî
 Enbazê fereh, şerîkê xembû
 Sergeşteyê xem bî navê Mem'bû
 Mem jî lı wî aşîqek temambû
 Ne şîbhê bîra û bab û mambû
 Her çendî birayê axiretbû
 Te d'go ku dinê û axiretbû
 Tacdîn weledê Wezîrê Dîwan
 Mem jî xelefê Debîrê Dîwan
 Ew herdu cıwan, we lêkî aşîq
 Ew herdu bîra, we pêkve sadîq

Yek Qeys'ê zemanê, yêk-ı Leyla
 Yek Wamîq'ê esre, yêk-ı Ezra
 Ew yarê jî dîl, ne serserîbû
 Reh şîbhetê mîhr û Mîşterî'bû



Yarî û bîrayî û muwaxat
 Na bîr bî rîyâî-yû meqalat
 Yarî ne hêsanîye, cefaye
 Meqsûd-ı jî yarîyê wefaye
 Axir tu eger ne kî wefayê,
 Ewwel me de ber xwe wê cefayê

XI

PÎROZKIRINA NEWROZ Û SERSALÊ

Xellaqê cîhan'î feyzê fitret
Hey'atê felek bî wechê qudret
 Bê qalib û bê mihît û mîqyas
 Bê alet û bê mîşîr û mîqras
Ev çende mezzem û mîdewwer
Ev renga mîsenne'û mîkerrer
 Înane bî me'reza wîcûdê
 Kêşane bî menzera şîhûdê
Hikmet ewe ev hemî lî karîn
Hîndek dî peya û hîn sîwarîn
 Hîndek dî betî'û hîn serîn
 Hîndek dî mîn û hîn menîn
Hîn mîdbîrîn ew, hînek mîdebber
Hîn mîqbîlîn ew, hînek mîqedder
 Hîn katîbîn ew, hînek dî ustad
 Hîn mîtrîbîn ew, hînek dî cellad
Hîn Rojeperest û hîn şebefrûz
Hîn xusserevîn û hîn xemendûz

Hindek dî mîsalê Zîn zerîne
 Hîn şîbhê Memê dî mîşterîne
 Bîlcimle mîseyqel û minîrîn
 Hîn padîşehîn, hînek wezîrîn
 Hindek jî teherrika tebîî
 Ew têne bî nuqtaya rebîî
 Tecdîd-î dî kîn jîbo me salê,
 Gava wekû têne î'tîdalê



Zanayê mîemmerê kuhensal (1)
 Ev renga he go jîbo me ehwal
 Go: Adetê pêşiyê zemanan
 Evbû lî hemî cî-yû mekanan:
 Weqtê wekû şexsîwarê xawer
 Tehwîl-î dî kîr dî mahê Azer (2)
 Yanî ku dî hate bîrcê Şersal
 Qet kes ne dî ma dî mesken û mal
 Bîlcimle dî çûne der jî malan
 Hetta dî gîhîşte pîr û kalan
 Roja ku dî bûye îd û newroz,
 Tazîmê jîbo dema dîlefroz,
 Sehra û çîmen dî kîrne mesken
 Beyda û dîmen dî kîrne gulşen
 Xasma ezeb û keçêd-î bakîr
 Elgîsse: Cewahîrêd-î nadîr
 Têkda dî mîzeyyen û mîlebbes
 Vêkra lî teferrîcê mîrexses
 Lêkîn ne bî tuhmet û bî mînnet
 Belkî bî terîqê şer'û sunnet

(1) Zana: «Dana» bû, me lî şûnê «Zana» nivîsî.

(2) Mahê Azer: Hîva Adarê. Roja 21'ê Adarê roj ve dî gere,
 ew roj Newroz'e.

Lewra ku ewan xerez ji geştê
Meqsûd-î ji çûniya bî deştê,
Ewbû ku: Çi talib û çî metlûb
Yanî du teref, mihîbb-û mehbûb
Ev herdu celeb ku hev bî bînin
Kufwêd-î xwe ew jibo xwe bînin

XII

DERKETINA BAJARÎYAN BÎ DEŞTÊ, JIBO SERSAL Û GEŞTÊ

Dewra felekê jî bextê feyroz
Dîsan ku numa jî nûve Newroz
 Mebnî lî wî adetê mîbarek
 Şehrî û sipahîyan bî carek
Bajêr û kelat û xanî ber dan
Teşbîhê bî nejdîyan û cerdan
 Sef sef dî meşîne koh û deştan
 Ref ref dî xuşîne seyr û geştan
Esnafê umem, sîxar û kubbar
Qet'a ve ne ma dî şehre deyyar
 Hindek bî peyayî çûne baxan
 Hindek bî sıwarî çûne raxan
Hindek bî tebaî-yû bî kesret
Hindek bî hevalî-yû bî wehdet
 Ra bûne ve xanî û xewatîn
 Wan jî tîjî gul kîrî besatîn
Horan kîre meskenê xwe cennet
Bê perde û bê melal û minnet

Dûşîze û duxter û ruwalan
Pakîzeîzar û zîlf û xalan
Etrab û kewalîbêd-î ezra
Mîrdan û mîrahiqêd-î zîba
Eshabê qumaşê lutfê ruxsar
Erbabê metaê hîsnê dîdar
Wan lêk dî kîrîn metaê yek erz
Texmîn dî kîrîn bî tûlê wel-erz
Sewdakîrê îşqêbûn dî bazar
Hem bayîê hîsn û hem xerîdar
Sersalî û bakîr û ruwalan
Sedsalî-w cîwan û pîr û kalan
Sersalê lî resm û rahê mahûd
Gêrane dî çû meqamê mehmûd

XIII

MÎR DESTÛRA XORTAN DI DE JIBO ÇÛYINA GEŞTA NEWROZÊ

Qendilê minîrê dêrê ezreq
Mîşkatê Hemel ku kîr mirewweq
 Sersal-1 ku bû jî nûve ma'mûr
 Mîr daye kurêd-1 taze destûr
Destûr-1 ku bû jibo wîşaqan
Ra bûn hemî şibhetê uşaqan
 Têk çûne bî ma'reza mezadê
 Dildadeyê meqsed û mîradê
Îlla ku tenê Memo û Tacdîn
Wan dane xwe duxterane tezyîn
 Yanî dî dema ku bûye tehwîl
 Ew herdu bira dî cametebdîl
Îstebreq û sundusîn dî berda
Çend mî'cîz û meqreme bî serda

Kagul kırîbûne turre' her sû
Perçem kırîbûne zılf û gêsû
Wan lew kırîbû lîbasê tesrîf,
Da qet ne bitın lı wan çu teklîf
Pûşîde lîbasê dîlberanî
Seyran dı kırın bı sergıranî

XIV

MEM Û TACDÎN RASTÊ ZÎNÊ Û SITÎYÊ TÊN Û DI XEMÎN

Wan herdu kurêd-î cametebdîl
Weqtê dî kırım dî şehre tehwl
Nagah-î ecaîbek numa wan
Yek cuz'î jî aqlê get ne ma wan
Dîtin dî mehelle û zıkakan
Her kuçe û xurfe û şibakan
Sed taze ciwan jî rengê serwan
Dîba û herîr û xez dî ber wan
Pênsed jî keç û kur û ruwalan (1)
Ew çende jî qismê pîr û kalan
Enwaê mûzekker û miennes
Hindek dî birehne, hın mîlebbes
Hindek dî ealî-yû ekabîr
Hindek dî edanî-yû esaxîr
Pêxwas-î hînek, hînek dî serkol
Kaşo jî pîyan, û ser wekî hol

(1) Pênsed: «Pansed» bû, me lî şûnê «Pênsed» nivîsî.

Sermest-ı hınek, hınek dı serxweş
 Dembeste hınek, hınek dı demgeş
 Goyende hınek, hınek dı xamûş
 Poyende hınek, hınek dı medhûş
 Hın camedırîde, hın dı serxweş
 Hın aqlê remîde, hın mışewweş
 Hından dı kırım fıxan û feryad
 Hın bûyî jı qeydê aqlê azad
 Her yek dı meqamekî digergûn
 Her yek bı cefayekî cegerxûn
 Ew herdu demek veman teheyyır
 Bûn xerqeyê lucceyê tefekkır
 Tacdîn sekınî û pırsıyar kır
 Pırsa xwe bı yêkê extıyar kır
 Go: «Ey Xızırê rehê hıdayet!
 Bêj, ev çı belaye bê nîhayet?»
 Wî gotî: «Du şehlewendê şeddad
 Îro lı vî xelqî bûne cellad
 Herçî ku dı bînin ew du serxweş
 Fîlhal-ı dı kın weha mışewweş»
 Wan go: «Te ne dî, ku ew çı rengın?»
 Wî go: «Du kurın, zîyade şengın»
 Wan go ku: «Bı şûrê şeşperın ew?
 Ya ne bı xedeng û xıncerın ew?»
 Wî go ku: «Bı xemze û bı awır
 Xelqê dı kujın wekî bı kêbır»
 Wan pırsê dı kır ku, ger bı bînin
 Da bo xwe bı merdî dest helînin
 Herdu dı wî karîbûn ku, nagah
 Dîtin ku jı mehzê qudretullah
 Ew herdu puser wekî du peyker
 Tabende bı şıklê şahê exter
 Yekhey'et û şıkl û yeklibasın
 Emma dı wî şehırî rengnenasın

Sîretmelekın, suwerperîne
 Ne bayûn ew, ne mîşterîne
 Van herdu bîran ku ew du ewbaş
 Dîtın, dîl û can we dan bî şabaş
 Ew reng gerîyan cınûn waleh
 Êdî qe ne bûn jî aqlê ageh
 Ne fehm û xîred, ne aql û ne hoş
 Gêr bûne lî ser zemînê, medhoş
 Fîlcımle jî aql û canê têr bûn
 Fîlhal-î jî dûrve herdu gêr bûn
 Wan herdu firîştêyêd-î kubbar,
 Dîtın du melek zîyade dîldar
 Mehparene, lêkîn afîtabın
 Dîldarene, lê cegerkebabın
 Teşbîhê bî seydê nîvebısmıl
 Bê şîbhe gîhane halê mîşkıl
 Naçar'î bezîne ser şikaran
 Fîkrîne ruxêd-î wan nîgaran
 Zanîn ku ne seydê serserîne
 Serxeylê sıpahê dîlberîne
 Westan û nezer kırım bî dîqqet
 Wan hate bî qelbê rehm û rîqqet
 Elqîsse: Jî hîsnê van xezalan
 Rehmek kete qelbê wan ruwalan
 Sırra dîlê kîr bî hev teellîq
 Nûra ruxê wan bî hev teessîq
 Meksûfe terîqê aşînayî
 Rûhan qe ne kîr jî hev cudayî

Yek rengekî sırfê alemê xeyb.
 Zahir dî kîr ittîhadê lareyb
 Hubbê we kîrîn bî hev girîftar,
 Hîsnê we kîrîn bî hev telebkar,
 Te d'go ku, çî qalib û çî meq lûb
 Herçar-î, çî talib û çî metlûb,
 Bê şîbhe yekîn; çî ten, çî erwah
 Ew mittehdîn; çî can, çî eşbah
 Hubba dî dîlan û ger helawet
 Buxza dî dîlan û ger edawet,
 Nîsbet bî me hadîsîn, edîmîn
 Lêkîn jî heqîqeta qedîmîn
 Lewra ku cînûdê can, mîcenned
 Çê bûne dî îlmê Heq mîxelled
 Hîn mî'telîfîn, hînek mîxalîf
 Hîn mîxtelîfîn, hînek mîalîf
 Wan mî'telîfan-î pêkve ulfet
 Axîr we kîrîn, ne ma çu kulfet
 Yanî ku ewan kurêd-î xwînxwar
 Gava wehe dîtîn ew bîrîndar,
 Ew herdu bî sed dîlan hebandîn
 Rûnîştîn û herdu wer gerandîn
 Gavek seyîrîn lî bejn û balan
 Pêlek heyîrîn lî zîlf û xalan
 Gotîn: «Eceb ev keğêd-î kêne?
 Yan herdu melaîkêd Xwedê'ne?
 Ev meywe lî kî cihî gîhane?
 Ev gul dî çî gulşenî numane?
 Serwêd-î çî cûyebarekîne?
 Teyrêd-î çî mîrxîzarekîne?»
 Ma-werdê jî hîstîrêd-î gulgûn
 Rêhtîn lî ruxêd-î wan dî pîrxûn
 Îşqê kîrîbû wîsa ne heşyar,
 Qet'a ne dî bû jî xwe xeberdar.

Axır ku kırım bî xameya eşq
 Hısna xetê wan lî lewhê dîl meşq
 Wan vê ku bî zanî ew çî eslî
 Lewra ku nî zanî ew çî neslî
 Enguşterîyêd-î wan cîwanan
 Kêşan jî esabîêd xwedanan
 Xatem jî enamilêd xwe kêşan
 Danîne cîyan, jîboyê nîşan
 Yaqût-î bî mohrîyan guhorîn
 Elmas-î bî şûşeyêd belorîn
 Sersal û xweşî jî dest bî der dan
 Eysê xwe bedel kırım bî derdan
 Nagah-î ecanîbî xuya bûn
 Nakam-î kırım weda'û ra bûn
 Man herdu bîra wekî du seydan
 Pabestê selasilan û qeydan
 Ra bûn ku şevêk sîyah û tarî
 Şems û qemeran kirî tewarî
 Reh şîbhetê mîrxê nîvebîsmîl
 Bê quwwet û bê tewan û bê dîl
 Sersem û dewar û ser'û mecrûr
 Sewda û fuad û xebl û mexmûr
 Sed carî dî ketne asîtanan
 Hetta ku gîhane aşîyanan
 Her çendî gîhîştine meqaman
 Emma ku lî wan du telxekaman,
 Roj û şev û weqt û sîbh û êvar
 Yeksan dî numa lî wan bî yek car

XV

MEM Û TACDÎN JI MESELÊ HAYDAR DI BIN

Ew doxîteçesmê herdu şahîn
Ew soxîteper Memo û Tacdîn
Xweş çûne şîkarê kebk û qazan,
Nagah-î bî serve şîbhê bazan,
Nûrek fitilî lî wan jî nageh
Êdî qe ne ma ewan çu ageh.
Hîndî ku dî hefteya Hemel'bûn
Ew zêde dî wehşî-yû xebelbûn
Ew hefte lî wan ku bûye salîf
Xokerdeyê îşqê bûn mialîf
Ra bûne ve rojekî pêkve (1)
Fîkrîne bî reng û rûyê yêkve
Îşqê kîrîbû wîsa mîbeddel
Wan yêk û dû nas ne kîr jî ewwel
Ewwel dî kîrîn jî hev texerrîb
Paşê ku kîrîn bî hev teqerrîb,

(1) Dî vê ferdêda kêmayîkî heye, lewra wezna wê şîkandîye.

Dîtin xwe bî paçebend û zengıl
 Perwaz û firîn mihal û mışkil
 Uskûfeke zîmetê bî serda
 Cîlfûyeke ulfetê bî berda
 Bê ta'me û bê şerab û bê çav
 Bê meqsed û bê mîrad û bê gav
 Mestane jî rengê çeşmê dîldar
 Mexmûr û sîyah û mest û bîmar
 Manendê dehanê yarê, dilteng
 Nalîn jî reha dîlê, wekî Çeng
 Gotin: «Eceb em ku bûne bîmar?
 Ya bûne dî kî şerî birîndar?
 Ya ne wehe em çîra nî karîn?
 Mecrûh û zeîf û dîlfîkarîn?»
 Ev renge he wan dî kîr tefehîs
 Mahîyettê halê xwe tecessîs
 Tacdîn fîkîrî dî dest birayê
 Tîsît guherek wekî çîrayê
 Yaquteke mîslê daneyê nar
 Meş'el sîfete jîbo şeva tar
 Manendê şemalê ew tîsî
 Hekkak-ı bî navê «Zîn» nivîsî
 Destê xwe dirêj kîrê ku bînit
 Da qenc-ı nezer bî ket, bî bînit
 Mem jî fîkîrî, dî destê Tacdîn,
 Elmaseke bêbuha û texmîn,
 Lê îsmê «Sîtî» kîrî kîtabet,
 Ustadekî sahibê meharet,
 Serref-ı eger bî bîte Buqrat
 Texmîn bî ketin bî wezn û qîrat,
 Bazar-ı bî ket jîbo Felatûn
 Mecmûê xezâined-ı Qarûn,
 Sîmna semenêd-ı wan nîgînan
 Na bit bî wîqûfê dûrebînan.

Mayın dı teeccıb û teheyyır
 Da man û gelek kırın tefekkır
 Zanîn ku sewahibê nîgînan
 Herçî kırî, kır Sîtî û Zîn'an
 Roja weku bûyî îd û tehwîl
 Ew jî gerîyane cametebdîl
 Çawa xemilîne ev, keçanî
 Ew jî gerîyane cilkuranî
 Ewbûn ku me go: Dî rojê Newroz
 Mîslê meh û mîhrê alemefroz
 Ew herdune êd-ı dest vemıştın
 Ew herdune êd-ı xel dı kuştın
 Ewbûne dı şehrê bûyî cellad
 Ewbûne ku xel jî dest bî feryad
 Ewbûne lî van ceger kewandın
 Ewbûne lî van ceger kewandın
 Wan herdu biran bî aql û texmîn
 Bê şaîbe qatîlê xwe zanîn
 Tacdîn-ı, lî nîk hebû şîûrek
 Îşqê dı wî hîştîbû qusûrek
 Go: «Ra be bira! jî nav nivînan
 Bes ah-ı bî ke jî ber bîrînan
 Em şêrîn, û ew dı xwe xezalın
 Pîr eybe ku em jî dest bî nalın»
 Mem puxteyê îşqêbû temamî
 Gotî ku: «Bira! Meger tu xamî
 Da zen ne bîrî mîcessemım ez
 Ser ta bî pîyan mîqessemım ez
 Ev cîsm-ı lî mın buye mîxettet
 Ew xet hemî bûyîne mîneqqet,
 Te'sîr-ı we rengî îşq û wemqen
 Bît-tûlî dı tûl û erz û umqan,
 Yek nuqte nehın jî derdê xalî
 Hêja tu dı bê: «Çıra dı nalî?»

Dîl bûye mehellê îşqê hala
 Vî halî dî vî mehellê vala
 Nîne eceb er bî bêm hîlûlê
 Mîn maye jî sûretê heyûlê
 Şahînşehê îşqê bê xerez hat
 Cewher veşîrî, dema arez hat
 Ev hal û mehell-û cîsm û cewher
 Îşqê jî xwera kîrîn mîsexxer
 Can û ceger û dîl û hînavan
 Dest û ser û pê û pîşt û çavan,
 Wellahî yekê ne maye rahet
 Bîllahî yekê ne maye taqet
 Bîzdandîne wan jî mîn elaiq
 Bîlcîmle dî bîn ku: «Nehnu aşîq»
 Na pîrsî lî halê mîn, tu zalîm!
 Hêja tu dî bêjî ez ne nalîm»
 Ev renga he wî ku kîr tezellîm
 Tacdîn qe ne ma jîbo' tekellîm
 Ew mane dîgel evan bîrînan
 Behsa me lî ser Sîtî û Zînan

XVI

ZÎN Û SITÎ JI SERSALÊ VE DI GERIN Û SERPÊHATINA XWE JI DAYA XWERA DI BÊJIN

Ew jî vegerîn bî wî lîbasî
Hazır şêlîyan ku kes ne nasî
Her çendî kîrîn lîbasê tebdîl
Emma ne dî bûn jî halê tehwîl
Îşqê kîrîbûn wîsan mîbeddel
Êdî ne dî çûne halê ewwel
Qet kes ne dî go Sitî û Zîn'e
Xelqê we dî zanî, ecnebîne
Dayîneke wan hebû zemanî
Teşbîhê belayê asîmanî
Zala felekê lî ber zebûnbû
Wê navê jî pîrê Heyzebûn'bû
Ew hatî jî xefletê bî serda
Fıkrî ku cîlêd-î wan dî berda
Rûnîştine bê mezaq û meşreb
Wînda kîrîne zîqen dî xebxeb

Yanî dî teheyyır û melalın
 Mehpare dî haletê webalın
 Cılwa buyî cewcemêd-ı taze
 Rengê semenê bî cayê xaze (1)
 Kafûre mîsıl, izarê qanî
 Sorgul gerîyane za'feranî
 Zanî ku perî dî bê lîbasın
 Meclûbê mehebbetê unasın
 Go: «Ey hewesa dîl û hınavan!
 Her yek jî we rohnîya du çavan
 Hafız jî werâ meger Xwedê bit
 Canê me jîbo werâ fidê bit
 Hun hinde mîqeyyedın dî qeydê
 Îro bî tenê ku çûne seydê,
 We zû şemîrand jîbo çî sersal?
 Hun rastî bî bîn, ku bûye ev hal?
 Bêjın ku mîqeddîme çî renga?
 Ev heyrete, ya xıyalê benge?
 Hun bo çî hezînın ey metaya!
 Nînin çu netîce bê qezaya
 Hun bêjîne mın, ku bû qezîyye?
 Kengê lî me xef dî bit xebîyye?
 Ez dê nuhe remlekî bî rêjım
 Îsmê û zemîrê ez bî bêjım
 Yan şûşe û mendıla xwe danım
 Mahîyyetê halê dê bî zanım»
 Wan gotine dayeê nîhanî:
 «Em sibhê ku çûne dar jî xanî,
 Herçî lî me bû duçar û peyda
 Hazır gerîya cınûn û şeyda

(1) Semen: Kulîlka Yasemîn. Cayê xaze: Ciyê sor û kumeyt; yanî dêmên wanêd sor sıpî bûbû, bûbû wek Yasemînê.

Axır ku jî heddê çûye der cewr
 Cewrê lî me aqîbet numa dewr
 Em jî gerîyan melûl û mexbûn
 Hatîne ve em xefîf û mecnûn»
 Dayîn bî teennî-yû tewella
 Çû b'alîve, daye wan tesella
 Go: «Hun bî cemalê şehriyarm
 Her yek jî we şah û xundekarın
 Kî bit ku ne bit mitî'û mîhtac?
 Kî bit ku ne dît we bê teleb bac?
 Herçî we hebandî, ey perîzad!
 Hısna we dî ket jibo we mınqad
 Xasma dî vî şehri bit we dîldar
 Ez Dê wî bî kîm nuha xerîdar
 Bêjın kîye? Da bî çım bî bînim
 Hazır bî kırım, jibo we bînim»
 Wan gotine Heyzebûn'a sahir:
 «Derdê lî me, ey tebîbê mahir!
 Bê şîbhe dewa jî dest te têtın,
 Teqrîr-ı eger jî dest me bêtın.
 Teqrîr û edakırın mîhale
 Tedbîr û dewakırın betale
 Hîndî hene Kêj û kur dî Bohtan
 Belkî dî cemîê bejn û bohtan
 Kes nîne bî lutf û hısnê meşhûr
 Îlla ku dî deftera me mestûr
 Yanî hemî rû bî rû me dîne
 Hîndî dî vî şehri ademîne
 Îrohe du keç xerîqê şîba
 Ser ta bî qedem debîq û dîba
 Zîbende jî şıklê şahê xawer
 Tabende jî rengê mahê enwer

Nageh lî me bûn duçar û zahîr
 Gêr bûne jî dûrve herdu nadîr
 Em çûne bî ser, binên ku kîne
 Fîkrîn, ne wekî me ademîne
 Tehqîq-î melek weya perîbûn
 Lewra ku jî av û gîl berîbûn
 Gava ku me dîtî ew perîzad
 Em jî gerîyan jî aqlê azad
 Ew herdu wekî du camê Cîmşîd
 Em herdu mîsalê mah û xurşîd
 Gava weku pêkve bûn mîqabîl,
 Mîsbah û zîccac-î bûn mîadîl,
 Qarûre jî necmê min'ekîs bû
 Nûrek me bî qelbê mîqtebîs bû
 Qendîl û fitîle ger jî wanbû,
 Agîr jî ruxê me herduwanbû
 Zeytê me û agîrê me d'îsa
 Ber bû me, û dîl me pê eyîsa
 Sohtîn xwe bî xw, nî zan çî hale
 Heşyarîye, xewne, ya xîyale?»

XVII

DAYE GUSTÎLÊD MEMÊ Û TACDÎN DI BÎNE

Dayîn heyirî ji macerayê

Go: «Ey rih û qalibêd-î dayê!

Hun çûne teferrîca ruwalan

Farîx ji teşşîqa xezalan

Şîklê ku we dîtî bê meale

Meyla we bî qismê jin mihale

Meyla beşerê beşer dî vêtin

Emma we keçan, puser dî vêtin

Keç qet li keçan dî bin xerîdar?

Bê neqdê kuran mihale bazar

Kur ayîneyê cemalê zatın

Keç mezherê pertewa sîfatın

Bê zatê, sîfet erez mîsale

Cewher ne bitın, erez betale

Qaîm dî bitın erez bî cewher

Bê şemsê, qemer dî bit minewwer?

Meyla jî ruxê kuran berî bit
 Sed car-1 ku horî-yû perî bit,
 Ew meyl-1 ku dê bî ket we meftûn?
 Ew Leylê, ku dê bî ket we mecnûn?
 Mecnûn ku ne bit edilê Leylê,
 Leylê ku dî ket bî leylê meylê?
 Gul qet lî gulan dî bîte aşîq?
 Ezra xwe bî xwe dî bîte Wamîq?
 Xusro ne buwa sıwarê şebdîz
 Şêrîn lî şekîr dî bûye Perwîz?
 Ferhad-1 cûwa sırîşkê pîrxûn
 Nîna, ne dî dî sıwarê gulgûn
 J'ew çende he alema rîcalan
 Begzade û sade û ruwalan,
 Dîl qet we ne bî bî kesve mail
 Gêjin dî edanî-yû erazîl.
 Bê nam û nîşan dî xeyrê ma'rûf
 Qelbê we bî van ku bûye meşxûf,
 Ev emr-1 bî mîn qewî mîhale
 Ev xewne we dîtî, ya xîyale»
 Zînê ku bîhîstî ew meanî
 Ev nexme jî perdeyê deranî,
 Ev renga he gote: «Dayeya pîr!
 Xalîb te ne maye aql û tedbîr
 Te d'go ku: Bî da'wet û ezam
 Halê ku xefî bîtin dî zanîm
 Şîklê ku me dî ne bê meale
 Tehqîqe; ne xewne, ne xîyale
 Wan ger melek û eger beşerbûn
 Ger qısmê nîsa'û ger puserbûn
 Engûsterîyêd-1 wan evane
 Înane me wê jîbo nîşane
 Remlê tu bî rast eger dî zanî
 Xatem eve, dê bî zan xwedanî»

Wê şehleyê hilekarê cazû
 Go: «Bîne jibo me xateman zû
 Da îşeve remlekî bî rêjum
 Hetta sîbe sahiban bî bêjim»
 Hazır Sıtiyê nîgîn deranî
 Da destê ecûzeye zemanî
 Zînê wehe gote Heyzebûn'ê:
 «Mîn dîl bûye werteyek jî xûnê
 Gava weku werte têtê coşê
 Weqtê ku dî ket bî ket xuroşê
 Teskîn dî ket ev nîgîn, dîlê jar
 Dem dem ku dî dîm bî çêsmê xwînbar.
 Zînhare! eger dî bî nîgînê
 Zû bîne ve, bo me dîlhezînê
 Lewra bî wîye me sebr û saman
 Ew bo mîne xatema Sîlêman

XVIII

DAYE DI ÇE CEM FALAVÊJ

Wê delleyê bê fesal û mih̄tal
Sibhê xwe gîhande pêşê Remmal
Zêrek-du bîrîn dî dest xwe bo pîr
Ev renga he kîr zemîrê teqrîr,
Go: «Mî du kurik hayîn dî masûm
Bê bab û yetîm û jar û mehrûm
Roja weku bûye îd û sersal
Ew jî bî terîqê teb'ê etfal
Ra bûne ve herdu çûne geştê
Xûlan xelîandibûn lî deştê
Îrohe dema ku bûne peyda
Dînin, telesîn, cînûn û şeyda
Hatîne ve bê lîbas û tazî
Geh geh dî kîrîn fîxan û gazî
Bêheş dî kevîn, gelek dî mînin
Gava weku ra dî bîn, dî dînin
Ev xatemene ewan dî destîn
Goya tu dî bê bî van dî mestîn

Ey waqîfê remz û kaşîfê raz!
 Bê çareme ez, tu çareperdaz!
 Îhsan bî ke, qenc-ı jê xeber de
 Kanê sebîyêd-ı mîn çî derde?
 Mecnûniye, ser'e, ya hewaye?
 Çawa mereze, çî bo dewaye?
 Ey mırşîd û pêşewayê mîqbîl!
 Hellalê uqûd û hellê mîşkîl!
 Sırrek heye wê dî van nîgînan
 Peydaye lî nîk we dûrebînan
 Eshabê nîgîn bî bêje, kîne?
 Cunnîne, perîne, ademîne?»

XIX

FALAVÊJ FAL DAVÊJE Û DAYE DI KEVE ŞIKLÊ HEKÎM, LI MEMÊ Û TACDÎN DI GERE

Ew warisê ilmê Daniyal'ê (1)
Gava fikirî dî şiklê falê
 Fîlhal-î dî rehîmê ummehatan
 Bê wez'ê tewellîda benatan
Lehyan û neqîyyê pêkve dîtin
Tacdîn û Sîfî'ye pêkve dîtin
 Şiklê ferehê digel xemê dît
 Bê perde wî Zîn digel Memê dît
Ev renga he gote qasîda pîr,
Meqsûd-î bî mekr û kîzb û tezwîr:
 «Ma qet dî bîtin jibo te hasîl,
 Bê rastî? Rûwê mihale menzil (2).
Te d'go ku: kurêd-î min dî dînî,
Na bêjîye min: Sîfî û Zîn'în

(1) Daniyal: Pêxemberekî Cihûdane.

(2) Mana vê rêzê eve: Ma bê rastî, rûwê menzil û daxwazê bî destê te dî keve? Ev ne mîmkune.

Roja weku çûne geşt û seyran
 Wan dîne lî rê du dideheyran
 Yanî du kurêd-î serweqamet
 Ra bûye lî wan kuran qiyamet
 Filhal-î evan du afitaban
 Dîl çûye ve bal du mahîtaban
 Ew bûne jî îşqê van dî bê hoş
 Ev bûne jî hîsnê wan dî medhoş
 Ev şîfete-yê belayê îşqin
 Ew teşneyê kerbelayê îşqin
 Ev xateme, yêd-î wan kuranin
 Van jî du nîgîn dî destê wanin
 Çawa xemilîne ev kuranî
 Ew jî gerîyane cîlkeçanî»
 Pîrê wehe gote şêxê remmal:
 «Mîn şîbhe ne ma dî keşfê ehwal
 Lêkîn tu bî bêje: Ew çî eslîn?
 Qenc keşf-î bî ke ku ew çî neslîn?
 Şêx go ku: «Dî dînê îşqebazî
 Bey'ek heye, ew dî bîn «Terazî»
 Bê şertê kefaetê rewaye.
 Şertê mîteaqîdan rîzaye
 Xasma ku kurêd-î van bîjarî
 Durdaneye yek, û yek mîrarî
 Begzadeye yek jî neslê mîran
 Yek jî bî neseb kurê debîran»
 Wê sahîreyê jîbo nîşane
 Dîsan xeberek kîre behane
 Go: «Aşîq û mîbtela û dînan
 Meftûnê jîbo Sîtî û Zîn'an
 Ew na bîne qabilê hîsaban
 Na kuncme defter û kîtaban
 Şêxê! Tu dî zanî Ev Cîzîr'e
 Têkda kubera û Kurdemîre

İhsan bı ke, perdeyê helîne
 Ew herdu melek, bı bêje Kîne?
 Ehda me we bit: Tenê bı bînim,
 Çıl zêrî bı çım jıbo te bînim»
 Şêx go: «Tu here, bı bîn wîsaqan
 Teftîş-ı bı ke cî-yû wîsaqan (1)
 Herçî ku dı bêjin ew elîle
 Ew îlle jıbo tera delîle
 Bı'nmê xwe bı sûretê tebîban
 Bê perde dı bîni wan hebîban
 Gava ku te dîtın ew melekwar
 Kıfşe jı qumaşê jı xerîdar
 Xasma ku, dı destê wan nîgînın
 Manqûşe lı wan Sîti û Zîn'ın»
 Ra bû ve acûze şıbhê Luqman
 Ser ta bı qedem dewa û derman
 Qarûre û huqqe, nışter û kîs
 Hel girtın ewa xebîse telbîs
 Danî pexıla xwe çend kîtêbek
 Dı numa bı hekîmîyek ecêbek
 Hazır xwe gîhande pêşekaran
 Fîlhal-ı bûye nedîmê yaran
 Wan go: «Tu jı kûve têt, çı pîrî?
 Xalıb tu jı ilmekî xebîrî»
 Go: «Ger çı ku zahırî hekîmım
 Zêde bı du îletan elîmım
 Zaîl dı kım ez qewî du janan:
 Derdê bedenân û derdê canan»
 Wan go: «Tu jıbo mera xeber de
 Derdê ku lı can-ı bıt çı derde?»

(1) Wîsaqan: Ev kelîme dı zarê Erebi'da bı mana «Zexm»-e, lê ev mana jı vırna dest na de. Wîsa tê texmînkırın ku «Wetaqan» bûye, bı şaşbûn «Wîsaqan» hatiye nivîsîn. «Wetaq» bı mana ciyê rûniştina mezinane.

Wê gotî ku: «Hun meger ne bînin
 Wî derdî, elametın nehînin
 Ew derdekî zêde bê mecale
 Sîhhet jî wî derdîra mîhale
 Dûr bît jî we ew, gelî ruwalan!
 Ew berqê dî sûretê şepalan,
 Gava ve dî dît, wekî birûske
 Bê şu'le û pêt û bê çirûske
 Bê cerhe û qerhe û birîne
 Navê lî wî derdî her evîne
 Emma we dî sojîtin hînavan
 Xwîna dîl-î tê jî herdu çavan»
 Wan gotine wê ku: «xeyre meqdem!
 Halen nexweşin jî me du hemdem
 Îhsan bî ke, herduwan dewa ke
 Derman ke, bî new'ekî tu ra ke
 Herçî tu dî bêjî, em wîsa kîn
 Herçî tu dî xwazî, em eda kîn»
 Pîrê xwe gîhande nîk merîzan
 Weqtê fikirî dî wan ezîzan,
 Wê gote bî hemdem û delîlan:
 «Tenha me bî hêlîn, û elîlan
 Da ez bî kırım vî derdî teşxîs
 Paşê bî kîm ez dewayê telxîs»
 Hevrê hemî çûne der jî ba wan
 Pîr ma, û tenê dîgel du lawan

XX

DAYE BI MEMÊ Û TACDÎN'RA DI PEYÎVE

Bîmarê bî derdê îşqê bedhal
Nageh fikirîn ku çûne haval
Rûniştî jî pêşê wanve Zal'ek
Qametçivîyayî, renghîlalek
Aheste kelamekî dî bêjît
Dî'grîtin û hîştiran dî rêjît
Gotin: «Çi kesî tu ey dîlaram!
Bo çî dî girî weha bî nakam?»
Wê go: «Bî serê Sîtî û Zînê
Mehza, jî wera dî kim girînê
Maxsûs-î jî nîk Sîtî û Zîn'an
Hatim lî we xweş bî kim birînan
Enguşterîyêd-î we evane!
Înane me wê jibo nîşane
Hun hel gîrîn û bî dîn nîgînan
Bednam-î me kîn Sîtî û Zîn'an
Ez qasîd, û hun jibo me meqsûd
Hun mîn me kîn ey mîrad-î! Merdûd»

Ev mijde ewan dema kîrîn goş
 Yekcarî jî şahîyan ne ma hoş
 Heşyar-î ku bûn, demek ne westan
 Fîlhal-î bezîne pê û destan
 Tekrar-î lî dest û pê û dawan
 Sed bûse dî dan ewan du lawan
 Dayîn heyirî jî îstîyaqê
 Ber da girîyê jî îftîraqê
 Go: «Xem me xun, ey mîrad û meqsûd!
 Mîzgîn jî wera, bî heqqê Mabûd,
 Tewfîq-î refîq-î bit jî Barî,
 Ez dê we bî kîm bî sîhrekarî,
 Hun cîmle lî erdekî cema bîn
 Herçar-î bî meqseda xwe şa bîn.
 Nam û neseba xwe hun eyan kîn
 Sîrra dîlê bo mera beyan kîn
 Da ez ve gerim bî van nîgînan
 Tesxîr-î bî kîm Sîtî û Zîn'an
 Tacîl-î bî kîm jîbo sewabê
 Zû bême ve, ez dîgel cewabê»
 Tacdîn-î nîgîn jî dest deranî
 Da destê ecûzeyâ zemanî
 Mem tê fikirî ku bê nîgînê
 Kengê dî ketin mîdar û jînê?
 Go: «Daye! Tu mîn bî dêre mazûr
 Kî can-î dî dît jî dest xwe destûr?
 Ev xateme îsme, ger tîlîsme
 Mîn can ewe, qalibê me cîsme
 Ey daye! Tu qasîdê hebîbî
 Bê şîbhe lî derdê mîn tebîbî
 Sedqê serê zilcemalê, Zînê
 Me'stîne jî destê mîn nîgînê
 Gava tu dî qî ve, ey wefadar!
 Ev renga jî mîn bî bêje dîldar

Ew şahe, eger çı ez gedame
Eltafê şehinşehane ame
Ez bende ne laîqê wîsalım
Xursendê bi sûretê xıyalım
Razîme jı ew qeder cemaî:
Mın bînte xelweta xıyalê
Her gah-ı jı ahê dıl bî tırsıt
Geh gah-ı lı halê mın bî pırsıt»

XXI

DAYE VE DI GERE CEM SITÎ Û ZÎNÊ

Ew herdu nîhalê Er'era şeng
Rûniştî mîsalê xunçe dilteng
 Çıvyayî, bî fıkr û sernişivî
 Her lehze jî dayeyê bî hêvî
Mexmûrê xebûqê bê nîhayet
Mıstaqê sabûhêbûn bî xayet
 Dîtin ku jî nagehî tebîbe
 Wê hatî bî sûretek ecîbe
Zîn û Sîtî'ya jî îşqê medhûş
Wan daye kîrîn rewan der axûş
 Gotin: «Bî Xwedê kî, ey dîlaram!
 Aya te kîrîne ew melek, ram?
Remla te çî go? Perî te zanîn?
Yan herdu dî şûşeyê te anîn?
 Tîra lî me kun kîrî sıwêda
 Aya te beyan ne kîr ku, kê da?»
Wê go: «Bî serê wêyê mîbarek
Sed carî qesem dî kim, ne carek

Ez hatime vê demê ji ba wan
 Emma guneha me tê bî lawan
 Her dem ku «Sîtî» û «Zîn» dî bêjin
 Sed rengî sîrîşkê xwîn dî rêjin
 Qurbanê we bîm, bî vê kemalê
 Ew herdu beşer bî wê cemalê,
 Çawa we bîjarin ew du mîmtaz
 Zîbendeyê weslîn ew serefraz
 Wellahî qesem dî kîm bî Barî
 Ew herdu durêd-î we bî jarî,
 Na bîn dî çu berr-û behr û kanan
 Nînin we, melek dî asîmanan
 Ew herdu jîbo wera sezane
 Mîrzane eger, we ger gedane»
 Ew delle bî dîl we bûye dellal,
 Dildade jî pêşve man demek lal
 Zîn û Sîtî'yan ne ma dî dîl hoş
 Gava ku ewan kîr ev xeber goş
 Elqîsse: Jî kunhê macerayê
 Heşyarî ku dayêê dî dayê,
 Agîr te dî go gîhande neftê
 Pêt jê dî çû asîmanê heftê
 Îşq agîre, ten çîyayê Tûr'e
 Dîl ew şecera bî nar û nûre
 Mîşkate qefes, qebes çîraye
 Can zeyte, fitîlê wî xefaye
 Dîl şûşeye, ew çîra dî nave
 Sîr cuz'e, dî kullêda belave
 Bîlkul jî serî heta bî eqdam
 Sohtin bî wî agîrê dîlaram
 Gotin: «Jî mera tu dîlnewazî
 Ey daye! Jîbo me çaresazî

Dehqan tuwî, em wekî nîhalîn
 Ezman tuwî, em bî xwe dî lalîn
 Ger lehzeyekî ne kî tu guftar
 Ger saetekî ne bî tu xemxwar,
 Em dê weku xar û xes, heba bîn
 Em dê wekû bergê, berhewa bîn
 Ey Waqîfê waqîatê dêrîn!
 Em xeyrê te mehremen ne dêrîn
 Tacdîn û digel Memê te gotî:
 «Perwanene, per lî wan me sohtî»
 Ew jî nuhe pîr dî întîzarîn
 Belkî jî me zêdetîr neçarîn
 Ra be here zû, bî bêje Tacdîn:
 Ger dê te Sîtî bî vê, Memê Zîn,
 Mîzgîn jî wera, me hun qebûlîn
 Em jî jî we zêdetîr melûlîn
 Îşqa we celew jî me revaye
 Manî' lî me perdeya heyaye
 Ew perde jibo wera edîme
 Bêperdeyî bo wera qedîme
 Xwazgîn û wesaît û wesîle
 Herçî ku jî ba we bîn, cemîle
 Ev rege bî bêje wan hebîban
 Mecmûê mewalî-yû xetîban
 Hindek jî wera bî bîn rîcaçî
 Hindek jî mera bî bîn duaçî
 Belkî kırıbt Xwedê mîqedder
 Wesla me û we bî bit mîyesser»

XXII

MÎR SITIYÊ DI DE TACDÎN

Xweş weqte jibo elîlê mîştâq
Xasma ku jibo qebîlê uşşaq
 Dermanekî sıhhet û şîfayê
 Mızgîn û beşareta wefayê
Nageh bî gîhîte wan jî durdan
Azade bî ket ewan jî derdan



Ew daye jî reng Eristetalîs
Ser ta bî qedem libasê telbîs
Dîsan kete sûretê tebîban
Hazîr xwe gîhande nîk hebîban
 Ew mijde, wekî me gotî, gotin
 Ew sohtî, wekî ne sohtî, sohtin
Emma bî wî agirî we geş bûn
Te d'go qe nexweş ne bûn, dî xweşbûn
 Goya ku ewan jî dest Felatûn
 Xwarin bî yeqîn dewa û macûn

Herçî ku wekîle bêt û rûnît
 Mewla kîye? xutbeyê bî xûnît (1)
 Eqda Sîtiyê me kîr lî Tacdîn
 Îcabê eve». «Qebûle».. Amîn (2)
 Fîlhal-î Çeko bezî, û pê Mîr
 Teqbûl-î kîr û qebûlê teqrîr
 Mecmûê Mela û Şêx û Mîran
 Axa û ekabîr û feqîran
 Vêkra bî devê xwe wan sena kîr
 Têkda bî dîlê xwe wan dua kîr
 Mîr go «Bî qutîn def û rubaban
 Bînin hemî şerbet û şeraban
 Da bezmeke şadîmane danîn
 Îro he, ku sibhê em nîzanîn,
 Dê şibhetê vê demê dî xweş bîn?
 Ya dê bî mîrîn, weya nexweş bîn?
 Hublaye leyalî, ey mewalî!
 Kanê çî dî zên elettewalî?
 Ev şîwen û şahî tew'emanîn
 Ev çerx û felek dî bê emanîn
 Geh nûrê numane, gah-î mezlem
 Geh sûrê numane, gah-î matem
 Gava ku dî bîni weqtê îşret
 Da fewt-î ne kî zemanê fîrset
 Lewra ku zeman mîsalê şîre
 Ne bêjîtin ev melaye, mîre
 Îro he jîbo rîzayê Tacdîn
 Mîn jî jî xwe ed bîkîn bî xwazgîn
 Ev çende zemanê ew xulame
 Daîm dî xulamîyê temame

(1) Mewla: Mela.

(2) Qebûle: Wekîlê Tacdîn vê gotinê dî bêje. Yanî mîn mara Sîtiyê lî Tacdîn qebûl kîr.

Ew hinde dî xızmeta medabû
 Umrê wî dî ber meda fena bû
 Şerte dî şerîeta wefayê
 Em jî jî wîra bî xun cefayê
 Îro he dî xızmeta wî ra bîn
 Bîzzat-ı dî xızmeta wîda bîn
 Mêrê wehekî bitın, ku canî
 Şabaş ne ditê bî şadîmanî?
 Ger mın hebitın hezar û yek ser
 Wan cıme dî rojekî bî defter,
 Ger ez ne kırım fîda bî carek
 Mîrînî lî mın ne bît mîbarek»
 Tacdîn ku dî xızmeta Emîr'bû
 Çeşna wî dî dest, û çeşnegîrbû
 Elqîsse: Bî şewketa xwe ew Mîr
 Ra bû bî xwe bûye çaşînîgîr
 Kêşa wî bî meclîsa xwe xwanek
 Goya kîre fers-ı asîmanek
 Qursê meh û mîhrê asîmanê
 Înan, te dî go bî cayê nanê
 Ev lengerîyêd-ı zîv û zêrîn
 Şıbhet felekêd-ı jor û jêrîn
 Her sehnê mezın mîsalê bîrcek
 Serpoşê lî ser jî rengê dîrcek
 Her tebsî-yû kaseyêd-ı fexfûr
 Yek exterê pîrzîyayê pîrnûr
 Cedy-û Hemel'ê dî asîmanê
 Bıryan û kebabê mêhîmanê
 Her kase û tebsîyek yek enbar
 Serşare, şebîhê nefse emmar
 Enwaê teamê çîrb û şêrîn
 Elwanê xîda û nuqlê rengîn

Van meşrebe û eyaxê çîrî
 Dewran dî kîrîn bî nazenînî
 Seyyare sîfet bî geşt û seyran
 Herçî ku dî dî dî mayî heyran
 Narînc û tîrînc û nar û leymû
 Newbaweyê şaxîsarê mînû
 Fanîz û nebat û qend û şeker
 Ma-werd û zîbad û mîsk û enber
 Hîndan dî kîrîn meîde, xaze
 Hîndan dî kîrîn dîmaxê, taze
 Mecmer gerîyan bî ûd û enber
 Bûn cîmle meşamê can mîetler
 Rameşger û xweşnewa û xweşdeng
 Şayeste û xweşqumaş û xweşreng
 Hevdeng-ı hînek bî sewtê sazan
 Hemdeng-ı hînek bî fexr û nazan
 Muxnî-yû kemance, ûd û tenbûr
 Çeng û def û zûrîna û sentûr
 Uşşaq û newaîraqî-yû ewc
 Vêkra dî kîrîn bî rasîtî zewc
 Awaze û şu'be û maqamat
 Bê perde bî mu'cîz û keramat
 Zahr ku dî bûn jî Nayê gerdan
 Xaretkerê aql û dîn û îman
 Saqî şewîşîn bî abê engûr
 Mîtrîb herîşîn bî seytê Sentûr
 Qewwal û mîxennî-yû xezelxwan
 Mexmûr û sîyah û mest û sekran
 Elqîsse: Lî rexmê seb'ê şeddad
 Danîn bî wî resmî ursebînyad

Xettatê felek, jî dest qelem ket
 Cellad-ı dı kır ku wî qelem ket
 Nahîd-ı bî erdêda dı da çeng
 Meh çû veşîrî dı Bircê Xerçeng
 Kêwan-ı dı Delw'êda nîhan bû
 Bercîs-ı dı Hût'ê bênîşan bû
 Dinya hemî bûye eys û îşret
 Zala felekê jî kerb û hesret,
 Çû j' dest ne dı hat û maye acız
 Naçar-ı ecûze bûye kadız
 Şeyxûxeyê çerxê rengsemawî
 Rehwarê semaê kır reha wî (1)
 Alem hemî bûye îşretabad
 Şehrî bedewî, ebîd û azad
 Mîstexreqê nî'met û tereb bûn
 Mîstecmeê şahî-yû leeb bûn
 Ra bû ve, ku xwan jî ber xewasan
 Saqî gerîyan bî cam û kasan
 Mîr xundine pêş Memo û Tacdîn
 Go: «Çerxe lî min Memo! Tu şoşbîn»
 Ew herdu kîrî tamamî melbûs
 Ra bûn bî edeb etek kîrî bûs
 Rûniştin û pêkve wan ve xwarin
 Ew rojê bî yekve rabûwarin

(1) Rehwarê semaê: Rewanê govendê. Kır reha: Ra kır, bezand. Yanî gêr bû û gerîya.

XXIII

DİLANA SİTİYÊ Û TACDÎN

Weqtê wekû nûerûsê xurşîd
Neh qubbe, mîsalê camê Cîmşîd
Fîlcimle kîrîn bî rux mîcella
Goya ku kîrîn bî zêr mîtella
Meşgate û daye û perestar
Îşqê kîrî cimle germebazar
Çûn zeyn-î bî kîm Sîtî û Zînan
Nazende bî kîm du nazenînan
Ewwel fikirîn dî zîlf û xalan
Dîtin ku dîlan dî bî bin bî talan
Gava fikirîn dî qewsê ebrû
Bûn şîbhetê wesme, jê sîyehrû (1)
Fîkrîne ruxêd-î wan dî taze
Şermende dî bûn bî cayê xaze (2)

(1) Wesme: Boyaxa bîrûwan. Yanî hingî ku bîrûwêd Zînê û Sîtîyê reşbûn, ew boyax lî ber wan gewr dî ma û vana jî jî ber wêwe şerm kîrîn, rûreş bûn.

(2) Bî cayê xaze: Dî şûna rengê sorda. Yanî dîtin ku rûwêd wan jî rengê sor sortire, jî ber wê yekê, jî ber rengê sorve şerm kîrîn.

Qadır ne dî bûn, jî sîrmeyê reş
 Ahûyê Xeten bî kîn mîşewweş (1)
 Ser ta bî qedem jî rengê şane
 Sed se'yê kîrîn jîbo behane
 Mehza jî du ahûwan yek ahû
 Wan seh ne kîrîn heta serek mû
 Îlla, serê mûyekî meyanbû
 Ew jî bî mesel, ne ten, ne canbû
 Qet'a jî mexafeta şikestîn
 Qet lê kemerek ne hate bestîn
 Kes dîl ne dî da çu lê bî bînî
 Belkî ku jî nazîkî şikînî (2)
 Ma dest-1 dî da ku dest û pence,
 Henna bî ketîn bî rengê rence?
 Neqşê ku Xwedê kirî mîxeyyer
 Kî qadîre wî bî ket mîxeyyer?
 Axîr gerîyan jî rengê me'yûs
 Ew man û hena û reng, û pabûs (3)
 Zînet jî qedêd-1 wan hebîban
 Bexşîne zemîn tela û şîban
 Ferxende kîrîn bî ferqê, efser
 Tabende kîrîn bî tacê, gewher
 Serlewheyê sefheyê mîsenne'
 Zîbende bî zîwerê mîresse'

(1) Bî kîn mîşewweş: Tevîhev bî kîn. Yanî çavêd wanên wek çavên xezalêd Xeten'ê hingî ku reşbûn, xemlînokan nî karîbûn kilê reş bî kêşînê û çavêd wan bî wî kîlî tevîhev bî kîn, ne xweş bî kîn.

(2) Yanî Jî dilê kesê ne dî hat ku kemberê lî newqêd wan bî bîne. Lewra dî tîrsîyan ku jî ber nazîkîyê, kember newqêd wan bî şîkîne.

(3) Yanî jî ber ku ihtiyaca keçan bî xemilandîna wan tunnebû û hena wan, rengêd wan hemî dî dest wanda tewş man; şermî bûn, serêd xwe xwar kîrîn, serêd wan hate ber lingêd wan, wek ku lingêd xwe maç bî kîn.

Pîraye jî rewneqa cemalê
 Bû hale lî xermena hîlalê (1)
 Elmas û zimerred û mîrarî
 Xal û xet û turreyêd-î tarî
 Manendê kîtabê şairane
 Mewzûê bî wez'ê xane-xane
 Ev rewneqê arizî û zatî
 Bû nusxeyê sîhr û mu'cizatî
 Ebyat-î bî cem'ê bûne dîwan
 Ayat-î bî sun'ê bûne qur'an
 Ew sin'etê ositadê mitleq
 Herqî ku dî dî dî go: «Huwel-Heq»
 Tezyîn-î ku bû temam lî bûkan
 Ayîn kete çarîsî û sûkan
 Enwaê tecemmîl û melabîs
 Elwanê cewahir û nefais
 Sed carîye û dused benî çûn
 Zerbestê lîbas û zerbenî çûn
 Naqe bî qîtar û dur bî qentar
 Yaqût-î bî bar û zêr bî xerwar
 Xarîc jî teeddîda hîsaban
 Xarîq lî teqeyyîda kîtaban
 Ne'dhate teeqqîl ev cîhaze
 Ne'dbûn mîtehemml ew cemaze
 Vê debdebeyê we kîrne aşîq
 Bû zelzele, ra kîrîn xelîq
 Şehrî jî mîzekker û miennes
 Fîlcîmle mîzeyyen û mîlebbes
 Teşbîhê bî behrê pîrtemewwîc
 Cunbeş dî kîrîn, xerez teferrîc

(1) Yanî rûwêd wan wek hîvêbû, ew xeml û xêz jî lî dorê bû wek bêder û seywana hîvê.

Nageh gerîya bî Cûdî meftûh
 Dergahê kerem lî geştîya Nûh
 Yanî ku îmareta Sîtî tê
 Qesra perîya bî rasîtî tê,
 Her texte jî ûdê sendelûsî
 Textek xetebendê abenûsî
 Erşek jî cewahîran mîresse'
 Belqîs-î celîsê wî mîrebbe'
 Dest bestî jî pêşve pêşekaran
 Durrînkemer û guherguharan
 Sed Asefê Berxîya wekî ba
 Hemmalî dî kir bî erşê, dîlşa
 Hel girtine ser serê xwe ew mehd
 Dest-dest dî revand jî hev bî sed cehd
 Ew texterewan wekî gemîbû
 Behra ku bî ser ket, ademîbû
 Behrek jî hewa ku hate coşê
 Naçar-î jî dîl dî ket xiroşê
 Xulqî cîhê cimle aşiqane
 Perwane û şem'ê dermeyane
 Sofî û mela, feqîr û paşa
 Vêkra lî teferrîc û temaşa
 Xelqê ku jî dest xeman bî feryad
 Ferdek qe ne ma nebûyî dîlşad
 Her ber derekî şemateyek lê
 Her mecme'ekî temaşeyek lê
 Te d'go ku erûs-î eynê cane
 Lew bûne bî dîl lî pey rewane
 Sazan mîrî hey kîrîn wekî Sûr
 Kûs û def û Kerrena û naqûr

Şabaş û seda û gaze-gazan
 Gohdar-ı xenî kırım jî sazan
 Vêkra ku seda jî wan bî der ket
 Qesra felekê seda bî ser ket
 Ev eys û neşatê şadîmanî
 Na dîde bî dîdeyan zemanî
 Fılka feleka melek dî navê
 Mewcan ku reva dî weqt û gavê,
 Ev tentene û şîar û ayîn
 Çûn lehzeyekî gîhane Tecdîn
 Tacdîn bî xwe bûye padîşahek
 Mem jî lî tenîştê şîbhê mahek
 Rûnîştî dî şehneşînê alî
 Cem'ek jî ekabîran hewalî
 Ra bûn lî teferrîcê ve westan
 Wan cîmle, tebeq dî herdu destan
 Manendê tîbaqê esîmanê
 Yaqût û zîmîrredê dî kanê
 Rêhtîn tebeqê durê nîsarê
 Jorda lî îmarîya nîgarê
 Emma tebeqêd-ı wan hemî pîr
 Zêr û werîq û cewahir û dur
 Yexmakerê gencê bûne maşa
 Xîzan hemî bûne mîr û paşa
 Sed carî lî hêvîya herîsan (1)
 Xarîc jî cîvandîna xesîsan,
 Fazl jî kerameta kerîman
 Zaîd jî xudanîya leîman (2)

(1) Herîsan: Dîlbîjokên dîravan; yanî ew zêr û zîv û gewherên ku hatin rêhtîn, sed car zêdetîrbîn jî wî qasê ku wan dîlbîjokan hêvî dî kırım.

(2) Xudanîya leîman: Pîştandîna çikûdan

Xızan û geda we bûne mun'em
 Mıflıs bûye jinberest û muxlem (1)
 Xızan û geda, xenî û zengîn
 Şadan û hezîn û şa û xemgîn,
 Êdî ne di bûn ji hev mîşexxes
 Te d'go hemî mîrekın, mîrexses
 Têkda di minasıb û mîwafiq
 Vêkra di mîsafih û mîanıq
 Hasıl ku ji meqseda seramest
 Bûn ew der û ban û ew sera mest
 Hın mest û hınek di kîrdebengî
 Xwanende û bezlego û çengî
 Her bengî-yû serxweşêd-ı Bohtan
 Têk hatine çerx û baz û lotan
 Bêrîte, sema û saz û govend
 Şêrîn û şekerleb û şekerxend
 Ezra û ruwal û bîkr û mîrdan
 Hor û melek û perî û wîldan
 Gulpîrehen û semenqebayan
 Şekkerdehenan û qendexayan
 Zêrînkemeran û keckulahan
 Tel'etqemeran û xetsîyahan
 Zîvînbeden û semen'îzaran (2)
 Sêvînzîqen û memîkhınaran
 Ev mûyemeyan û maregêşû
 Ev çarîdesale, çareebrû
 Mîrdan û mîrahîq û mîcerred
 Lawê we ku xet wekî zîmerred

(1) Mana vê rêzê eve: xızan û parsek wisa têrdırav bûn ku, jibo têrkırına zikê xwe ihtiyaca wan bi fırotına namûsa wan ne ma; ji ber vê yekê kesên jinperest û tolaz mıflıs bûn, êdî nî karı-bûn namûsa kesekî bi dırvan jê bi kırın.

(2) Zîvînbeden: «Simînbeden» bû, me lı şunê «Zîvînbeden» nivîsî.

Xweşdeng-ı hınek, hınek dı xweşreng
 Hın cergebezî, û hın dîger leng
 Bîlcımle lı rexmê vê ecûzê
 Yanî lı xîlafê piştekekûzê
 Kêjêd-ı sıvık, kurêd-ı lawîn
 Manendê benat û mîslê Perwîn (1)
 Hın daîrebend û hın dı dewwar
 Hın sîlsîlebend û hın dı seyyar
 Encım sıfet encımên firozan
 Heft şev dı temam û heft-ı rozan
 Bezma Sîtiyê û cem'ê Tacdîn
 Gêran bı vî rengî zîb û tezyîn

(1) Manendê Benat: Wek stêrên «Termê Maxirê».

XXIV

FIND TACDÎN DI XÛNE CEM SITIYÊ

Damanê erûsê pakê gerdûn (1)
Damadî ku kîr bî mîhrê gulgûn
Tarîfî bî rohnîyê ku ra kîr
Xem şibhetê zîmetê fena kîr
Weqtê seherê jî rojê heftê
Ağir te di go gîhişte neftê
Germîyyetê narê qurbê meqsûd (2)
Ra kîr jî wicûdê aşiqan dîd
Cem'îyyetê xasê ağır û bad (3)
Elbette di ket mirov-î berbad
Ev îşq û hewa ku bûne dîdaş
Can û dilê dê bî dîn bî şabaş
Sebrê şewitandî îftîraqê
Têk sohtê qîran û ihtîraqê

(1) Dawa bûka pak, ku ew jî gerdûne; dawa gerdûnê ku wek bûkekî pak û paqije.

(2) Germîya agirê nêzbûna daxwazê.

(3) Ağir : «Ateş» bû, me li şûnê ağır nivîsî. Bad: Ba. Yanî civîna ağır û bayê di cîyekî xîsûsî û tenhada.

Deryayê mehebbet uştulum kır
 Aram û şekîb û sebrê gum kır
 Mehbûb û mihîb jî fertê teşwîr
 Hatın ku bî bîn bî şewqê teqdîr (1)
 Meşşate û mihreban û dayîn
 Şoşbîn û meharımêd-ı Tacdîn
 Mistewcibê weqtê dîn mîlaqat
 Bermûcib û mîqtezayê adat,
 Mecmûê mîbexxerat û mî'tır
 Memzûcê mîferrehat û mîskır
 Cam û qedeh û eyax û mexmer
 Ev mîsk û zîbad û ûd û enber
 Ma-werd û gulab û îtrê şahî
 Elqîsse: Jî mahê ta bî mahî
 Esbabê neşat û eys û îşret
 Alâtê sefa û zewq û sıhbet
 Ew çende kîrın ewan mîheyya
 Mehza mîrî pê dî bûn mîheyya
 Arasîte bû erûsexane
 Dîwar û der û urûşê xane
 Ra bûne ve xasekî û xadım
 Hîndek dî eqarib û meharım
 Şem'ek bî temame û mîtella
 Şemsek bî cemale û mîcella
 Hel girtine ser serê xwe reqqas
 İnane meyanê meclîsa xas
 Şem'ê bî zîmanê halê bê qal
 Ev renge he kır beyanê ehwal
 Kî: «Ey aşîqê bê qerar û bê tab
 Ger şîbhê minî xwedan teb û tab,
 Ra be here hecleya erûsê
 Pabende bî be bî payebûsê

(1) Yanî Kırın ku bî şewqê bî mîrın.

Şem'a te wekî te întîzare
 Şewqa te lî can û cîsmê nare
 Sohtin te bese mîsalê şem'an
 Bes şîbhetê min bî bare dem'an
 Ger aşîqî, ra be şîbhê ferraş
 Canê xwe bî de nîsar û şabaş
 Ey saîyê meqseda tewafê!
 Wey salîkê menheca metafê!
 Ew qîble û Kabeya te meqsûd
 Nêzigê te bûye emrê Mabûd
 Beyt û Hecer û Meqam û Hicra
 Se'y û Teleb û Tewaf û Umre
 Barî jî tera kîrîn mîqedder
 Ha bûne jîbo tera miyesser!
 Avî, tu rewan be pêşê selwê
 Şêrî, tu heman kerem ke xelwê»
 Tacdîn-î jî sûretê şemalê
 Manayê mehebbeta şepalê
 Zanî bî teemmîl û bî îdrak
 Ra bû jî cîyê xwe çest û çalak
 Yarê xem û şahîyan Memê jar
 Vêra bûye sahib û sîlehdar
 Destê wî dî dest, û dîl dî dîlbû
 Bû hacîbê derge, şûr lî mîlbû
 Tacdîn bî vî terzî çû serayê
 Mem ma lî derî digel duayê
 Lewra ku mexûfbû ew mîlaqat
 Melzûme lî aşîqan mîadat

Ger qısmê mihîbb-û ger hebîbın
Elbette bı dıjmin û reqîbın
Hın dêw û hınek jı wan perîne
Hındeک dı minafiq ademîne

XXV

BÛK Û ZAVA DI GÎJIN HEVDÛ

Zava bî edeb ku çû ji der'dan
Şem'a ku li pişt hîcab û perdan
Ra bû ku ji pêşve çû, xeraman
Kêşa li zemîn bî naz-î daman
Zîlfêd-î xwe kirne paye endaz
Destêd-î xwe kirne ferqê perdaz
Dêma ku bî nûrê, Beytîl-eqsa
Qendîlê felek bî wê dî îsa
Mexmûrê xebûqê derdê hîcran
Mıstaqê sebûhê weslê canan
J'ewwelve li adetê mîbahî
Destê xwe dirêj kire sırahî
Noşî ji sırahîya şekerleb
Noşîn qedehek ji mey lebaleb (1)
Mexmûrî ku def'ê kîr meya nab
Bêhn kîr gul û sînbîlêd-î têrab (2)

(1) Lebaleb: Lêv bî lêv, tîjî. Yan jî ji lêvên hevdu ve xwarin.

(2) Gul: Mexsed jê dêmên bûkêne Sînbîl: Mexsed jê bîsk û zîlfêd wêne.

Geh nêrgız û lale, gah-ı sorgul
 Reyhan û binefşe, gah-ı sinbıl,
 Têk têkve dı dan û têk dı bestın
 Hın bûse dı dan û hın dı gestın
 Ew çende bı yekve radımûsan
 Newbet ne dı dane hev lı bûsan
 Elmas û guher cebîn û dından
 Tebdîl-ı buwîn bı la'l û mırzan
 Deryayê mehebbetê we kır coş
 Dest gerden û leb bı leb, hemaxûş
 Medhoş-ı buwîn bı wê mıdamê
 Bê heş we ketın jı ser qıyamê
 Qadır ne dı bûn bı kın quûdê
 Gêr bûne bı yekve bo sîcûdê
 Tekrar-ı jı secdeyê ku ra bûn
 Ew çende bı yekve herdu şa bûn
 Şekkır jı lebêd-ı yek revandın
 Sorgul jı ruxêd-ı yek cıvandın
 Terkîb-ı kırın jıbo xwe gulqend
 Tezwîc-ı ku bûn bı yekve dîlbend
 Sê roj û şevan bı dîl peyapey
 Wan teşneleban ve xwarın ew mey
 Mîstesqîyê şerbeta meya nab
 Axır ku nebûn bı şîrbê têrab
 Keyfiyyetê neş'eya şerabê
 Kêşane kemalê îstîrabê
 Safîzîqen û bedenşefafê
 Kır meyl û mehebbeta zîfafê
 Sermest-ı bı destê têk herıstın (1)
 Bû kelte û gelc, û da harıstın
 Dem lêk pıçîyan û dem cuda bûn
 Geh têk hejîyan û **geh dı** ba bûn

(1) Bı destê têk: Bı destê hevdû.

Dem ew dîdubûn û gah-ı yekbûn
 Geh cot û bî yekve, gah-ı tekbûn
 Tîra ku jî acê, berhedêf bû (1)
 Amac-ı bî sefweta sedefbû
 Amac-ı ku bû mehellê peykan
 Durdane bedel kîrîn bî mîrcan
 Nebî hatî ve, nesl-ı ma dî wêda
 Nesla xwe jî can û dîl bî wê da
 Peyweste bî roj eger bî şevbû
 Wan ber jî mehebbetê bî hevû
 Hemware du serxweşêd-ı serkeş
 Vala dî kîrîn lî yek du tîrkeş
 Ger roj û eger şevêd-ı reşbûn
 Ew herdu melek we pêk dî xweş bûn
 Goya te dî go du kîmîyager
 Meşxûl-ı buwîn bî eqdê cewher
 Ew rûh û cesed bî yekve mînzem
 Nefseyn-ı bî yekve bûne mîdxem
 Înzalê legen nîzûle îbrîq
 Tes'îd-ı kîrîn bî qer'û enbîq (2)
 Memzûcê şebîhê şîr û şekker
 Mexlûtê wekî heyat û kewser
 Qet'a çûnebû ne xur, ne xwabek
 Wan bîr ne dî hatî nan û abek
 Ew hefte temam-ı bûye gerdek
 Agah-ı ne bûn jî halê ferdek
 Xalîb gerîya lî derdê sıhhet
 Xem çûn vaşîrîn jî kerbê weslet

(1) Jî acê: Jî dîranê fîl, wek wî sîpî. Berhedêf bû: Lî amancê rast bû, berê xwe da amancê.

(2) Mexsed bergirtîna bûkê jî zavêye.

Nageh seherê ji rojê heştê
 Rîdwan meşîya ji nêv bihuştê (1)
 Mem hê ji wisa li ber derîbû
 Daîm ewî ser li ser berîbû
 Hêja ewî mesken asîtanbû
 Rojan û şevan we pasîpanbû
 Tacdîn ku ji gerdekê bi der ket
 Rojek te di go Memê bi ser ket
 Fîlhal-î we reng-î şadîman bû
 Hem'efserê ewcê asîman bû



Yarek te hebit, meger we bitin
 Ger dê we ne bit, meger ne bitin
 Yarê bi tera bitin mîwafîq
 Sed xızmed-î xalîm û mmafîq,
 Qurban bi ke, qet me bê mîxabîn
 Çi' dki bi kesan ku bê wefa bîn?
 Qurban bi ke, qet me bêje kêne?
 Bê kêne bira! eger bi kêne (2)
 Yarê te jibo tera biraye
 Hem çave jibo te, hem çiraye

(1) Rîdwan: Serekfiriştê Bihuştê. Mexsed zavêye.

(2) Bê kêne: Bê kêrîn. Bi kêne: Bi kêrîn.

XXVI

BEKİR Lİ CEM MÎR FESADÎYA TACDÎN Û MEMÊ DI KE

Gava jî edem Xwedê kîr îcad
Ev kewn mekan jî nûve bmyad
 Mecmûê mîkewwenatê alem
 Hetta ve xulase new'ê adem
Eşya bî heseb sîfat û ef'al
Înane wîcûdê mîxtelif hal
 Mewcûd-î kîrîn bî hev mîeyyen
 Ezdad-î kîrîn bî zîd mîbeyyen
Ev erd û sema betî'û daîr
Ev mîlk û mele'k mîqîm û saîr
 Ev nûr û zelam û kufr û îman
 Ev xuld û seker, bîhûşt û nîran
Ev barîd û harr-û retb. û yabîs
Ev mîr û geda, xenî-yû baîs
 Ev ax û hewa û agir û av
 Ev leyl û nehar û sî-yû sîtav
Ev hîcr û wîsal û şahî-yû xem
Ev mewt û heyet û sûr û matem

Hın nûremîsal û hın wekî nar
 Hindek dî helîm û hın dî dijwar
 Van sadîq û rast û xêrexbawan
 Van qemsî-yû xwar û rûsîyahan
 Van ehlê cehennem û ezaban
 Van laîqê cennet û sewaban
 Na bînî ku Pêkve cimle ziddîn?
 Hikmet çîye, bo çî pêkve niddîn?
 Lewra ku ne bit eger texalîf
 Temyîz-î mihale, hem tearîf

*

Elqîsse: Bî îq tîzayê xîlqet
 Mîrê bî kemal û îzz-û rif'et
 Ra girtî jîbo xwe dergevanek
 Fettanê zêmanê, sey-pîsanek
 Daim li derê wî qapûcîbû
 Qella'û qelaş û qehwecîbû
 Emma bî neseb ne merdê Bohtan
 Belkî mitewellîdê jî buhtan (1)
 Eslê wî dî bîn jî Mergever'bû
 Mehza wî beşer bî şor û şerbû
 Navê wî minafîqî Bekîr'bû
 Belkî jî Belûqîya betîrbû
 Menna'û mîzebezbîn û îblîs
 Xedda'û xeberbezîn û telbîs
 Şagîrdê şeameta wî şeytan
 Şermende jî gotîna wî Bohtan
 Bedçehre jî rengê dêwê kabûs
 Bedfî'l û sîtîzekar û salûs

(1) Mitewellîdê jî buhtan: Jî derewan welîdîbû, piçbû.

Tacdîn-ı dı gote Mîr eyanî:
 «Mîrim! Bı ke der vî dergevanî
 Ev laîqê dergehê te nîne
 Ev kelbe, nehîndere, bı kîne
 Her çend se û dergevan birane
 Ekser se bı mîhr û bawefane»
 Ev renga he Mîr dı gote Tacdîn:
 «Fîlêd-ı Bekır meger nı zanîn?
 Em qısmê emîr-ı qısmê aşîn
 Pır fetl û gerîn, û pêş û paşîn
 Naçare jibo me aşıvanek
 Labıdde jibo me dergevanek
 Hîndî bı hıkûmetê dıkîn dewr
 Geh edle jibo me kar, û geh cewr
 Her çendî Bekır weled zınaye
 Aşê me ji wî bı fetl û baye
 Ev zımre ku zalım û ewanın
 Sûbaşı-yû şehne-w dergevanın
 Aşêd-ı me zalıman dı gêrın
 Dexlêd-ı mezalıman dı hêrın
 Aşê me eger çı weqfê ame
 Gewrî tîjî garısê herame
 Wî garısî harısek dı çînit
 Ev harıse bo me dê helînit
 Ev adete nîne xasê mîran
 Na bînî lı ber derê faqıran,
 Wan jî hemî pasıpan ji sanın?
 Ew jî hemî qısmê dergevanın
 Sultanê serîrê bê nîyazî (1)
 Na bînî jiboyê karesazî,

(1) Padişahê. textê bê lava; yanî Xwedê.

Hindî ewî ra kîrîn selatîn
 Deh çend ewî çê kîrîn şeyatîn?»
 Hasîl: Dî seyê xwe Mîr ne bûrî
 Ta'lîl-î dî dane ber zerûrî
 Mîrîn hene ew seyêd-î tazî
 Na dîm bî edaleyêd-î tazî (1)
 Ew kînewer û xebîs û mîdbîr
 Yanî Bekîr'ê bî dîl mîzewwîr
 Xewfa wî hebû bî xef jî Tacdîn
 Daîm dî dîlê wîda hebû kîn
 Weqtê ku bî dewlet û seadet
 Ev dawete bû bî resm û adet
 Xef j'ademîyan, wekî Ezazîl
 Mehza xereza wî kîzb û teswîl
 Tenha wehe gote Mîr, dî xefda:
 «Mîrîm! Te Sîtî qewî telef da
 Ew cewherê tac û tace cewher
 Ew efserê zîb û zîbê efser
 Ew renga sezayê text, û ew reng
 Ferzane bî eql û ferr-û ferheng,
 Kîsra bî keser jîboyê dînê
 Fexfûr-î bî xewre bo evînê (2)
 Qeyser jî kurê xwera bî xwesta
 Xaqan-î jî pêşve dest bî besta
 Hêja ne dî bû bî wî tu erzan
 Ev renga he ser serî bî dî wan»
 Mîr go: «Qe dî dîm, eya bedexter!
 Tacdîn û Memê, bî textê Qeyser?
 Roja weku bûye ceng û hawar
 Tacdîn û Memê, dused jî nayar

(1) Edaleyêd tazî: Hespên Erebî, Kehêl.

(2) Bî xewre: Bî heşdane, dî de heşê xwe, tîne bîra xwe.

Bîlcımle bı zırx û zend û binper
 Înan jî mera bı şûr û şesper
 Xaqan kiye? Ez çî kım bı Fexfûr?
 Na dım ez ewan bı rib'ê ma'mûr»
 Mel'ûn-ı ku dî ne bû çu te'sîr
 Ew mes'ele wer gerande tezwîr
 Go: «Qence heqîqeta humaman
 Hemsenge sedaqeta xulaman:
 Roja ve dî xun şerabê belwa
 Gava ku dî xun kebab û selwa,
 Çawane dî şahî-yû sefayê
 Ew renga dî tangî-yû cefayê,
 Arız ne bitın lî wan tebeddîl
 Zahir ne bitın jî wan tehewwîl.
 Mehza ne kın ev qusûrê xızmet
 Qet'a ne kın ew fitûrê hîmmet
 Ev zewq û cefa bı bin mîqabıl
 Ew sıdîq û wefa bı bin miadıl
 Lê zayîe hîmmeta kerîman
 Derheqqê nelaîq û leîman
 Nakes ne sezayê genc û male
 Nûres ne minasibê celale
 Menzûriye nûresan şerabe
 Mexmûriyê serxweşan xırabe
 Pîr aql-ı dî vêt û pîr tehemmîl
 Nûres bı meyê ne ket tehewwîl
 Mîrim! Te ne dî, Kurê Sîkender,
 Dayê te nezer, jî heddê gû der?
 Roja ku Sîfî te daye Tacdîn
 Wî j'alî xwe dayîye Memê, Zîn»
 Mîr go: «Çî eceb bı mîn ne kîr pîrs?
 Ya ne, wî ne mayîye jî mîn tîrs?»
 Go: «Ma tu nî zanî ew kusane?
 Mîrzaye, ciwane, pehlewane

Meydan diye wî, celew revaye
 Herçî weku ew bî ket rewaye
 Tîrsa mîn ewe: Bî kîbr û kînê
 Tuxyan bî katî jî paşê Zînê
 Da'wa nesebê bî ket bî Xahd
 Qesda hesebê bî het zewaid»
 Mîr go: «Me jî dîl hebû bî daxwaz
 Zînê bî Memê bî kîm serefraz
 Sondê dî xum ez bî rûhê walîd
 Hetta bî gîhîte ceddê Xahd
 Mehza bî zîkûrê neslê Adem
 Zîne bî jîmîtî ez qe ne dem
 Herçî jî serê xwe bûye bêzar
 Ha Zîn! Û bîla bî bit xerîdar
 Merdê jî ser û rîha xwe têre
 Bê xewf-î bî xwazîtin, ku mêre»



Hukkam-î bî batî û bî zahîr
 Bê şîbhe mîşabîhî bî agir
 Zahîr dî sîpahî-yû bî nûrî
 Batî jî mîdareyê dî dûrî
 Rehmê ku dî kî jî rengê dojî
 Qehrê ku dî kî cîhan dî sojî
 Zînhare, bî wan ne kî tu bawer!
 Ger bab û pîsî û ger bîrader!
 Xasma ku mîqerrebêd-î bedxwah
 Nêzîkî bî bî, neûzu billah!

XXVII

ZÎN BÎ AGIRÊ EVÎNÊ DÎ ŞEWITE

Tacdîn û Sîtî ku bûn bî hev şad
Weslê kîrîn ew jî hîcrê azad
Mem mayî dî kuncê wehdetê ferd
Ne yar û ne hemnişîn, ne hemderd
Hemdem ku ne bîn jîbo demanra
Hemderd-î ne bîn jîbo xemanra,
Xemgîn bî çî dê bî kîn tehemmîl?
Şahîn bî çî dê bî kîn tewessîl?
Şahîn û xeman dî vête enbaz
Derdan û deman dî vête demsaz
Unsîyyetê aşîqan sîkûne
Sermayeyê wehşetê cînûne
Asûde dî bîn bî yek dû, hemqal
Xasma ku hebûn bî yekve hemhal
Zîn û Sîtî-yû Memo û Tacdîn
Vêkra dî kîrîn mîdar û teskîn
Zîn'ê ku dî kîr jî derdê, efxan
Dengê Sîtfiyê dî bûye derman

Gava weku Mem bî dîl dî nali
 Tacdîn dî bûye hekîm lî alî
 Ev herdu jî herduwan cuda bûn
 Çûn herdu bî meqseda xwe şa bûn
 Man Zîn û Memê dî bê serencam
 Bê meqsed û bê mîrad û bê kam
 Çil rojî ne xur ne xwabê Zînê
 Ser ra ne dî bû jî ser girînê
 Xwîna dîlê bû xîda ûxwarîn
 Hîstir bî xwe şerbet û vexwarîn
 Hemware bî roj, eger bî şevbû
 Wê halî jî fîrquetê her evbû
 Rojan dî girî, bî şev dî kir ah
 Ew reng gerîya zeif-î ew mah,
 Bedra rûwê wê buwe hîlalek
 Tel'et dî numa wekî xiyalek
 Hemzad û heval û hemnişînan
 Hemraz û emîn û nazenînan,
 Her lehze dî gotinê bî rîqqet
 Kî: «Ey serwê rîyazê baxê rîf'et!
 Sersebze û berkê cûyebârî!
 Ev çende çî hîstîran dî barî?
 Hemşîre eger jî te cûda bû
 Xweş çû û bî hemserê xwe şa bû
 Wê girtîye bo xwe sebr û temkîn
 Ew şaye lî wê, tu l'êre xemgîn (1)
 Mîn be'dî, xeman jî qelbê ra ke (2)
 Teşbihê bî zîlfê ber vî ba ke
 Çîn çîn bî ke turreyd-î şebreng
 Gul gul ve ke arîzd-î gulreng

(1) L'êre: Lî êre, lî vîr.

(2) Mîn be'dî: Jî nuha pêda, piştî vê gavê.

Zulfan ve ke da bî bîn mîselsel
 İklîl-ı lî cebhetê mîkellel (1)
 Bîskan tu jî xumrîyan cuda ke
 Zulfan şe ke, pêkve berhewa ke
 Da sînbîl û sorgul aşîna bîn
 Reyhan û bînefşe ta bî ta bîn
 Bîskan bî werîne ser hîlalan
 Sewda ke dî Bekke'yê Bîlal'an
 Dîsan bî ke xumrîyan qedehnûş
 Ce'dan ve ke, Kabe bit sîyehpûş
 Ta xelq-ı jî xerb û şerqê, ta Şam
 Huccac-ı sîfet bî bestin îhram
 Peywend bî ke pêkve bîsk û xalê
 Şîrazê ke mîshefa cemalê
 Serlewheyê dêm bî bit mîzehheb
 Ayatê Xwedê bî bîn mîretteb
 Da fîrqeyê kafîr û mîsılman
 Tesdîq-ı bî kîn bî nessê qur'an
 Van xemze û awîrêd-ı xwînxwar
 Wan xîncer û keyberêd-ı dîjwar
 Zînhare, me dê cewaz û ruxset!
 Wan nîne bî kes çu rîfîq û rehmet
 Me'zûn bî ke turreyêd-ı terrar
 Da hukm-ı bî kîn lî şah û xundkar
 Perdê tu jî ber gulan helîne
 Bê sebrîyê bîlbîlan bî bîne
 Xendan bî ke xunçeya dehanê
 Nalan ke hezarê dasîtanê (2)

(1) İklîl-ı lî cebhetê mîkellel: Desteyên kulîlkan lî enîyê bî xemîlîn; yanî bîla zîlfên te wek kulîlkan lî enîya te belev bî bîn.

(2) Yanî bîla kena devê te îlham bî de çîrokvanan, ew jî bî wê îlhamê hezar çîrok bî nivîsîn.

Serxweş ke lî gerdenê guharan
 Sersem ke cînûn û dîn û haran
 Meyxur ke melan bî xenc û nazan
 Şêxan bî şeyîne ber berazan
 Destûr bî de bîsk û zîlf û xalan
 Agah-î bî gêre ehlê halan
 Da mîrşîdê bê terîqê haîm
 Sergeşte ne bî wekî behaîm
 Înkâr-î bî ket dalalê mitleq
 Îqrar-î bî ket bî sûretê heq
 Farîx jî tecellîya celalê
 Qanî' bî tesewwîra cemalê
 Fanî bî ketin ewê wicûdê
 Baqî bî bitîn bî vê şihûdê»
 Ev çende ewan dî gotin ev pend
 Zîn pê ne dibû sebûr û xursend
 Belkî bî nesîhet û bî pendan
 Yekcar dî kete bela û bendan
 Îşq agire, nefheye nesîhet
 Sîrperdeye, lewmeye fezîhet
 Hindî ku ewan dî kîr melamet
 Wê zêde dî bû jî wan nedamet
 Eşkan ne dîdane çavê fîrset
 Ahan ne dîda dehanê mihlet
 Da ev bî kelamekî xeber dît
 Ya ew bî meqamekî nezer dît
 Nasîh fîkîrîn ku we'z û teqrîr
 Na kî bî çu rengî nef'û te'sîr
 Mayîn dî teeccîbê ku ew mah
 Ev çende jîbo çîra dî ket ah?
 Wan her we qîyas dî kîr ku Zîn'ê
 Her bo Sitîyê dî ket grînê
 Dîtin ku xeber hemî hewa bûn
 Naçar-î kîrîn sıkût û ra bûn

XXVIII

ZÎN BÎ XEMANRA DÎ PEYÎVE

Zîn ma bî tenê dîgel xeman cot
Xem lê cîvîyan, jîbo xeman got:
 Kî: «Ey hemnefesêd-î bê newayan
 Feryaderesêd-î pîrcefayan
Hemderdê dîlêd-î derdemendan
Hemperdeyê sîrrê mîstemendan!
 Hemrazê dîlêd-î dîlbîrînan!
 Hemxwabeyê xatîrê hezînan!
Hemkaseyê xwanê bê teaman!
Hemmeşrebê rahê telxekaman!
 Aşîq bî we wasîlê cemalın
 Salîk bî we naîlê Celalın
Wêraneyê dîl we maye xalî
Qet xeyrê we kes nehın hewalî
 Çawa dî kîrın jîbo xwe ma'mûr
 Mîtleq jî wera me daye destûr
Dewlet bî weye dî darê dînya
Rîf'et jî weya serayê uqba

Xem lew me dî vên, ku bawefane
Na bên eve tehlî-yû cefane
Rojê reşîyane yarê canî
Yarê xweşîyane şadîmanî
Kewneyn-î çî acîl û çî acîl
Xemxwarî ne bî, ku têne hasil?
Hasîl: Bî we xweş dî bî lî min dîl
Bê gencê xeman, jî dîl çî hasil?»

XXIX

ZÎN JI SITÎYÊ GAZINAN DI KE

Geh gah-î Sitî dî kîr mîxateb
Ev renga he ew melek mîateb:
 Kî: «Ey rûh û rewanê qelbê Zînê!
 Nûra beserê dîyar û dînê!
Hemşadî-yû hemcefa û hemdem!
Hem lehm û îzam û cûld û hem dem!
 Hemşîre û hem cenah û hemser!
 Hembîze, hemaşîyan û hem per!
Wey teb'ê bî teb'ê mîn mîtabîq!
Îlla ku bî bextê na mîwafîq
 Sed şîkr-î, te bext-î bûye yawer
 Çawa te dî vê, we da te Dawer
Sed şîkr-î, te bext-î bû mîsaid
Tali' gerîya jîbo te said
 Bextê mîn eger çî zêde reş hat
 Ev qîsmete bo me zêde xweş hat
Teqşîmê xeman jîbo mîra bû
Teqdirê ezel, yeqîn wîsa bû

Şahî jî tera, û xem jibo mîn
Tacdîn jî tera, û Mem jibo mîn
Xem çûn ku lî sûretê Memê'ne (1)
Lew xem jî mira lî ser xemêne»

(1) Çûn ku: Lewra ku. Lî sûretê Memê'ne: Lî şiklê wîne, yan jî lî rûwê wîne.

XXX

ZÎN BI FINDÊRA DI PEYÎVE

Dem, şem'ê dî kir jibo xwe demsaz
Kî: «Ey hemser û hemnişîn û hemraz
Herçendî bî sohtinê wekî min
Emma ne bî gotinê wekî min
Ger şibhetê min te jî bî gota
Dê min bî xwe dîl qewî ne sohta
Derdê min û te jî yek bî ferqe
Ew ferqe jî xerbê ta bî şerqe
Meşriq tuwî, agirê te zahir
Mexrîb ez, û batînê min agir
Daîm dî sojit me rîşteyê can
Te na sojîtin bî xeyrê ezman (1)
Pêhtî me li ser, dî dîl perenge
Canê me dîgel perengê cenge
Şewqek te li ser serî dîyare
Sewdayekî serserî dî bare
Ew şewq-î jibo tera zîmane
Ev pêhtî jibo mera zîyane

(1) Jî bil hinek zemanan. Yanî hinek wextan bî tanê dî şewite.

Pêhta jî dilê me dayî ser ser
Hukmê dî ketin lî bayê Serşer (1)
Her çendî bî şev dî minî bidar
Sibhan dî nivî heta vî êvar (2)
Êvar û seher bî roj, eger şev
Ez her dî sojîm wisa lî ser hev»

(1) Bayê Serşer: Bagêr, bapûk, bayê pîr guzîm.

(2) Dî nivî: Dî kevî nava nivînan, hêsa dî bî, ra dî zêyî.

XXXI

ZÎN BI FIRFIROKÊRA DI PEYÎVE

Geh gah-1 jî dest dilê birîndar
Naçar-1 dî bû jî canê bêzer
 Perwa ne dî kîr bî agirê xem (1)
 Perwane dî kîr jîbo xwe hemdem
Kî: «Ey tairê aşîyanê firqet!
Wey bîlbîlê bosîtanê hîrqet!
 Ey hîccetê aşîqêd-1 saib!
 Wey mîbtîlê mîddeayê kazîb! (2)
Merdane dî bexşî canê erzan
Heyfa! Ku bî mîr geranî lerzan (3)
 Na westî demek lî ber hewayê
 Napuxte teleb dî kî fenayê
Ew lez jî tera gelek qusûre
Ew lerze jîbo tera fitûre
 Bê sebrî û bê sîkûn û bê tab
 Lewra xwe dî kî bî zûyî pîrtab

(1) Agirê: «Ateşê» bû, me lî şûnê «Agirê» nivîsî.

(2) Ê ku doza evînê ya derewîn betal dî ke.

(3) Bî mîrînê tu gerîyayî bî lerz, tu dî lerizî.

Napuxteyî eybekî temame
 Metbûx-ı dî bêjinê ku xame
 Puxte dî sojin, meger çu caran
 Fanî qe dî bin bî nûr û naran?
 Baqî dî gerin wekî semender
 Wan cîsmê dî bîte canê enwer»
 Wê cîsmemînewwera wekî rûh
 Beyza qemera mîqabelet yûn (1).
 Yek zerre jî asîman û erdan
 Ne'dma ku neket digel xeberdan
 J'ev ademîyêd-ı sahib exraz
 Mehza dî kîr ihtîraz û î'raz
 Fıkra xwe dî kîr jî îns û canan (2)
 Sırra xwa dî gote bê zımanan (3)
 Ser ta bî qedem xerîqê xembû
 Neqşê dîl û can xıyalê Mem'bû

(1) Yanî a ku wek hîva hemberê rojê sıpî bû.

(2) Fıkra xwe dî kîr: Dî tîrsî, fıkra dî kîr.

(3) Zımanan: «Zebanan» bû, me li şûnê «Zımanan» nivîsî.

XXXII

PERİŞANİYA MEMÊ

Mem jî ji xıyalê rûwê dıdar
Yanî ku ji arezûwê dıdar
 Bû dînekî dılpezîr û sewda
 Mecnûnekî bê nezîrê şeyda
Xalıb gerîya lı aqlê dehşet
Mûnıs gerîya lı qelbê wehşet
 Ne qabilê hemlê dax û derdan
 Ne nailê seyrê baxê werdan
Hasıl ku ne bû wîsalê Zînê
Rahet çûnebû ji ber birînê
 Lewra ku du teşneleb dı bê gav
 Bê tab-ı bı bın jibo firek av,
Nageh bı rıjît ji asîmanî
Serçeşmeyê abê zendeganî,
 Yek teşne miradê dıl helînit,
 Yek soxîte her wîsa bı mînit,
Yek kesb-ı bı ket heyatê sermed,
Ê dî dı çûte mematê mîmted
 Tacdîn-ı ku ew wîsal-ı dest da
 Ew reng lı Memê melal-ı dest da

Esla jî xeman ne bûye hêsa
 Mehza bî kesan nebû mîwasa
 Qet'a wî ne bû lî cih qerarek
 Esla wî ne bû bî kes mîdarek
 Ew weqtê wekû dî çûye pêş Mîr
 Te d'go ku du saxe pê dî zîncîr (1)
 Her lehze jî derd û ah û wahê
 Agîr dî gîhande barîgahê
 Gava ku dî çûye pêşê Tacdîn
 Ew jar-î digel dîlê bî nalîn,
 Ne'dîşî bî ketin mîdar û sîhbet
 Ne'dbû bî kîrît qerar û ulfet

(1) Saxe: Em: rastê mana vê kelîmê ne hatin. Lî gorî texmîna me ev kelîmê û a dû wê lî ser hevdu «Saqepê» ne, yanî çaqên lîngêd wî. Eger whabe, kalîma «Saq» bî şaşbûn «Sax» hatiye nîvîsîn.

XXXIII

MEM BI DICLE'RA DI PEYÎVE

Naçar-ı jî heyşetê dî çû dûr
Hemderd-ı dî bû dıgel şetê kûr
 Kî: «Ey şibhetê eşkê min rewane!
 Bê sebr û sıkûnî, aşîqane
Bê sebr û qerar û bê sıkûnî
Yan şibhetê min tu jî cinûnî?
 Qet nîne jibo tera qerarek
 Xalib dî dilê teda neyarek (1)
Her lehze te jî çî têtê bîrê?
Sergeçte dî bî lî rex Cızîr'ê
 Ev şehreye ger jibo te mehbûb
 Hasıl gerîyaye bo te metlûb
Daîm dî dilê tedane menzîl
Destê te lî gerdanê hemaîl
 Hêja jî Xwedê tu fîkrê na kî
 Her rojî hezarê şîkrê na kî

(1) Mana ferda diduwan lî gorî babet nîne. Bî texmîna me dê rastê wê wehabe: «Xalib dî dilê tedaye yarek».

Ev çende dı kî hewar û gazî
 Êdî çı miradekî dı xwazî?
 Bêhûde çıra dı kî tu feryed?
 Aware dı çı diyarê Bexdad?
 Ger ez bî girîm we ger bî nalım
 Wêr ez bî mırım we ger bî kalım,
 Herçî weku ez bî kım rewaye
 Maqûlî jibo mera fenaye
 Carek lı dılê mı jî guzer ke
 Serçeşmeyê çeşmê mın nezer ke
 Derdê dılê mın ku bê dewaye?
 Çeşmê terê mın çıma ceraye?
 Dîwaneme, mın perî bî der da
 Ez Dicle'me, zenberê me ber da (1)
 Westanî û Nêrgızî û Seqlan
 Derwaze û Omerî û Meydan (2)
 Van seyrêgehan tu lê dı kî geşt
 Ez meme, jibo mıra der û deşt»

(1) Zenber: Em rastê mana kelimê ne hatın. Qey zembereke.

(2) Ev gıstık navên deranın ku Dicle dı wanda derbaz dı be.

XXXIV

MEM BI BAYÊRA DI PEYÎVE

Geh behsê dî kır dîgel Seba'yê

Şerha xemê dîl dî gote bayê

Kî: «Ey cîsmî letîfê şîbhetê rûh!

Dergahê beden lî ber te meftûh

Ez hêvî dî kîm ku bê teweqqîf

Rencîdegedem bî bê tekellîf

Carek here suddetus - seadet (1)

Gavek here sîdretun - nîhayet (2)

Ewwel tu bî pose asîtanê

Paşê here pêşê dîlsitanê

Emma bî tewazî'û bî tazîm

Sed mertebe îhtîram û tekrîm

Aheste jîbo bî ke duayê

Wabesteyê wê bî ke senayê

Şayeste bî ke tu îhtîramê

Destbeste vewest, bî ke selamê

(1) Suddetus - seade: Navdera bextîyariyê; yanî koşka Zîn'ê

(2) Zîdretun - nîhayet: Cîyê ku Pêxember têda bî Xwedê'ra
peyîviye; mexsed jê oda Zînê'ye.

Paşê hereket ke pêşve çapık
 Sîqlet ne girî lî teb'ê nazık
 Ev name ku xwînê dîl mîdade
 Ev sefhe ku merdîmek sewade,
 Perdê me livîn jî ber cemalê
 Tenha bî de destî erzîhalê
 Zînhare! dî ba ne kî nîqabê
 Gava ku dî xwînitî kitabê
 Bêjê jî meda ku: «Padîşahî!»
 Benden ana soyle: «Qîblegahî! (1)
 Lew metle'ê nûrê Zülcelal'î
 Lew menbeê kewsera zelâlî
 Lew menzer û mezhera îlahî
 Em bûne geda, tu padîşahî
 Da bo me bî heqqê mittesîf bî
 Der heqqê me edl û mintesîf bî
 Der dîde jî dîdeyê tewella
 Geh gah-î bî kî lî dîl tecella
 Ev de'bê qedîme padîşahan
 Wan ame nezer lî pîrgunahan
 Wellah gunehê xwe ez nî zanîm
 Emma me dîlek hebû, dî zanîm
 Ew dîl, perîyan jî mîn revaye
 Ev pêleke ew jî mîn cudaye
 Weqtê ku dîgel mîn ew tebabû
 Sahîb hewes û xwedan hewabû
 Belkî kırîbî xeta û îşyan
 Însan xulqîn bî neqs û nîşyan
 Sed carî ku zêde pîrgunahe
 Lê sayeyê zulfê te penahe

(1) Benden ana soyle: Jî devê mîn jêra bêje. Ev bî zarê Tır-kiye.

Ger qehr-î bî kî lî wî cezaye
Wer efw-î bî kî eceb etaye»
Ev rene bî bêje, ey Seba tîz!
Wangah-î zemîn bî pos û berxîz (1)
Ey badê Seba! Bî heqqê Mabûd
Gave weku têy jî pêşê meqsûd,
Zînhare! Hinek jî xakê dergah
Bîne jî mîra digel xwe hemrah
Toza ku jî rengê tûtîyaye
Bîna bî xwera ku kîmîyaye»

(1) Wangah: Û an gah. Yanî wê demê, wê gavê.

XXXV

MEM GAZIN JI DILÊ XWE DI KE

Geh ceng-1 dî kîr dîgel dilê jar
Kî: «Ey xainê şermesarê xeddar!
Kan qewl û qerar û ehd û peywend,
Peyman û qesem, yemîn û sewgend?
Te d'go ku: Dîgel te sadîqim ez,
Te d'go: Bî tera mîwafîqim ez
Te d'go ku: Dîgel te yekdîlîm ez
Te d'go ku: Xweden tehemmîlîm ez
Heyfa! Ku zîyade bê wefayî
Weyla! Ku ne qabilê cefayî
Qelbê dexelî, bî dîl neyarî!
Pîr çîl û çep û xîrab û xwarî
Ey tûtiyê perwereş gêrînî!
Wey tîflê tîfeylê nezenînî!
Yarê xweşîyan bûwî meger tu
Qelbê reşîyan bûwî meger tu (1)

(1) Qelbê reşîyan: Sist û zexelê rojên reş.

Dilhayê! kusan derûnê تنها (1)

Însafe tenê bî hêlî تنها?

Ev bîlbîlê can dî mehbese ten

Maye bî tenê mîsalê bêjen

Însafe bî kî tu canê bedrûd? (2)

Derwazeyê ten bî gêrî mesdûd?

Sırra dî teda, jî feyzê cane

Nûra dî zemîn jî asîmane

Ey dîl! Me çê bê çiraxê canî

Zulmate, tu korî rê nî zanî

Meqsûde eger jîbo te canan

Canan te dî canêdane pînhan

Lewra tu nîmûnedarê zatî

Ayîneyê sûretê sîfatî

Zînhare! Me çê lî dû tewella

Da can ne ketin jî te teberrâ

Çûna te dî bîte xaricîyyet

Terka te dî bîte rafizîyyet

Xaric me be da bî bî tu daxil

Terkê me ke da bî bî tu wasil

Refzê meke tu, bî dîl be sinnî

Ma Baluke? Weynek, ente mînnî! (3)

Sabit be ku da ne naxelef bî

Da waqîfê sîrrê «Men eref» bî (2)

Her çendî tu çûyî ber derê dost

Lê dost-î lî nîk mîne, lî wê post

(1) Dilha: Ey dîl. Derûnê تنها: Hundirê cesedê hanê, vî laşî.

(2) Tu xatîr jî gan bî xwazî, wî terk bî kî.

(3) Ev ferd gîş bî zarê Erebi'ye, mana wê eve: Çî bû bî te? Mala te ne keve, tu jî minî, jî laşê minî!

(4) «Men eref»: Kî ku nas bî ke; ev parçekiye jî hedîseki, temamê wê eve: «Kî nefsa xwe nas bî ke, xwedayê xwe jî nas dî ke».

Qedda te hebandî bo te dare
 Zılfa tu çivandî ew qınare
 Cezba tu revayî can lî bale
 Sırra tu fîdayî ew xwemale
 Bawer te neyê lî zılf û xalan
 Malê me de Hindîyan bî talan
 Pabende me be bî tarê gêsû
 Sergeşte me be bî qewsê ebrû
 Her çendî Xelîl'î, ey belakeş! (1)
 Gulzar-ı te dî bîte ateş
 Teşbîhê te sed hezar-ı bîlbîl
 Sed carî bî kîm fîxan û xulxul
 Perwane sîfet lî pêşê werdan
 Her dem dî sojîm bî dax û derdan
 Ey dil! Te xwe daye ber hewayê
 Qesda te ew bî kî sefayê
 Emma jî tebîbê îşqê sadîq
 Mîn zaniye bo tera mîwafîq:
 Perhîze jî qîsmê mîştehatan
 Teqwaye jî van mîlezzezatan
 Herçî ku mîxalîfê hewaye
 Eynê wî jîbo tera şîfaye
 Mîn pîrsîye bê guman jî Luqman
 Xasîyyetê şerbetan û luqman
 Herçî ku şêrîne eynê daye
 Herçî weku tale ew dewaye»
 Ew çende ewî dîgel dilî got,
 Naçar-ı dilê dilî bî wî sot
 Dûkel jî herareta sıweyda
 Ra bû tîjî bû mehellê sewda
 Ra bû ve jî dil duxan û yehmûm
 Reş kır lî serî dîmaxê xeyşûm

(1) Xelîl: Bîrahîm Pêxember.

Neynîkê xıyalê bû mîkedder
 Ayîne-yê aqlê bû mîxebber
 Ewrek te dî go jî erdê ra bû
 Evraz-ı, lî asîman cema bû
 Wî ewrî jî nîvîka hınavan
 Xwînbarî dî kır bî herdu çavan
 Seyla cegerê wîsa lî gur hat
 Goya ku bî ser, Erez ve gur hat (1)
 Elqîsse: Jî îlleta dî dîlda
 Seylek we dî çû Memê bî mîlda
 Şettîl - Ereb û Ferat û Ceyhûn
 Hersê te dî go bî yekve ra bûn
 Her çendî jî hîstîrê Mem'ê jar
 Şîn bûn lî rexê şetê, Sîpîndar
 Sehra hemî bûye sehnê bustan
 Sahîl bûye gulşen û gulîstan
 Wî bê dîlî her lî wê mekan girt
 Wî bîlbîlî bc xwe aşîyan girt
 Ew bîlbîl eger çî pîrhewesbû
 Zîndanê beden lî wî qefesbû
 Vêkra werîyan lî wî per û bal
 Têkda weşîyan jî wî xet û xal
 Qedda wîyê şîbhetê Senewber
 Xem bû, çîvîya mîsalê Er'er
 Rûwêd-ı wî ger çî her dî terbûn
 Manendê xîzamê, lêkî zerbûn
 Arîz qewimî lî neynîkê jeng
 Rewneq çu nema lî neqşê Erjeng (2)
 Îşqê we nexweş kır ew belakeş
 Hubbê we teles kır ew mîşewweş,

(1) Ve gur hat: Bî gur hat.

(2) Erjeng: Lewha Ressamê Çînî ê bî nav û deng Manî'ye; mexed jê rûwê Memê'ye.

Dêma wî ne ma çu ab û renek
Nîtqa wî ne ma cewab û dengek
J'ewwelve lî rex şetê nexweş ket
Çû rojî temamî şîbhê leş ket
Aqî û xîred û şîûrê însan
Hîss-û hareket, quwayê heywan,
Qet'a qe ne ma jî van çu asar
Yek cuz'î lî nîk Mem'ê birîndar

XXXVI

MÎR DI ÇE NÊÇÎRÊ

Seyyadê şîkarê hîsnê exbar (1)
Kır bo me ku serguzeştê îzhar
 Go: «Rojekî xweş bî fêsl û eyyam
 Dewra feleka fena serencam
Ferrasê qeza bî sun'ê qudret
Xebra kırîbû mîsalê cennet
 Meşşate sîfet, cîhanê dêrîn
 Tezyîn kırîbû erûse ayîn
Her yek jî newal û koh û deştan
Reh şîbhetê goşeyê'î bîhuştan
 Her rewze, rîyazê Xuldê ekber
 Her çeşme jî eynê abê kewser
Her koh-î jî rengê Tûre Mûsa
J'enwarê tecellîyê dî îsa
 Her nehr-î jî rengê ejdehabûn
 Her sebze bî mu'cîzan Esa'bûn
Her dar-î jî feyzê nûbuharî
Têk şu'le dî da jî nûrê Barî

(1) Nêçîrvanê nêçîra rındiya peyvan. Yanî dîrokvan.

Her gul jî mîsalê atêşê Tûr
 Yek meş'elê bê qusûrê pîrnûr
 Her mîrxê seher bî xwe kelîmek
 Her tûti-yû qumrîyek nedîmek
 Her nexlê nîdakunende her gah
 Teşbihê Şecer dî go: «Enellah» (1)
 Xergoş û xezal û gur û ahû
 Ev qaz û quling û kebk û têhû
 Ker ker dî çerîn lî koh û deştan
 Ref ref dî fırîn dî nêv bîhuştan
 Elqîsse: Bî îqtîza zemanî
 Bû fîrsetê eyş û kameranî
 Fesla bî gerîn lî geşt û seyran
 Nêçîr-î bî kîn jî wehş û teyran

*
**

Mîrê ku felek mîtiê ferman
 Go: «Sîbhe nebûyî, qewmê Bohtan,
 Ra bestî silah û gurz û şîmşîr
 Bîlcîmle dîgel me bêne nêçîr
 Hazîr ne bîtin kesek dî seydê
 Ew dê bî mîrî dî bend û qeydê»
 Xelqê ku heta bî sîbhê kazîb
 Hazîr kîrîbûn bîsat û ratîb,
 Fecrê ku numaye wan elamet
 Ra bû dî wî şehîde qîyamet
 Mîran ve kîrîn uqab û bazî
 Şêran dî bîrîn, pîlîng û tazî
 Derrende û adem û behaîm
 Ferdek qe nema dî şehîr-î qaîm

(1) Teşbihê Şecer: Wek dara çîyayê Tûr ku dengê Xwedê jê hat, got «Enellah» yanî ez Xwedê'me.

Dam û ded û ademî-yû heywan
 Tîfl û sebî, aşivan û rezvan
 Elqîsse: Qebîleya rîcalan
 Fîlcımle kesek ne ma dî malan
 Bû heşregehek lî seydegahan
 Şefqet ne kîrîn lî bê gunahan
 Ew çende jî wehşîyan dî kuştin
 Goya ku wihûş-ı qet ne hîştin
 Derrende, dewende û perende
 Hın kuştî dî girtî, hın fekende
 Çapıkherekat û nûciwanan
 Wan faris û kurd û pehlewanan
 Derrende dî randibûn bî şîran
 Perrende bî randibûn bî tîran
 Mehbûbê mîsalê şehlewendan
 Merkeb'ereban, xwedan kemendan
 Çoganê dî dest digel gupalan
 Avêtine gerdenêd xezalan
 Ew şêresîwar bî perr-û çengê
 Xwînî kîrîbûn, belek pîlingê
 Ew çende xezal ewan kîrîn seyd
 Ew çende pîling ewan kîrîn qeyd,
 Êdî ne dî şîr digel xwe bînin
 Belkî ne dî şîr jî cî helînin
 Kuştî jî xwera bîrîn feqîran
 Girtî bî xwera bîrîn emîran

XXXVII

BEXÇÊ MÎR

Baxek wî hebû Emîrê Zeydîn
Baxê Îremê dî çû. bî mîzgîn
Her dewhe ji wî, û her tîyûrek
Yek qesrê ji cennetê, û hûrek
Bo şuştî dest û pê û çavan
Kewser kîrîbû sebîl? 1 Rîdwan
Hemser bî meqamê Sîdre serwek
Manendê firîşte her Tezerwek
Tegbîhê Memê, dilê Senewber
Sed pare ji îşqê, qeddê Er'er
Narenc û Tîrînc-1 şîbhê Zînê
Zer bûyî ji îlleta evînê
Sêv û rîteb û înar û bustan
Lêv û zîqen û înar û pestan (1)
Şîmşad û çînar-1 hemqedembûn
Xweş sayewer û elîhîmembûn

(1) Inar: Em rastê mana vê kelimê ne hatin. Lê wisa tê texmînkirin ku ew jî navê lebatekiye, belkî dêm be.

Zêrîngedehêd-ı mestê lebrîz (1)
 Reyhan û binevşe cıme newxîz
 Şîrazeyê selsebîl û enhar
 Mecmûeyê xıdrewat û ezhar
 Sehna rezê mîcmelen kîtabek
 Her qıt'e û fesle fesl û babek (2)
 Goya bî edeb edîbê tencîm
 Ser sefheyê baxê şîbhê teqwîm,
 Cedwel kırîbû bî hellê sîmah
 Şîngerfe sîfet gulêd-ı sîrab
 Etraf-ı jî sînbîl û reyahîn
 Elwan jî xîtûtê sebz û mîşkîn
 Her yek dî kırın beyanê ehkam
 Bextê sîyeh û sefîde î'lam

(1) Mest: Wîsa tê texmîn kırın ku ev kelîme «Mîşt»e, bî şaş-bûn «Mest» hatiye nivîsîn. Mîşt bî mana tîjîye. Lebrîz: Lêvrêj. Yanî mey bî ser lêvên wêda dî rijîya.

(2) Fesl û babek: Pîşk û birekî pirtûkê.

XXXVIII

ZÎN DI ÇE BEXÇE

Ew ahûwê seydegahê wehşet (1)
Ew banûwê barîgahû ulfet
Serkulhê xezalê deştê derdan
Sergeştê nihalê baxê werdan (2)
Pabesteyê qeydê îşqê xwînxwar
Seyda ku Memê kirî birîndar
Dî şehr û mehelle cimle xalî
Xalî bûwî kuçe û hewaf
Tenha û tehîne bax û bustan
Bê îns û perîne sehn û eywan
Zanî ku zemanê bê emane
Go: «Ra be dilo! Eceb zemanê
Fîrset xweşe da bî çîne seyran
Ca seyr-î bî kîn lî wehş û teyran
Kanê qe heyîn jî wan me hemderd?
Lewra ku ev ademîne bê derd

(1) Xezala nêçîrgeha kûvîtiyê, a ku di cîyê nêçîrêda bî tenê û kûvî mabû. Yanî Zîn.

(2) Serpera şaxa baxê gulan.

Teyrek me bîhîstîye dî baxan
 Bextê wî reşe ji rengê zaxan
 Lê jar û zeîf û bê mecale
 Aşîfteyê rûwê werdê ale
 Rojan dî ketin fixan û zarî
 Xwîna xwe dî xut şevêd-î tarî
 Daîm dî ketin fîxan û xulxul
 Hevdengê mine bî navê bilbul
 Hemderdekî qence, ehlê hale
 Dermanekî derdê min lî bale
 Ey dîl! Were da bî çîn nîhanî
 Hêja ku heye me zendeganî
 Belkî bî nesîhet û bî pendê
 Aza me bî ket ji qeyd û bendê»
 Ev renga he got, û bê tewqqîf
 Zîn hate ve baxê bê tekellîf
 Agah-î ne bûn jî wê çu deyyar
 Ne daye, ne xadim û perestar
 Meqsûdê ewê ne îşretekû
 Wê mehz-î mîradê îzletekû
 Lew hate ve baxê ew perîzad
 Da têr-î bî ket ji dest xeman dad
 Her lale lî sîne bûne daxek
 Her xunçe bî sohtinê çiraxek
 Her dar-î lî cîsmê bûne barek
 Gulnar-lî qelbê bûne narek
 Tenha ku xwe dî berek dî desbû (1)
 Ew seng-î, zebaneyê ceresbû (2)
 Dem dem we dî da lî deffê mermer (3)
 Bê şibhe dîlê beran dî bû ker

(1) Kevîrekî dî destên wêdabû.

(2) Ew kevîr zîmanê zengîlbû.

(3) Mexsed jê singa wêye.

Gava ku nezer dî kîr lî avan
 Xwînave dî çû jî herdu çavan
 Sehna rezê bû hewayê bîlbîl
 Şadab-î dî kîr bî abê gul, gul
 Qedda ku bî rasîtî Senewber
 Dêma bî zîyayê mîhrê enwer,
 Ew renga dî da lî ax û erdê
 Ew çende dî sûtî toz û gerdê, (1)
 Axê dî kîr «Ax», û ber dî nalîn
 Daran dî kîr «Ah», pelîk dî kalîn
 Her dem ku dî kîr jî derd-î «Yahû»
 Mîr'atê felek dî kîr sîyehrû
 Pejmurde kîrîn bî rengê, sorgul
 Efserde kîrîn bî dengê, bîlbîl
 Bîlbîl ne dî şî bî bîte hevdeng
 Sorgul ne dî bû bî bîte hevrenge
 Hîndî ku dî baxêda nezer kîr
 Behsa xwe digel gulêd-î zer kîr
 Kî: «Ey şîbhetê aşîqan dîgergûn!
 Wey şîbhetê mîn zerîrû, zergûn!
 Berkêd-î we sed ne, ew hezarîn
 Hun bo çî zerîn, zeîf û jarîn?
 Yan şîbhetê mîn dî bê Mem'in hun,
 Lewra wekî mîn dî pîrxemûn hun?
 Bîlbîl bî gulêd-î sore meşxûl
 Hun mayîne şîbhê mîn dî ma'zûl
 Lewra dî elîl û derdenakîn
 Lewra dî hezîn û sîneçakîn
 Hun qenc-î jîbo mîra delîlîn
 Hun bo me dî halêda edîlîn

(1) Dî sûtî: Dî dewîsand, wek sûtîna kulaf. Gerdê: Latên bexçe.

Xuşkek me hebû ji rengê sorgul
Hel girtîye wê jibo xwe bilbıl
Ha! hîştîye bo me endelîbek
Mehrûm û sefil û bê nesîbek
Ez jî ji zelîl û bê nesîbî
Zer bûme ji hîcrê endelîbî
Dêma mine sere erxewanî
Zer bûye wekî we za'feranî
Carek bî dîya min ew bî dîlxwah
Êdî ne dî kir min «Ah-1» billah

XXXIX

MEM JÎ DI ÇE BEXÇE

Herçî bî bitîn jî xeyr, eger şer
Bê daîye na bitîn miyesser
Ger wesle we ger qumaşê dîdar
Bê daîye na bitîn çu bazar
Ew daîye cımlê remz û halın
Belkî jî cenabê Zülcelal'ın
Qelbê te dî bêjtın ku: «Ra be
Ev saete eynê fethê babe»
Ew kohê weqar û behrê mewzûn
Îşqê kırîbû xefîf û mecnûn
Yanî ku Mem'ê merîzê bedhal
Zafê kırîbû ziyade pamal
Roja ku jî şehre xel bî der ket
Sewdayê xıyalê Zîn bî ser ket
Bîmarê bî derdê îşqê sekren
Bê nezcê merez gîhîşte buhran
Bû qelqeleçek dî qelbê xemgîn
Esla ne dî bû dî xanî teskîn
Naçar-ı jî xanî ew bî der ket
Ew daîye Xızr-ı bû, bî ber ket

Ew Xızr-ı çî bû Teşewwîqa dıl
 Ew şewq-ı çî bû? Teşşîqa dıl
 Qelbê wî dıgel wî bûye baxî (1)
 Kêşan û keşan gîhande baxî (2)
 Zîn'a ku şevêd-ı reş, dî tarî
 Her dem bî fixan û ah û zarî
 Daîm jî Xwedê dî kîr temenna
 Mem ra bî û bête nîk bî تنها,
 Nageh fikirî ku Mem jî der hat
 Bîmarê Mesîh-ı dî bî ser hat
 Zînê jî evîn û şadîmanî
 Fîlhal-ı ne ma çu zendeganî
 Bê heş kete ser çîmen wekî gul
 Sed pare ceger jî îşqê bîlbîl
 Mem hat û teferrîca gulan kîr
 Seyrek hî rîhan û sînbîlan kîr
 Go: «Ey gul! Eger tu nazenînî,
 Kengê tu jî rengê rûwê Zîn'î?
 Ey sînbîl! Eger heyî tu xweş bû,
 Rîhan jî te bûyîne sîyehrû,
 Hun ne jî mîsalê zîlfê yarî
 Hun herdu fîzûl û herzekarî
 Ey bîlbîl! Eger tu ehlê halî
 Perwanyê şem'ê werdê alî,
 Zîn'a me jî sorgula te geştîr
 Bextê me jî tahlê te reştîr
 Bîlbîl ezîm, ey nîkûserencam!
 Bêyhûde çîra dî kî xwe bednam?
 Gul yek ne tenê, ku sed hezaran
 Gulşen dî dîtin dî nûbuharan

(1) Bûye baxî: Bû aşî, lî ber wî ra bû.

(2) Gîhande baxî: Gîhande bexçe.

Maşûqê ku mîslê wan gelek bîn
 Her çendî ku horî-yû melek bîn,
 Ew na bine mûcibê çu derdan
 Lewra ku heyîn lî cümle erdan
 Yek bît, û ne bît mîsal û hemta
 Mestûre ji rengê Zîn û Enqa,
 Aşiq bî çî dê bî ket mîdare?
 Bê sebr û mîrîn, ewî çî çare?»
 Ev renga dî go, ji halê xafîl
 Nageh fîkrî ku pêş mîqabîl
 Zîn'a ku dused perî perestar
 Hora ku Memo jîbo girîftar,
 Wê sebze sîfet lî ser zemînê
 Bê heş kirî, darûwê evînê.
 Zîn'a ku şebîhê durrê meknûn
 Fîlhal-î ku dî Mem'ê cegerxûn, (1)
 Bê heş kete ber pîyan û bê gav.
 Serwê ku gîhîşte ber pîyan av, (2)
 Xunçe ji xewa seher ve bîşkift (3)
 Wê bûyî bî bîlbîlê xwera cift
 Go: «Ev xewe, ya ne xud xiyale?
 Ev xewne sehîhe, ya betale?»
 Hasîl: Ku ji paşê sed xiyalan
 Xasîyyetê boyê zulf û xalan,
 Zînê ku gîhande ber meşamê,
 Seydê mîrî zinde kir bî damê.
 Ra bû ku lî pêşdestê Zînê
 Fîkrî ku du dest dî destê Zînê
 Man herdu gelek lî pêşê yek lal
 Ne nîtg û xeber, ne qîl û ne gal

(1) Ku dî: Ku Memê wê dît.

(2) Serwê: Dara serwê, mexsed jê Zîn'e. Av: Yanî Mem.

(3) Xunçe: Yanî Zîn.

Ewwel dî kîrîm bî dest îşaret
 Paşê ku ve bû lî wan îbarete,
 Ew çende kalem-î pêkve gotin
 Fîw çende jî pêşê yekve sotin (1)
 Ew çende şekir bî yekve rêtin
 Ew çende lebêd-î yek dî mêtin
 Ew çende qedeh bî yekve xwarin
 Ew çende qeza jî nû bijarin
 Çeşm û leb û sîne, gerden û doş
 Ruxsar û zîqen ber û benagoş
 Yêk yêkê bî dîl jî yek dî xwestin
 Hîn bûse dî dan û hîn dî gestin
 Ew teşnelebêd jî weslê yek têhn
 Gerden dî kîrîm lî yêk û dû, bêhn
 Zîn'a ku bî rux mîsalê şem'an
 Pîrşewq û zîya û nûr û lem'an
 Perwane sîfet Memê bî zahîr
 Cîsmê xwe û can dî dane agir
 Geh geş dî bû agirê evînê
 Perwa ne dî ma jiboyê Zînê
 Herdu dî wî halîda eyanî
 Bê perdesera û bê nuwanî
 Wan dîtî dî baxêda serayek
 Ayîneyê Cem, cîhanrûmayek
 Ra bûn û meşîne şehneşînan
 Rûniştin, û herdu nazenînan,
 Hîcran dî kîrîm jî ser hîkayet
 Wîcdan dî kîrîm jî nû rîvayet.
 Dem ebr-î sîfet, hezîn û gîryan
 Geh xunçe mesel, letîf û xendan
 Her dem dî kîrîm qeza û sunnet
 Ferza weku bûsene, çî mînnet?

(1) Jî ber hevdû şewitîn, dilê wan bî hevdû şewitî.

Her çendî ku ref'î bûn tekellûf
 Lêkî evîşandibûn teserrîf
 Ew gerçî hebûn jî hev bî hêvî
 Emma ne dî gûn qewî nîşîvî
 Hubba dî dîlan jî heddê derbû
 Serheddê zerafetan kemerbû
 Îşqa ku lî ser hedê kemale,
 Ava ku jî menbeê zelale,
 Elbette xwe dê bî ket hîraset
 Na ket çu qebûlîya necaset.
 Cwanî û buhar û bax û mehbûb
 Aya dî dîne çî maye metlûb?
 Xasma hebitin evînê xalib
 Lebtîşneyê îşqê herdu canib
 Êdî çî bî bêjim? Ez nî zanîm,
 Bîlmez kî ne soyleye zebanîm (1)

(1) Zîmanê min nîzane ku çî bêje. Ev bî Tirkîye.

XL

MÎR JI NÊÇÎRÊ DI ZIVIRE Û BI SER MEM Û ZÎNÊ'DA TÊ

Saqî! Me bî gır ku ez bî destim (1)
Mexmûrım û meynexwarê mestim
Gava ku ve xwar Memê û Zînê
Axiftî li min cihê birînê
Em aşiq eger çî meyperestin
Emma jî meya «Elest»ê mestin (2)
Ew mey ne wekî meya te ale
Ew mey jî cemalê Zılcelal'e
Ew hubbê hebîbê pakezate
Qınwanê hedîqeyê sîfate
Saqî! Bî de min jibo Xwedê'ra
Camek jî meya te doh di gêra
Her cır'eyekî e jê bî kım tam
Yek neş'e bese heta serencam

(1) Bî destim: Dî kevım, li ketinême.
weme?».

(2) «Elest»: Roja ku Xwedê jî ganana go «Ma ez ne xwedayê

Ew keyfekê mehze, bê kem û keyf (1)
 Esrareke bê xıyal û bê teyf
 Da def'î bî kım xumarê dûşîn
 Heşyar-ı bî bım jî xwabê nûşîn
 Da şıbhê Memê ne bit, ku xafıl
 Bêt mîrê ecel bî ser me acıl,
 Roja mîne umr-ı çûye êvar (2)
 Hêja ne bım ez jî xwe xebêrdar
 Zîn'a hewesa dilê hewayê
 Mın dabite nave xwe-ebayê (3)



Mîr hatî lî ser wî hinde esker
 Zırna û nefîr û kûs û mehtar
 Dadayî lî tıblexan û sazan
 Çawûş û seda û gaze-gazan
 Pabendê bî îşqê herdu cîran (4)
 Dermande, jî pêşê yekve heyran,
 Qet seh ne kîrın ku ev çî renga
 Qet goh ne kîrın ku ev çî denge
 Mîr go ku: «Ve kın evan xezalan
 Pabende me kın ewan şepalan
 Têk ber dîne baxê wan wekî teyr
 Da em bî kîrın herô lî wan seyr»
 Xelqê ku xezal û gur û xergûş
 Xweş girtî lî ser mıl û der axûş
 Anîn hemî Mîr tîjîyyê rez kîr
 Axıl ku şıvan tîjîyyê pez kîr,

(1) Bê kem û keyf: Bê çiqasî û çawayî.

(2) Çûye: Lî gorî texmîna me rastê wî «Çûbe» ye.

(3) Dabite: Danîbe. Nave xwe - ebayê: Navbera xwe û ebayê, yan jî «nave xwe ebayê» yanî nava ebaye xwe.

(4) Herdu cîran: Mem û Zîn.

Mîr gote ekabîr û xewasan:
 «Tenbîh-ı bî kın nedîm û nasan
 Da çîn û demek dî baxê rûnîn
 Lewra ku jî rehtîyan zebûnîn»
 Ew hatîne der serayê alî
 Dîtin der û ban hemî dî xalî
 Emma ku derîçe têk kuşadın
 Reng qur'eyê texteyê mîradın (1)
 Hazır kete qelbê wî xıyalek
 Zanî ku ne xaliye jî halek
 Mîrê bî weqar û aql û ferheng
 Tacdîn û Bekîr xwe dane bîn çeng
 Înane sera ku Zîn û Mem tê
 Goh dane seda, ku zêr û bem tê
 Mîr hatî bî serve, dî Mem'ê jar
 Pal dayîye balgeyêd-ı zertar
 Kêşaye serê xwe wî ebayek
 Êvare ne şem'û ne çirayek
 Mîr go: «Kîye ev dî vî zemanî,
 Bê ruxsetê mîn dî vî mekanî?»
 Zînê ku bihîstî, dengî nasî
 Fîlhal-ı xwe daye bîn lîbasî
 Mem qet jî cîhê xwe ra ne bû got:
 «Seyda te lî mîn dîl û ceger sot
 Mîrîm! Te dî zanî ez nexweşbûm
 Hetta ve dehê qewî neheşbûm
 Îro me bihîst ku xel dîgel Mîr
 Têkda bî tehayî çûne nêçîr
 Sebra me ne ma dî nav nivînan
 Ra bûm, û dîgel evan birînan,
 Naçar-ı bî der ketim jî xanî
 Nageh me xwe dî lî vî mekanî»

(1) Wekî qur'ên textê mîradanîn; qey ev tewîrekî falêbûye.

Mîr go: «Nexweşan nehûn jibo qeyd
 Barî te dî baxêda çî kîr seyd?»
 Go: «Ez ku bî bêrn bî ke tu bawer
 Dawer bî mera ku bûye yawer,
 Mîn dî dî vî baxîda xezalek
 Emma ne xezal-î bû şepalek
 Ahûwê sipî û çav dî reşbûn
 Bîskên dî sîyah û bêhnê xweşbûn
 Her lehze jî nafeyêd tetarî
 Sed bar-î jî tureyyan dî barî
 Sehrayê Xeten tîjî bîtin mîsk
 Yek tayê jî zîlfê wê û yek bîsk
 Her çendî sipî û çavbelekû
 Emma bî qîyasê mîn melekû
 Lewra ku tu hatî ew nîhan bû
 Hindî tu ne hatê ew eyanbû»
 Tacdîn jî tekellîma wî zanî:
 Zîn hatîye ba Memê nîhanî
 Go: «Goh me dîne Memê, ku dîne
 Malxolî'ye, wî aqîl çunîne»
 Î'raz-î kîrî jî wî kelamî
 E'yan hemî vêk ketin temamî
 Saqî û şerab û şem'î xwestin
 Dîwanekî hakîmane bestin

XLI

TACDÎN JIBO RIZGARKIRINA MEMÊ Û ZÎNÊ MALA XWE DI ŞEWITÎNE

Tacdîn fikirî ku bezme bûşe
Pir 'zewq û sefa û eys û nûşe
Mem zêde bî xusse û melale
Çû balve û go: «Bira! Çi hale?»
Emma bî îşaret û mîemma
Pîrsî, û Memê bî remz û îma,
Destê xwe çû hûçîka ebayê
Kêşa, û eczayîbek numayê
Dîtin du kezî jî mîskê tatar (1)
Manendê du ser bî muhrî şehmar (2),
Gerdayî dî paşîla Memê'da (3)
Mem mayî dî heybet û xemêda
Zanî ku qewî xirabe ehwal
Ra bû bî lez, û bezî û çû mal

(1) Mîskê: «Mîşkê» bû, me lî şûnê «Mîskê» nivîsî.

(2) Wek serê du şehmarên bî morî.

(3) Gerdayî: «Pêçayî, lefiyayî, marê ku xwe gîlor dî ke.

Nageh bî xezeb ku çû ji derda
 Zanî Sîfîyê, digel xeber da
 Gotî: «Te çî hale, ey tehemtîn!
 Tacîl-î çîye, kîye te dijmin?»
 Go: «Ra be Sîfî! Ku min derenge
 Îro me digel vê malê cenge
 Tîflê xwe xilas ke, dê bî çit mal
 Mal bo min, û ha jîbo te mendal
 Sermayeyê umrê zendegani
 Yanî Mem û Zîn bî dîlgiranî,
 Mayîne dî werteya belayê
 Min qesde ku ez bî kîm ruhayê
 Xel ve d'kujit agirê bî avê
 Ez dê ve kujim bî agir avê»
 Mala xwe jî rengê qewmê Zerdest
 Da agir, û gaziya xwe raheşt
 Agir ku dî girte xan û manan
 Wî girte bî gazî-yû fixanan
 Eqwam û qebaîl û eşaîr
 Bîlcîmle bezîne def'ê agir
 Agah-î ku bûn emîr û xîlman
 Xalî kîrî ew sera û dîwan
 Ew jî ku bezîne wê hewarê
 Wî mittehemî we gote yarê: (1)
 «Tacdîn-î te dî çî reng eda kîr?
 Mûsa lî me behrê xem zîwa kîr
 Ra be tu here heremserayê
 Da ez bî çim agir û nîdayê»
 Zîn ra bû û çûye xelweta xas
 Tacdîn-î ne ma ne cîl, ne palas
 Esbab û tecemmûl û defîne
 Emlâk û cewahir û xezîne

(1) Wî mittehemî: Wiyê ku dî bîn zennêda mabû. Yanî Memê.

Bîlcimle d'rêya bîrayê sotin
Lew navî bî qencî tête gotin

✱

Malê me hebîn tu ey nîkûnam!
Hubba wî dî ket mîrov-ı bednam
Zînhare! Me be lî mal-ı harîs
Lewra ku dî bin jî dest te warîs
Cem'a wî jîbo te barê zehmet
Terka wî jîbo te narê hesret
Roja bî çî pêşedestê Barî
Destê te jî genc û malê arî
Ev cennet û eş qumaşê dîdar,
Ey mîflîsê axîret xerîdar!,
Kengê jî tera dî bin mîyesser?
Dê bêne te: «Mîflîso! Here der»
Reh şîbhetê vî cîhanê fanî
Mîft na dîne parîyek jî nanî
Malê me de warîsan tu meccan,
Ger dê te bî vê hêsayîya can
Warîs jî tera kefenbuhayê
Hette ne kîrîn dî dîrî hesayê (1)
Hêja ku xweşî telef bî ke mâl
Bîlcimle bî çê bî hîsnê e'mal
Yan serf-ı bî ke mîsalê Tacdîn
Pê navê ebed jîbo xwe bî'stîn
Yan pê bî kîre tu yarekî qenc
Ew çêtîre bo tera jî sed genc

(1) «Hesa» jî kelîma «Hîsse»-ya bî zarê Erebi hatiye girtin û dî zarê Kurdî'da bûye «Hesa», bî mîana «Par»-e.

XLII

BEKIR GİLİYA MEMÊ Û ZİNÊ JÎ MÎR'RA DÎ KE

Sultanê wîlayetê mehebbet (1)
Serxeylê eyaletê meweddê (2)
 Gava ku jî mekmenê xulûsê (3)
 Bî'nmêti lî textê dîl cîlûsê (4)
Kengê dî ketin qebûlê estar?
Hetta elema xwe na ket îzhar
 Reh şibhetê padişahê encim
 Tabende jî tareme çîharim
J'ew çend tebeqatê asîmanê
J'ew çende mesafe û mekanê
 J'ew çende enasîr û sehaban
 J'ew çende mewani'û hîcaban
Naçar'î dî ket nîfûz-î her rûz
Elbette dî bîte alem efrûz

(1) Padişahê walatê evînê. Yanî evîndarî.

(2) Sersîwarê welatê evînê. Yanî evîndarî.

(3) Jî veşargeha rastîyê.

(4) Yanî lî ser textê dîl rûne û rûniştina xwe jî nîşan bî de.

Ev padîşehê ku «Îşq»e name
 Rojê bî wî nîsbetek temame (1)
 Ew jî qe ve na şîrît çu caran
 Naçar-î bî ker dî ket sîtaran

Razê dî diê Memê û Zînê
 Sazê ku dî perdeya evînê,
 Hindî ne gîhîştibû zîmanan (2)
 Ne'dbû çu zîyan jîbo xwedanan
 Mîzrabê zîmanê xelqê nasaz (3)
 Bê perde ku bû terane perdaz, (4)
 Zîn'ê ne guneh, Memê ne sûcîk
 Agah-î kîrîm bîzîrg û kûçîk (5)
 Zengîl bî deva guhanve zengûl
 Meftûle enamîlan jî merxû
 Uşşaq-î hezîn û bê newabûn
 Xel teşne Hîscyn'ê Kerbelâ'bûk (6)
 Meclîs bî newayê zêr û bem bûn
 Memlû jî hewayê Zîn Mem bûn
 Barê lî cemazeyê ne besbû
 Xemmaz-î dî mertebe cerasbû
 Yanî xeberêd-î herdu yaran
 Nemmam û hesûd û hîlekaran,

(1) Pîvekekî temame, ew bî rojê xweş tû pîvan û qiyaskîrîn.

(2) Zîmanan: «Zebanan» bû, me lî şûnê «Zîmanan» nivîsî.

(3) Zîmanê: «Zebanê» bû, me lî şûnê «Zîmanê» nivîsî.

(4) Ku bê perde, awa û qaydê sîtranê xemiland. Yanî wê gotîne lî her derê bê pîvan got.

(5) Bîzîrg û kûçîk: Bîzîn û se, yan jî mezin û biçûk; lî gorî vê manayê «Kûçîk» jî «Kuçuk» a bîzarê Tirkî hatîye girtin û jîbo rastbûna qafiyê «Kûçîk» hatîye nivîsin. Mana «Mezin û biçûk» xweştir.

(6) Wek wî tîbûn, tîyêd gerandîna gotinanbûn.

Ew çende dî meclîsan gerandin
 Ew çende bî qemsîyan gîhandin
 Hetta Bekîr'ê jî rengê Îblîs
 Sahîb xerezê xebîsê teblîse
 Ew jî jî wî halî bû xebêrdar
 Ra bû jî cîhê xwe ew xerezdar
 Tenha xw gîhande xelweta Mîr
 Elqîsse kîr ew qezîyye teqrîr
 Mîr hate tehwewîra bî xîret
 Bû xerqeyê behrî fikir û heyret
 Pîrsî jî ewê xebîsê salûs
 Go: «Ev xebera xîlafê namûs,
 Em dê ku heqîqetê eyan kîm,
 Serrîsteyê tuhmetê beyan kîm?»
 Go: «Emr-î bî ke, Memê bî xûnî
 Hun herdu dî xelwetê ku rûnî,
 —Mem aşîqê sadîqe, bî zan qenc—
 Vêra bî leyîze tu bî setrenc
 Şertê xwe jî wî bî xwaze dîlxwaz
 Dê keşf-î bî bîr heqîqeta raz
 Gava ku ewî dî kî tu mexlûb
 Bê: «Rast-î bî bê, kîye te metlûb?»
 Mem fêris û betl û sînesafe
 Xasma bî tera xwe kê xîlafe
 Hubba dî dilê xwe na ket înkâr
 Sîrra xwe dî ket jîbo te îqrar
 Sabîtqedeme dî vê evîne
 Dê bêje ku: «Aşîqîm lî Zîne»
 Paşê, tuwî sahîbê kîyaset
 Lafîq wî bî bîn çîye sîyaset»

**

Hukkam-î jî cînsê şahê marî
 Eshabê sîmûm û muhredarî

Muhran ku dı dın, bı zan ku zehre
 Mıhrê ku dı kın, bı zan ku qehre
 Aql hezerê dı kın jı maran
 Xafıl dı bine mıhıbb-û yaran
 Her çendî lı nık bı izz-û nazî
 Her çendî dıgel bı le'b û bazî,
 Cuz'î bı bıtın jı te texeyyır
 Kullî dı ketın lı te tedebbır
 Xasma ku hebın xebıs û xennas
 Bedxwah û bexıl-ı bın mînen-nas
 Tehqıqe xırabtırın nı şeytan
 Yareb! Me ke wan qerîbê sultan

XLIII

MÎR BI MEMÊ'RA BI SETRENC DI LÎZE Û PAŞÊ WÎ DAVÊJE ZINDANÊ

Salarê mewakîbê kewakîb (1)

Serdarê tewalî'û xewarîb

Sultanê serîrê çerxê rabî'

Weqtê weku bû jî şerqê talî',

Şetrancîyê mah û cindê exter (2)

Bîlcimle lî ser bîsatê exder (3),

Şeh-mat-î kîrîn bî beyzeqa nur (4)

Te d'go hemî bûn dî torê mestûr

••

Mîrê ku jî xîretê dilefkar

Şêrê jî hemîyyetê birîndar

(1) Fermanderê leşgerêd stêran. Yanî roj.

(2) Şetrancîyê mah: Hîva ku bî setrenc dî lîzt. Yanî ronahî dî da. Cindê exter: Leşgerê sîtêran.

(3) Lî ser bîsatê exder: Lî ser palasa kesk. Yanî lî ser erdê.

(4) Şehmat kîr: Şahê wan bîndest kîr, wek lîzvanê ku dî setrencêda lîzvanê dîn mat dî ke. Bî beyzeqa nûr: Bî darîkê setrencê ê ku jî nûrêye.

Hetta sibe xew ne hate çavan
 Sakin ne di bû, ji rengê avan
 Rojê ku ji meşrîqê ruma nûr
 Afaq-ı kırım ji zîmetê dûr,
 Mîr ra bû û hate şehneşînê
 Nêzîkê serayê nazenînê
 Rûnişt û we gote pêşekaran:
 «Hun gazî bî kîn nedîm û yaran
 Tenha ji mîra Memê bî xûnîn
 Tacdîn û digel bîran me xûnîn
 Îro li Memê ezê xezeb kîm
 Sûcek wî heye ezê edeb kîm
 Na bit ku ji min bî bin di xafîl (1)
 Bîlcimle bî emrê bin di acîl! (2)
 J'ew paşê şîhande nîk Memê xwend
 Hazır kırîbûn gulab û gulqend
 Ew çende şerab û qend û şekker
 Ew çende gulab û misk û enber
 Înan û di meclîsê gerandin
 Keyfêd-ı xwe ser bî ser gîhandîn
 Encamê tekellîm û xeberdan
 Kêşane bî satîrenc û nerdan
 Mîr gote Memê, bî kîn û kerbe:
 «Îro me digel te ceng û herbe
 Ra be ji mîra were mîqabîl
 Bê şîk bî tera ezîm mîcadîl
 Şertê me digel te, ey serefraz!
 Herçî te di vê, jîbo me dîlxwaz»

(1) Na be ku hun ji min bê hay bî bin, bîla tîm gohêd we li fermana min be.

(2) Hemî di fermanêda bî lezî, bî lez fermana min bî cî bî-nîn.

Lê Mîr, jî kuran hebû ciwanek
 Mehbûbê zemanê, nuktedanek
 Yûsîf jî melaheta wî mehcûb
 Rîstem jî geçæta wî mexlûb
 Hemsîhbet û hemdemê Memê'bû
 Hemşahî-yû hemxemê Memê'bû
 Serdarê kuran bî navê Girgîn
 Fîlhal-î xeber gîhande Tacdîn
 Ew betl-î ku bû jî halê waqîf
 Ra bûn bî wîra Çeko û Arîf
 Şêran verisandî qeyd û zincîr
 Hersê bî tebayî gûne nîk Mîr
 Tacdîn ku dîgel biran bî meş hat
 Ka'beyn-î jî bo Memê duşê hat
 Fîl û Rîx û Kerkedan ku hatin (1)
 Dîn Mîr û miellimê xwe matîn
 Zanîn ku Memo bî bend û baze
 Mîr gote Memê: «Du destê taze»
 Sê dest-î jî Mîr birin temamî
 Mîfsîd fîkrî jî wî meqamî, (2)
 Zîn dî ku lî pencerê dîyare
 Mîhre lî mehê dî ket nezare (3)
 Bedxwahî, bî nê çî hîle ra kîr!
 Ev rege behaneyek eda kîr,
 Go: «Bend û leyîz û cîh bî dorîn
 Hun herdu cîyan bî hev bî gorîn
 Mem dê bî bîtin vê carê mexlûb
 Hasîl bî bîtin jîbo te metlûb

(1) Fîl û Rîx û Kerkedan: Sê darîkê setrencêne. Mexsed jî wan Tacdîn û Çeko û Arîf'în.

(2) Mîfsîd: Mîrovê fesad; yanî Bekîr.

(3) Roje lî hîvê dî nêre.

Mîr ra bû û çû cîhê Mem'ê jar
 Mem hate cîhê jî pêşve dîldar (1)
 Çavêd-î Memê ku dîn ruyê Zîn
 Mift dane jî dest xwe Fîl û Ferzîn
 Dîl maye lî pencer û şibakan
 Hepsê xwe dî da lî cîh peyakan
 Mîr bir jî Memê temamî şeş dest
 Mem bû jî meya jî pêşve sermest (2)
 Mîr gote Memê: «Me bir xwe dîlxwaz»
 Wî go ku: «Bî bê, çîye te daxwaz?»
 Mîr go: «Me xerez ne kesbê male
 Meqsûd-î jî teyyê, keşfê hale
 Metlûb-î jî le'b û bend û bazan
 Qet nîne bî xeyrê keşfê razan
 Şertê min ewe: Bî kî tu îqrar,
 Kanê dî dînê kîye te dîldar?
 Herçî perîya te dîl lî bale
 Horî sîfete, melek mîsale
 Ger laîqê te ewê bî bînim
 Malê xwe bî dîm, jîbo te bînim»
 Sahîb xerezê dî weqtê fîrset (3)
 Ta'na xwe jî rengê def'ê tuhmet (4)
 Go: «Mîn diye ya Memê hebandî
 Keçek Erebane, lêvdeqandî
 Ser ta bî piyan reşe wekî qîr
 Ne laîqê behs û xwestîna Mîr»
 Ta'nê dî Memê we reng eser kîr
 Yekcarî jî aql-î bê xeber kîr

(1) Cîyê ku lî pêşîya wî yar xuyabû, yanî Zîn.

(2) Jî wê meya ku lî pêş wîbû, yanî jî nihêrtîna Zînê.

(3) Sahîb xerez: Yanî Bekîr.

(4) Yanî bî awakî wîsa peyivî, goya ku bî wî awayî îftira-
 ya der heqê Memê'da jî serê hel tîne, lê mexseda wî eve ku bî vê
 pey vê derb lî Memê xe.

Behra dilê perde lê, bî coş hat
 Nagah-ı bî gazî-yû xuroş hat
 Go: «Qet ne weye wekî wî gotî
 Mîrım! Perîya dilê mı sohtî,
 Şehzadeye, şehneşîn mekane
 Enqaye, bîlndeasîyane
 Mîraniye ew, jî neslê pake
 Nûraniye ew, ne ab û xake
 Serdefterê hor û nazenîne
 Her gendî melek, bî navê Zîn'e»
 Mîr ev xebera xîlafê heybet
 Gava ku bîhîstî, hate xîret
 Wî gote qebîleya xulaman:
 «Hun bo çî, gelfî nemekheraman!
 Vî nakesî na gırın bî zîllet,
 Da ez bî kujım ewî bî fîret?»
 Ra bûne Memê dused xezenfer
 Mem ra bû pîyan bî destê xincer
 Tacdîn û Çeko dîgel bîrayî
 Ra bûn bî teessîb û tebayî
 Gotın: «Gelfî cındîyan! Ve westın
 Hun cımle ne serxweş û ne mestın
 Hun genc-ı dî zanın em kusanın
 Sahîb hunerın dî pehlewânın
 Pênsed jî we hemle kın bî kerban
 Na dîne we nebeta çu derban
 Ger çî we ecel bî dest me nîne
 Emma we gelek jî dest me dîne
 Hetta ku bî kın Memê gıriftar
 Sêsed jî we dê bî bın bîrîndar
 Hetta ne me hersêyan bî ker kın
 Hun dê ı Memê kusa nezer kın
 Herçî kırî Hakîmê me ferman
 Em na bine manîe çu hukman

Destêd-1 me bestîne lî ber Mîr
 Ha gerden û dest û pê û zincîr»
 Mîr ra bû û pê Memê best
 Tacdîn mîrîna xwe wê demê xwest
 Emma çî bî ket? Jibo ne are
 Cellade, ne mîre xundekare
 Mem girt û şîhande pêşê serheng
 Go: «Heps-1 bî kîn dî qulleya teng»
 Hel girtin û birne pêşê dîzdar
 Mehbûs-1 kîrîn dî qulleya tar
 Dîwanî û meclîsî belav bûn (1)
 Bîlcûmle jibo Memê dî mehzûn
 Dîwane sîfet bî ah û feryad
 Hemyan dî kîrîn jibo Memê dad

(1) Dîwanî û meclîsî: Mîrovên ku li dîwan û cîvatêbûn.

XLIV

HALÊ MEMÊ DI ZINDANÊDA

Mihra felekê ezel edîma

Kîna felekê ebed qedîme

Herçî wekû ew ji erdê ra ket

Elbette wî dê di erdêra ket

Ulwê ji xwera eyan di xwazît

Sîflê ji mera nîhan di xwazît

Na bînî, hero ku afîtabê

Davête mîxareya turabê

Xasma ku digel qebîlê aşîq

Hem xain û xware, hem minafîq

Elbette dilê me îşqebazan

Ewwel di bitin bî xenc û nazan

Axir di ketin melûl û me'yûs

Manendê Memê zelîl û mehbûs

Davêjite mehbêsê bî nakam

Datînite merqedê serencam

Ew bextereşê leqeb lî wî Mem

Bê hemnefes û heval û hemdem

Havêtine çalekî bî zarî (1)
 Teşbîhê bî gorê teng û tarî
 Mekrûhe wekî dehanê ejder
 Menkûre wekî Nekîr û Mînger
 Rûnîştî dî wêve abîdane
 Zîndan lî wî bûye çillexane
 Ew cîh lî wî bûye çahê Nexşeb (2)
 Ew meh geriya hîlalê yekşeb
 Sofî ku gîhişte kuncê xelwet
 Şêxîni gîha meqamê wehdet (3)
 Geh şîbhetê aşîqan bî dîlxwaz
 Geh şîbhetê abîdan bî daxwaz
 Her lehze dîgel kela girînê
 Ev renga he wî dî gote Zînê:
 Kî: «Ey mîslê herareta xerîzî! (4)
 Îro he dî Mîsrê dîl Ezîzî'î (5)
 Sed carî hero lî qelbê xemnak
 Pîrahenê sebrê min te kîr çak
 Geh geh, çî dî bîr wekî Zîleyxa
 Pîrsa me bî kî? Tu ey şekerxa!
 Leyla tuwî, ez jîbo te Mecnûn
 Gulgûn jî tera sîrîşkê pîrxûn
 Ferhad'îm ez, û tu bo me şêrîn
 Seylabê sîrîşkê coyê şêrîn
 Dînya lî me ger çî bûye zîndan
 Îro he tenê ezîm mîsîlman
 Lewra jî devê Nebîyyê Mîrsel
 Bû ev xebere sehîh û mîrsel:

(1) Bî zarfî: Bî girîn, ku têda girîna mîrov tê.

(2) Çahê Nexşeb: Çemê bajarê Nexşeb.

(3) Meqamê wehdet: Meqamê yekîtîyê. Belkî jî mexsed jê «Wehdetîl-Wicûd»be.

(4) Wek germîya ku tîm, û jî ber xweda tê.

(5) Ezîzî: Tu Padîşahî, serekwezîrî.

«Dinya ku bihuştê kafirane
 Me'wayê belayê mî'mmâne»
 Her çendî qewî mîşewweşim ez
 Ew çend bî mîşewweşî xweşim ez
 Sed salî bî gêrî mîn tu mehbûs
 Ma ez qe dî bîm jî weslê me'yûs?
 Sondê dî xum ez bî Sûreyê Nûr, (1)
 Dêma ku ewe kitabî mestûr,
 Deh carî bî heqqê bejn û balê,
 Çıl carî bî heqqê zulf û xalê,
 Tehqîq-1 bî afitabê ruxsar, (2)
 Tesdîq-1 bî mahîtabê dîdar.
 Te'kid-1 bî qîblegahê ebrû,
 Tazîm-1 bî secdegahê gêsû,
 Sed carî qesem bî herdu nûnan, (3)
 Ehda mîm ewe digel uyûnan:
 Hetta remeq hebit jî canî
 Cana! Tu dî canêda nîhanî
 Hîndî ku jî hîcrê bê qerarim
 Ew çende jî te umîdewarim
 Her çendî ku Mîr lî mîn xezeb kîr
 Ev qehrê lî mîn ne bê sebeb kîr
 Her çend xebîrê Bekîr wî goh kîr
 Ev cebrê lî mîn ewî bî cîh kîr
 Lewra ku tu şahî, ez gedabûm
 Ez bo te ne kufw-û hemliqabûm
 Tu mîhrecemal û mehcebinî
 Ev çende letîf û nazenînî

(1) Sûreyê Nûr: Sûrekî qur'anêye, têda qala mînasebetên jînan û mêran dî be.

(2) Tehqîq: En sonda xwe pît dî kîm, xurt dî kîm. Afitabê ruxsar: Rûwê teyê wek rojê.

(3) Herdu nûnan: Herdu çavên wek herfên nûn ku dî nivîsana Erebidî wehane:



Ez xar û zelîl û xakîsarım
 Ev renga zeîf û dîlfîkarım
 Perwaneme, ten mı daye agir
 Sohtîme bı batın û bı zahır
 Neylûfer'e dıl, tu afîtabî
 Ten şıbhê kıtan, tu mahîtabî
 Ger ten bı rızıt weya bı bît xerq
 Wer dıl bı bîtin dı behrê xem xerq
 Heqqê mîne, adle, zılm-ı nîne
 Xasıyyetê agirê evîne
 Ev çale eger çı zêde kûre
 Emma jı edaletê ne dûre
 Sofîme û sewmeenışınım
 Xweş talıbê nûrê rûwê Zîn'ım»
 Hasıl: Qewimî meqamê «Mûtû» (1)
 Ber mûcibê «Qeble en temûtû» (2)
 Tezkîyyeyê nefsê bû mîkemmell
 Tesfîyyeyê qelbê bû mîhessell
 Ayîneyê rûhê bû mîcella
 Nefs û dıl û can bı hev mîseffa
 Ew mî'tekîfê dı dewrê halê
 Hêja ne gîhîştî dewrê salê
 Belkî ne çıl û ne erbeînek
 Zenna dı dîlê wî bû yeqînek

(1) Meqamê «Mûtû»: Merteba welîtîyê ku mîrov bı mîrına nefsê dı gîjê.

(2) Ber mûcibê «Qeble en temûtû»: Lı gorî fermana ku dı bêje «Hêj ku hun ne mîrîne», ev gotın jı hedîse. Mana vê beytê eve: Pêxember gotiye ku: «Hêj ku hun ne mîrîne bı mîrın». Yanî hêj ku hun dı dînêda dı jîn, nefsa xwe bı kujın û wîsa xwe bê nefis bı kın ku wek hun mîrîbın. Lı gorî vê gotına wî ev merteba welîtîyê ku bı kuştına nefsê çê dı be, jı Memê'ra bı cî hat. Lewra ew jı hêj ku ne mîrîb û kete zîndanê û nefsa xwe dı wêda paqîj kır, goya ku nefsa xwe kuşt û bı wî awayî berî mîrına xwe mîr.

Meşhûd-ı bûwîn lı qelbê enwar
 Mekşûf-ı bûwîn lı ber wî esrar
 Ayîneyê dıl we bû mîseyqel
 Sûret we bı maneyê mîbeddel, (1)
 Ew heykelê metleba mecazî (2)
 Bû mel'ebê tîflê îşqebazî (3)
 Ev mîmkun û masîwa seraser
 Fîlcimle jîbo wî bûne menzer
 Ev dar û ber û dewab û însan
 Ev maden û ev nebat û heywan
 Herçî ku bı dıl wî lê nezer kîr
 Herçî bı xıyal-ı lê guzer kîr
 Her yek dı numa jîbo wî Zîn'ek
 Meşhûde jî her yekê yeqînek
 Goya bı xwe ew resednîşînbû
 Ew çal-ı jîbo wî dûrebînbû

(1) Şıkl û madde wisa bı manewîyat guhorî ku.

(2) Heykel û laşê daxwaza evîna ne rastîn. Yanî ew laşê Memê ku berê bı tenê gihana cem Zîne dı xwest û daxwaza wî evîna dı rûdabû, evîna rastîn pêra tunnebû.

(3) Bû cîyê lîztîna zarûkê evîna rastîn. Yanî evîna rastîn wek zarûkeki dı leşê wida dest bı lîztîne kîr û geriya. Evîna dı rûda, şûna xwe da evîna rastîn.

XLV

ZÎN BÊ HÊVÎ DI BE Û GAZINAN JI

FELEKÊ DI KE

Zîn'a ku bî derdê hîcrê xemgîn
Bê sebr û sıkûn, qerar û temkîn
 Hindî weku Mem ne bûyî mehbûs
 Hêja ne di bû jî weslê me'yûs
Gava weku Mem gîhîşte çalê
Ummîd-î ne ma jibo wîsalê
 Nîzhetgeh û şehneşîn û eywan
 Lê bûne hesar û hebs û zindan
Hindî weku şerbet û teambûn
Goya ku li wê hemî herambûn
 Canê ne di kîr çu xwab û rahet
 Cîsmê ne di dî çu tab û taqet
Ew renge zelf û jar-î bûbû
Goya ku bî cîsmê tayê mûbû
 Ew mû gerîya jî za'feranî
 Teşbihê bî reng û rûyê Xanî

Şeb ta bî seher, seher heta şeb
 Farîx ne dî bû jî zîkrê «Yareb!»
 Her lehze dî gote çerxê dewwar
 Kî: «Ey zalimê bê emanê xwîn xwar!
 Mîn qesd û xerez dîgel te nîne
 Aya te dîgel mîn ev çî kîne?
 Dewrek te ne kîr demek jîbo mîn (1)
 Pîr dî te meger Mem'ek jîbo mîn
 Nûrek dî rûwê me kîr te peyda
 Sohtîm lî Memê te pê sıweyda
 Şewqek dî ruxê Memê te hîl kîr
 Qelbê me bî wê te sot, û kul kîr
 Aya te çî meslehet dî mîn dî?
 Nîşanê me da te yêkê cîndî
 Ewwel te kusan lî mîn eyan kîr?
 Paşê te çîra lî mîn nîhan kîr?
 Sohtîm te bî agirê fîraqê
 Kuştîm te bî derdê îştîyaqê
 Alem hemî pêkve şad û xurrem
 Dayîne mîn û Memê te matem
 Derdê xwe jîbo mîra bî bêje
 Jehra dî dilê xweda bî rêje
 Yûsîf te lî mîn şîhande çalê
 Kuştîm te dî vê xîrabemalê
 Yaqûb-ı sîfet hezîn û nalan (2)
 Sebra dîl û can te bîr bî talan
 Ez mayîme herwekî Zileyxa
 Bê Yûsîf û bê mîrad û me'wa»
 Geh şekwe dî kîr jîbo Mem'ê jar
 Kî: «Ey Yûsîf'ê bê guneh, girîftar!

(1) Te demekî jîbo mîn, jîbo rastbûna şansê mîn gerekî ne kîr, tu carekî jîbo bextewerîya mîn ne gerîyayî.

(2) Yaqûb: Bavê Üsîf Pêxember.

Da fıkr-ı ne kî ku rahetım ez
 Da zen ne birî bî taqetım ez
 Wellahî qesem dî kım bî Barî
 Rojêd-ı sıfî, şevêd-ı tarî
 Nînin jî mîra çu xwab û xwarın
 Îlla ku du dîde xwîn dî barın
 Bîdarîye sen'etê du çavan
 Xwînxwarîye xwarına hınavan
 Ey qîbleyê qelbê mın! Bî dîlxwah,
 Wey Ka'be'yê can! Bî Ka'betullah,
 Her lehze jî destê fîrgeta te
 Her weqt-ı jî destê hesreta te
 Sed ah û dused enîn û efxan
 Bê gav-ı me tîn jî nêv dîl û can
 Ev rengineye halê mın şeb û rûz
 Halê te kusane, ey dîl efrûz?!
 Zındaniyê mın! Te kî celîse?
 Sewdayîyê mın! Te kî enîse?»
 «Ey dîl! Tu jî qelbê mın bî der kev
 Wey can! Tu jîbo dîlê bî ber kev
 Hun herdu herın Memê bî bînın
 Lê yek xeberê jîbo me bînın
 Ey dîl! Tu ku lê dî kî selamê
 Zû bîne ve bo mera peyamê
 Kanê bî çî hale ew grîftar?
 Danîn çî xıyale, ê dîlefkar?
 Kanê lî me aşê, yane zîze?
 Baxê wî buhare, ya payîze?
 Xweşreng û letîfe şîbhê sorgul
 Yan jar û zeîfe mîslê bîlbîl?
 Eywan lî me bûye darê mîhnet
 Zindan bî me bûye baxê cennet

Xwezya ku lı min xezeb kıra Mîr
 Manendê Memê bı xull-û zıncır,
 Ez jî bı şîhandıma wê çalê
 Rojek ve ketan lı min jı salê (1)
 Carek bı diya min ew giriftar
 Derman bı kıra min ew bırındar
 Umrê min eger çı yok remeqbû
 Heqqa ku mırın jibo me heq bû

(1) Ve ketan: Derî lı min ve kırna, lı min der keta.

XLVI

TACDÎN Û BIRAYÊD XW JIBO RIZGARKIRINA MEMÊ DI ŞÊWRIN

Eczayê kitabê îşqebazî (1)
Sehhafê micelledê mecazî (2)
Şîraze û cuz'û bend û terkîb (3)
Ev renga kîrm bî nezm û tertîb
Go: Zîn û Mem'êd-î nazeperwerd
Gava wehe der ve bûn lî wan derd
Ew derd-î we bûne behrê ateş
Ew ateşê xem we bûye serkeş,
Xelqê ku hebû jî îşqê teşwîr
Wî agirî kîr lî wan we te'sîr,
Ma'lûl-î bûwîn hemî bî derdan
Yek carî bî der ketin jî perdan
Xasma ku mîwafîqêd-î dêrîn
Hemsîhbetê wan, Sîtî û Tacdîn,

(1) Parçên pirtûka evîndariyê.

(2) Ew kesê ku rûpelên pirtûkêd mecazî rast di ke û saz di ke. Yanî ê ku dirokê jî mera neqil kirîye; dirokvan.

(3) Mexsed jî vana giştîk pişkên dirokêne. Terkîb ev renga kîrîn: Bî vî awayî kom kîrîn û cîvandîn. Nezm û tertîb: Rêzkîrîn.

Derdan we lî wan jî nûve ser dan
 Êdî ne di hate jê xebêrdan
 Her çendî ku ew jî van cuda bûn
 Disan bî wî derdî mîbtelabûn
 Derdê Sîtiyê xîyalê Zîn'bû
 Tacdîn jî xema Memê we dînbû,
 Her lehze digel biran bî şerbû
 Qesda di dilê wî ev xebêrbû:
 Ra bit bî xezeb bî çîte pêş Mîr
 Daxwaz-î bî ket Memê bî teqsîr
 Carek bî çûn Memê rîca ket
 Sûc û gunehê Memê eda ket
 Da mîr jî wîra birayê ber det
 Ya ev ser û mal-î tê bî der det.
 Arîf wehe gote: «Rîstemê Zal!
 Ev emr-î bî min mîhale bê qal
 Bê ceng û cîdal û bê tehewwîr
 Qet vê şuxulê me kin tesewwîr
 Ev ma'reke na bitîn bî dîwan
 Em mane û sibhe sehnê meydan
 Ya qenc ewe em sibe sıwar bîn
 Hersê bî sîlah û kar û bar bîn
 Çarane û cewşenan di ber kîn
 Zendane û mîxferan lî ser kîn
 Gurzan bî hejîn, rîman bî bazîn
 Ev renga Memê jî Mîr bî xwazîn
 Ya dê bî kutek Mem'ê xwe ber dîn (1)
 Ya cûmle bî merdî ser bî der dîn
 Ger wî bî vî rengî Mem ruha kîr,
 Derdê di dilê me wî dewa kîr.
 Wer mayî mîsîr lî ser înadê
 Em dê bî kîrîn we reng cîhadê

(1) Bî kutek: Bî carekî, di cîda.

J'ewwelve biçîn Bekir bî ker kîn
 Wî midbirî j'ber derî bî der kîn
 Her ber derekî gurek lî ber bî
 Xesmaneyê qenc-î ser bî ser bî
 Mîr er jî wîra bî ket teessib
 Ra bî lî me ew bî ket texellib,
 Aşê ecelê wîsa bî gêrîn
 Teşbîhê heban seran bî hêrîn
 Bohtan bî kirîne reqs û govend
 De bêne temaşeyê şekerxend
 Gava weku dest bî dîne herban
 Mehbûb-î temaşê kîn lî derban
 Her lehze bî bêjin ew perîzad
 Destêd-î we xweş, cîwan û mîrzad!
 Hindek bî girîn, hinek sena kîn
 Hindek bî kenîn, hinek dua kîn
 Dildar-î nezer bî kîn jî bîrcan
 Durdane bî der kevin jî dîrcan
 Şehzade jî penceran nezar kîn
 Gulpîrehenan dî ber xwe ker kîn
 Her dem bî bîhîn jî nazenînan
 Sed medh û hezar-î aferînan»
 Tacdîn xebera birayê goh kir
 Mihkem dî dilê xweda bî cîh kir

XLVII

TACDÎN JI MÎR'RA XEBER DI ŞÎNE Û BERDANA MEMÊ JÊ DI XWAZE

Sersîbhe, ku şehsîwrê efleq (1)
Eşheb ku kîşande cayê ebleq (2)
Edhem di tewîleyê nhîn kir (3)
Eşheb ji xwera ji nûve zîn kir
Gurzê xweyê atêşîn deranî
Tîxê xweyê zerfeşan ku danî,
Dînya ji mehabeta xwe zer kir
Tîx û kemera çîyan bî ker kir



Tacdîn û bîran ji xelqê l'alî (4)
Xwestin bî dilê xwe wan helalî
Kêşane derê bî reqs û bazî
Rexşê erebî, semendê tazî

(1) Sereksîwarê sîbê. Yanî roj.

(2) Eşheb: Hespê boz, mexsed jê sîbeye.. Ebleq: Hespê qer, yanî şev.

(3) Edhem: Hespê qer, yanî şev.

(4) Xelqê l'alî: Xelkê li alî wan, mîrovêd wan.

Mîsmar-ı kırım bedû jî xeflet (1)
 Heşyar-ı kırım edû bî sewlet
 Meydan bî dewan kılan, bî dest kor
 Goya ve dî dan lî dijminan gor
 Tacdîn jî tewabiê xwe yek pîr
 Tayîn kır û zû şîhande pêş Mîr
 Gotî: Here bêje: «Mîr û axan!
 Bînende ve na kujin çiraxan
 Mîrê me eger çî dûrebîne
 Îro wî dî çavê nûr-ı nîne
 Em çar-ı bîra hebûn dî sadîq
 Herçar-ı lî xîzmeta wî aşîq
 Însafe ku zêdetir jî salê
 Mem mayîye bê xwedan dî çalê?
 Dijmin lî me şane, dost-ı xemgîn
 Ferze mırîna Çeko û Tacdîn
 Mem ger çî ku zêde pîrgunahe
 Lê aşîqe, îşq-ı padîşahe
 Hukînê tu me ke lî padîşahan
 Zûlmê tu me ke lî bê gunahan
 Em hêvî dî kîn, Memê ruha ket
 Derdê dî dilê Memê dewa ket
 Em çar-ı bîrane, çar-ı dîwar
 Erkanê seadeta wî herçar
 Herçar-ı serêd-ı me wekî go
 Çoganê iradeta wî kaşo
 Ya meslehetê jîbo me çê ket
 Ya ne, jî mera Bekîr ve rê ket
 Da em xeberan jîbo wî bêjîn
 Derdêd-ı xwe em lî wî bî rêjîn
 Rûmet me ne ma lî rûwê amê
 Dê neql-ı bî kîn bî çîne Şam'ê»

(1) Mîsmar: Bîzmar; qey mexsed jê şûr, yan jî rîmîn. Kırım bedû: Eşkera kırım.

XLVIII

BEKİR DI TIRSE Û DEKEKÎ NÛ ÇÊ DI KE

Teqrîrê ku kır tamam-1 Qasîd
Waqîf gerîya bî halê hasîd (1)
Zanî ku jibo wîra xîrabe
Go: «Efw-1 jibo Memê sewabe
Mîrîm! Me ne go jibo te pêşîn
Tacdîn û bîran jî xwe me êşîn?
Zînê bî de wan weya bî kuj mîn
Yan ew bî terane xesm û dijmin
Ya qenc ewe qet ne kî tekellîm
Tacdîn jî te na ketî tewahhîm
Bêje: «Me fîda kîrîn Mem û Zîn
Tezwîc-1 kîrîn, me danê Tacdîn»
Zahîr tu me ke evê înadê
Carek ve kuj agirê fesadê
J'ew paşê tu bêxe weqtê fîrset (2)
Zînhare! Me dê eman û mîhlet

(1) Hasîd: Dexes. Yanî Bekîr.

(2) Bê xe: Vê xe, wî agirî vê xe.

Xesmê ku ne şî bî bî mîqabil
 Derman çîye? Şerbeta helahî
 Lew lazîme hakîman du fîncan:
 Yek xasê xirab, û yêkê qencan
 Da yek nexweşan jîbo wî xweş ket
 Ya dî jî wîra xweşan nexweş ket
 Yek canê jî dijminan cuda ket
 Ya dî mûriyan jî nûve ra ket
 Kerba xwe me ke tu aşîkare
 Ya qenc ewe em bî kîn midare
 Şoln hene, ew bî kerbê na bîn
 Lewra ku bî zor û derbê na bîn
 Ustadî dî vêtin, û teemmil
 Îxfa û texafîl û tehemmil
 Ewqatê zemanê gûnê-gûnê
 Barî jî mera kîrîn nûmûne
 Yanî şev û roj û sibh û şamın
 Hın rohnîne, hın jî wan zelamın
 Em jî dî leyâlî-yû neharan
 Da bîn bî nîhan û aşîkaran
 Hın zahır û hindekan bî xef kîn
 Ra kîn hînekan, hınan telef kîn»
 Wî milhîdî şûr wîsa seqa kîr (1)
 Mîsrî jî xwera wîsa bîra kîr (2)
 Pend û xelet û xîlaf û yalan
 Bend û seqet û xîlaf û kalan (3)
 Tesnî-î kîrîn wî hinde teşnî'
 Bestîn wî lî şûrê şîbhê tersî'

(1) Wî milhîdî: Wî bê dînî, wî Xwedê ne nasî, yanî Bekîr. Şûr: «Şîr» bû, me lî şûnê «Şûr» nivîsî.

(2) Mîsrî: Şûrê Mîsrê, mexsed jê dek û dolabın. Bîra: Tûj.

(3) Bend: Benê şûr. Xîlaf: Qab.

Ew şûr-ı lı bın serê xwe danî
 Ew renga veşarî kes nî zanî
 Mîrê weku dîl bî kerbê sotî
 Herçî ku Bekîr jibo wî gotî,
 Bawer kîr û gote merdê Qasîd:

«Ey pîr-ı! Me ke tu fikrê fasîd
 Ger fewt-ı bî kîm cemîê ferzan
 Tacdîn ku dî dîm jî dest xwe erzan?

Mîn şewket û seltenet bî wîne
 Ev şuhret û şanê mîn jî wîne
 Ev nam û nîşan û ev meqame
 Bê xatîrê wî lî mîn herame
 Ew Rîstemê keywe, lendeħaye (1)

Gencîneme ez, ew ejdeħaye
 Bêjê: Bî dîlê xwe mîn Mem û Zîn
 Herdu bî helalî dane Tacdîn

Bê wech-ı jî mîn tu bûyî wehşî
 Daxwaz-ı te kîr, ku mîn ne bexşî?
 Tacdîn û Çeko bî izz-û nazîn
 Dê her we bî tîn, wekî dî xwazîn»

Qasîd ku rewane bû jî pêş Mîr
 Teqrîrê ku kîr temamî tabîr,
 Şêrêd-ı lî şer we bûn melaîm,
 Gotî: «Dem û dewleta wî daîm» (2)

(1) Keywe: Padişah, Key.

(2) Şêrêd lî şer: Şêrên ku jî şerra amade bûbûn; Yanî Tacdîn û birayêd xwe.

XLIX

BEKİR RÊ NÎŞANÊ MÎR DI DE

Êvarê ku asîmanê menqel (1)
Danî, û li wan veşarî meş'el (2)
Yanî ku ve kuşt çiraxê zerrîn (3)
Wer girtî ji nû libasê rengîn
Mîrê ku hemîşe şad û xurrem
Goya ketibû libasê matem
Wî bextekê rûsiyahê mel'ûn (4)
Gava ewî dî ku Mîr-î mehzûn,
Go: Xem me xwe ey çiraxê dewlet!
Ger umr-î bî dît jibo me mihlet,
Ev kerb û elem eger te navê,
Zînê û Memê ji dîl xwe bavê.
Ew herdune baysê fesadê
Ew bûne sebep jibo înadê
Ger îzn-î bî dît jibo mîra Mîr
Ez dê bî kujim Memê bî tedbîr

(1) Menqel: Manqala agir, mexsed jê sîtêrîn.

(2) Meş'el: Mêlede, yanî roj.

(3) Çiraxê zerrîn: Çıra rengzer, yanî roj.

(4) Bextek: Kabûs, yanî Bekir. Mehzûn: Melûl.

Tacdîn û bîran bî şerbetek zehr
 Tu d'şî demekî ewan bî kî qehr
 Emrê ku dî bî tedarîk asan
 Ageh me ke pê tu xelq û nasan
 Mîrîm! Tu here, bî bêje Zînê:
 Mem sohtiye, agirê evînê
 Mem teşne, tu abê zendeganî
 Mem mırde, tu canê cawîdanî
 Bêjê ku: Here Memê derîne
 Mın dayîye te, jibo xwe bîne.
 Mın zanîye Mem zîyade jare
 Perwaneye, meqseda wî nare
 Gava ku nezer bî ket lî Zîn'ê
 Tehqîqe ku na ketin çu jînê
 Fîlhal-ı dema ku wê bî bînî
 Bawer me ke ev bî rih bî mînî
 Mem ger bî vî rengî zû fena bî
 Dê keşmekeş û nîza-ı ra bî»



Mîrîm hene aqılın, ezîzın
 Lê sadedılın, dî bê temîzın (1)
 Ew sade jî bîlh û natemamî
 Dıl na dme menşea kelamî
 Wan dıl gohe, goh bî dîlve nîne
 Raşçavın û merdimeksîpîne (2)
 Herqî ku dî bêjnê xerezdar
 Bawer dî kın ew bî rastîyê xwar
 Na bîn: Eve qence ya xırabe
 Ne bîn: Eve xet'e ya sewabe (3)

-
- (1) Bê temîzın: Nî karın qencî û xırabîyê jî hevdû ve qetînin.
 (2) Bîbîkên çavêd wan sîpîne; qey mexed eve ku wek koranın.
 (3) Xet'e: Şaşe. Sewabe: Raste.

Qasırnezerin dı bê teemmıl
 Hazırxezebin dı bê tehemmil
 Exleb dı bın ew bı aqlê mexrûr
 Ekser dı gerin jı danışê dûr
 Bedxwah û bexîl û bedsekalan
 Bed'esl û sefih û bedfialan
 Tînm dı kine refîq û rehber
 Bednam-ı dı bın wezîr û serwer
 Dî'spêrine van kesan umûrê
 Ew êd'xine dewletê qusûrê
 Mîrêd-ı bı dewlet û feraset
 Sahıb şefequet xwedan sîyaset,
 Ew her kesekî xwedan-ı na kın
 Hetta weku îmtihan-ı na kın
 Çıl carî dı kın yekê mıcerreb
 Paşê ewî dê bı kın mıqerreb
 Ev mîr û wezîrîya cîhanî
 Ev begî-w kızıriya zemanî
 Herdu bı mîsalê yek dı lîzın
 Herdu dı betal û bê temîzın
 Hetta weku ger ne bê tu «Elheq» (1)
 Kengê dı bîye wezîrê mitleq?

(1) Yanî tu bı durûtî û şalûzî her karê wan rast têw neki.

L

MÎR DESTÛRA DÎTINA MEMÊ DI DE ZÎNÊ Û ZÎN DI XEME

Tedbîr-ı kunende pîrê aqıl (1)
Ev renga he bû jibo me naqıl
Go: Mîr bî mîşawerê û rayê
Weqtê weku çû heremserayê
Zîn gazî kîr û lî ba xwe danî
Ew perde jî ser sirê helanî
Go: «Bêdîlîya Memê me bes kîr
Azerden-ı mîn lî wî ebes kîr
Cewr û sîtema ku mîn lî wî kîr
Ew cewr-ı te kîr, sîtem ewî kîr
Îşqa te jî wî aqıl revabû
Şeyda û cînûn û mîbtela bû
Zanî jî hekîmekî me tedbîr
Dîwane dewa dî bîn bî zîncîr
Lew mîn bî xezeb şîhande çalê
Ew hebs-ı lî wî gîhande salê

(1) Tedbîr kunend: Kesê ku bî binê karan û tedbîran dî zane.
Pîrê aqıl: Pîrê aqilmend. Yanî mirovê ku vê çîrokê neqıl kîrîye.

Da îşq-ı bî ket kemalê hasıl
 Hubba we ne ket wîsal-ı batıl
 Elhal-ı dema bî qelb û canî
 Mîqdarê mehebbeta we zanî
 Hun herdu dî merteba kemalın
 Meqbûlın û qabilê wîsalın
 Mem aşîqê sadîqe bî tehqîq
 Qelbê me dî ket jibo wî tesdîq
 Me'mûre bî emrê padîşahî
 Mazûre bî uzrê bê gunahî
 Herqî ku lî wî bî ket îtabê
 Elbette dî bînitın îqabê
 Hısna teye ew kirî giriftar
 Hubba teye ew kirî birîndar
 Tîra wî lî dîl ketî te lê da
 Ew darûwê bêheşî te pê da
 Ew sırme dî çavê wî te kêşa
 Hetta tu ne dî, wî dîl ne êşa
 Zûfa te lî dest û pê wî bestî
 Eqreb sîfeta dîlê wî gestî
 Toqa te lî gerdene wî danî
 Dava te ve da lî qelb û canî
 Çawa ve kîrın te herdu ahû
 Ber dane feqîr-ı herdu cadû
 Dîsan tu here dîgel xeber de
 Qeydan tu ve ke jibo xwe ber de
 Ey xunçeyê naşıkufte sorgul!
 Bî'şkîn qefesê, derîne bilbıl
 Ew têhne, tu kaniya Feratî
 Ew xeste, tu çeşme ya heyatî
 Ew teşne, tu abê zendeganî
 Ew mırde, tu canê cawîdanî»
 Ev perdegayê ku pîr hewa bû
 Mezbûtê dî perdeya heya bû

Ew perde bıray ku lê hel avêt
 Xwînê dî dev û gepê wê havêt,
 Zîn'a ku dused birîn lî cergê
 Çû haletê fewtê, şadê mergê (1)
 Behra ku jî cunbeşa hewayê
 Mehfûze bî perdeya heyayê
 Hacız ku hewa reva jî mabeyn
 Berzex jî heya ne ma dî behreyn (2)
 Ew qulzemê xerî kelî bî ser coş
 Ser coş û kelî, pîrande serpoş
 Serpoş-î pîrî, jî dîl pela xûn (3)
 Havêtî wekî Ferat û Ceyhûn
 Goya hejîya hezar-î bîşe
 Meybû, rîjîya jî qelbê şîşe
 Mîr-î bî xerez kenî lî Zînê
 Ew renga reva kela girînê
 Hazır jî dûwê kebabê ulfet
 Gerya wî dî çev-î eşkê şefqet
 Fewwareyê merhemet bî kel hat
 Bêgav-î girî ewî dîgel hat
 Ew çende girî bîra dîgel wê
 Hetta sibe her we man dî xelwê
 Zîn xerqeyê xwînê dîl wekî gul
 Mîr lê dî girî mîsalê bilbîl
 Mehrem hemî vêk ketîn lî ba wan
 Bîlcimle bezîne dest û dawan (4)
 Kî: «Ey Xusro'yê heqşînasê adil!
 Naheq tu jibo çî bûyî qatîl?

(1) Şadê mergê: Bî mîrînê şa bû, mîrîna xwe xwest.

(2) Dî behreyn: Dî herdu behranda. Qey mexed jê behra evînê û a derd û xemane. Yanî sînorê ku jî şermêbû, dî navbera herdu behranda ne ma.

(3) Pîrî: Fîrî. Pela xû: Pêla xwînê.

(4) Dest û dawên Mîr.

Zîn gulbenê baxê ismetêbû
 Zîn serwê rîyazê îffetêbû
 Pakîze dîra sedef jî dîrcan
 Laîq te ne bû bî gêrî mîrcan
 Nazîkbedena letîfe masûm
 Bê cîrm-î bî kî jî umrê mehrûm
 Ev renga dî xak û xwînêra kî
 Bê sûc-î jî can beden cuda kî»
 Mîr go: «Me kîrîm xîyalê batîl
 Ew bê heşe, ez ne bûme qatîl
 Zînê dî kujîm meger bî emda
 Tûbaye dî cennetê heremda»
 Ehlê heremê bezîne ser wê
 Cûbar-î rewan kîrîm lî serwê
 Bû şîwen û şîn dî xan û manan
 Feryad-î gîthane asîmanan
 Yek hatî jî derve nagîhanî
 Go: «Mem mîr, û dawê zendeganî»
 Zînê mîrîna Memê bî goh ket
 Goya mîrîbû jî nû bî rîh ket
 Ra bû fikirî dî çar kenaran
 Dî Mîr dî girîtî şîbhê baran
 Xelqê heremê xewas û amî
 Matemzede bûne bîtemamî
 Go: «Ey sebebê seadeta mîn!
 Bê keyf tu me be dî daweta mîn
 Ey şah-î! Te daye rûhê ruxset
 Fewta xwe wî dî jîbo xwe firset
 Can çû û bî canê muttesîl bû
 Ew rûh-î bî rûhê mîzmehîl bû

Hetta ku ne bû ji dev te îqrar
 Ew mayî dî hebsê ten girîftar
 Teşbîhê Memê melûl û mehbûs
 Bo hîfzê rîza û nav û namûs
 Ew lew ne dî çû heta ve îro
 Mabû lî ji vanîya te gîro (1)
 Rûhêm! Te ji dîl dema rîza da
 Şahêm! Te dî mîlkê dîl sela da
 Cîsmê minê bê newa giran bû
 Rûhê minê natewan rewan bû
 Derhal-î ji qalibê bî der ket
 Şewqek ji rihê Memê bî ber ket
 Wan terk-î kîrîn serayê fanî
 Ew çûne cîhanê cawîdanî
 Herçî ku qebûl ne ket meknan
 Dê seyr-î bî ket dî lameknan
 Hun vê seferê xelet me xûnîn
 Şahîd ji mera mîqerrebûnîn
 Gava weku can ji ten rewan bû
 Canan ewî dît û can bî can bû
 Hasil: Ku ji paşê ittîsalê
 Ew pertew û meş'ela cemalê,
 Gavek sekînîn û mîtmeîn bûn
 Hîna ku bî yekve mî'temîn bûn,
 Ew qetre dî qulzema sîfatan
 Ew zerre dî behra mîhlîkatan,
 Dem hatîne sahilê fenayê
 Geh çûne bî ser hedê beqayê
 Fîlcîmle ji merkeza turabê
 Ew zerre gîhane afîtabê

(1) Lî ji vanîya te: Lî benda destûr û xwestina te. Gîro: Girtî, girtî mabû.

Qet'a ne bî ittîsal û tehlîl (1)
 Mehza ne bî infîsal û tehwl (2)
 Wan rê ku bîrîn bî canibê zat
 Baqî geriyan bî zatê zerrat (3)
 Nînin eceb ev xeber jibo mîn
 Hun vî me kîne huner jibo mîn
 Şêxê weku ez bî dîl mîrîdîm
 Ew rûh û rewane, ez qedîdîm
 Her çendî lî ba we navî Mem'bû
 Lê padîşehk elîhîmembû
 Bû laîqê ferrê padîşahî (4)
 Meqbûlê teqerrîba îlahî
 Qelbê vîye wadîya mîqeddes
 Rûha wî bî nûrê Heq mîqebbes
 Hel girtîm û bî'rme Turê Sîna
 Bînde kîrîm dîgel xwe bîna
 Îname derê jî vê hîcabê
 Ev zerre gîhande afîtabê
 Hîna ku bî can mîn ev sefer kîr
 Ev can me jî can fîroşî, qer kîr (5)
 Her çendî ku zahîr «Îqlîî» got (6)
 Hazîr wî dî peyve «Îrcîî» got (7)

(1) Ne bî gîhana hevdû û yekbûnê. Yanî ne ku gîhan hevdû û tê ketin nava hevdû, bî hevdûra bûn yek.

(2) Ne bî cudabûn û vegeîn. Yanî ne ku jî hevdû cuda bûn û jî hevdû qetîyan, ve geriyan.

(3) Bî xêra zatê bûn zerreyêd nemîr.

(4) Şan û şerefa padîşahiyê.

(5) Jî can fîroşî: Qey mexed jê laşe. Qer kîr: Me bîrî, jê qetand.

(6) «Îqlîî»: Jê bî qete, jê der keve. Yanî jî ganê mera got ku: «jî laş der keve, jê bî qete».

(7) «Îrcîî»: Ve gere. Yanî jî ganê mera got: «Dîsa ve gere, here bî gîje laş».

Lew hatıme da bî kım we razî
Merziyye bî bım lı pêşê Qazî
 Da ez bî kırım dıgel we tewdî'
 Da hun bî kırım dıgel me teşyî'
Dısan ve gerım jı ba we reqqas
Mırtaz-ı bî bım bî cenneta xas»

LI

ZÎN WESÎYETA XWE LI MÎR DI KE

Zînê ku numane wan keramet
Ev çende menazil û meqamat,
Rûnîşt û wesîyyeta xwe bo Mîr
Ev renga he kir beyan û teqrîr
Kî: «Ey padîşehê rihan û qelban!
Hemşîre buwî fîda û qurban
Qurbanê te bîn hero dused Zîn
Ez hêvî di kîm ne bî tu xemgîn
Rojê weku bir me Mem jibo xwe
Bîlcîmle bîrîn me xem jibo xwe
Mensûr-î buwîm lî keşwerê xem
Xem bûne jibo mîra mîsellem
Mem bo mîn, û merhemet jibo te
Xem bo mîn, û seltenet jibo te
Şahê! Bî mîra mebe mînazî'
Ez bûme bî hîsseyê xwe qanî'
Rûne tu lî textê, şîbhê Xusro
Tacê xweyê zêr bî gêre kecrû
Bezma terebê bî dêre tertîb
Zewq û ferehê bî gêre terkîb

Serxweş bî ke sade û ruwalan
 Çûn xweş ke jî nûve pîr û kalan
 Esbabê neşat û kameranî
 Adabê sefa û zendeganî
 Amade ke şerbet û teaman
 Azade ke carîye-w xulaman
 Pîr ke tebeqan jîbo nîsarê
 Da bîn fiqera dî vê hewarê
 Mecmû-1 bî ke mîferrîhatan
 Mexlût-1 bî ke mîettîratan
 Meclîs bî bitîn bî wan mîzehheb
 Tehniyye bî bit jî nû mîretteb
 Da vêk bî kevin lî min şekerxend
 Têkra bî hejûn bî reqs û govend
 Eqsamê bixûr û ûd û enber
 Ma-werd û zîbad û mîskê ezfer
 Ev cîns-1 jî nî'metan bêtir bîn
 Ev qîsm-1 jî heddê zêdetir bîn
 Heywanîyeta me bûye zail
 Rûhanîyeta me bûye kamil
 Cîsmê me eger dî çîte çalê
 Rûhêd-1 me dê bî kîm wîsalê
 Eqda weku dawetî melek bîn
 Eqsamê bixûrê dê gelek bîn
 Lewra ez û Mem melek sîfatîn
 Em mallê tîb û teyyîbatîn
 Ursa ku firîşte dawetîne
 Damad û erûs-1 cennetîne
 Roja ku Sîfî te daye Tacdîn
 Çawa te dî şehre bestin ayîn,
 Tenbîh-1 bî ke dîkan û sûkan
 Tezyîn-1 bî kîm jî rengê bûkan
 Botan tu bî bê bîla sîwar bîn
 Cîndî tu bî bê bîla lî kar bîn

Sergerm-ı bî bin wekî dî îdan
 Hindî ku lî hev dî dîn cîrîdan
 Rojê ku te ew perî verê kîr, (1)
 Çendî weku kêfxweşî te çêkîr,
 Ez hêvî dî kîm bî kî îneyet
 Qanûn-ı bî kî wîsan rîayet, (2)
 Îro he jîbo mira du çendan (3)
 Dîsan tu wîsan bî şad û xendan
 Îhsan ke tedarîk û cîhazan
 Hazîr bî ke mîtriban û sazan
 Manendê îmareya Sîfî tê
 Her şîbhetê mehmela perî tê,
 Tabûteke zêrnîgar û rengîn
 Sîndokeke xurdekare zerrîn, (4)
 Serpoşê ewê zemîntela bî
 Seywanê ewê xwedan cêla bî.
 Zînhare! Me herdu bûk û zavan
 Bê qedr-ı ne kî lî pêşê çavan
 Gava ku dî çîne nêv mezarî
 Da xelq-ı ne bêjîtin bî zarî:
 «Eqda Sîfîyê çî roje xweşbû!
 Zîne jî ezel çî bextereşbû!»
 Naşê me bîla Sîfî dîgel bê
 Tacdîn-ı dîgel Memê bî dîl bê
 Manendê Memê jîboyê Tacdîn (5)
 Tacdîn bî wîra bî gêre şoşbîn
 Şoşbîn bitûn ew dîgel Mem'ê mîn
 Şahî bitûn ew dîgel xemê mîn

(1) Ew perî: Sîfî.

(2) Qayde wîsa bî parêzî. Yanî jî mînra jî wek wê rojê aheng û kêfxweşî çê kî.

(3) Du çendan: Du qas lî wê rojê.

(4) Xurdekare: Derxûn, çenbîl û tîştên dîn.

(5) Wek ku Memê jîbo Tacdîn bû birazava.

Ey mailê xeyrê bê mikafat!
 Wey bazûlê meqsed û miradat!
 Hetta veku salekî temamî
 Hindî ku telef dî kî teamî,
 Hindî ku bî der dî dî libasan,
 Hindî ve dî xûnî am û xasan,
 Hindî ku bî ker dî kî qumaşan,
 Hindî ku belav dî kî meaşan,
 Her rojî bî nîyyeta xezayê
 Hindî ku gelek dî kî etayê,
 Hindî weku tu lî text-î rûnî,
 Her rojî tu cındîyan ve xûnî,
 Hindî ku tu pîr dî kî xezînan,
 Hindî weku şa dî kî hezînan,
 Hindî ku xenî dî kî feqîran,
 Hindî ku ruha dî kî esîran,
 Hindî dî hikûmetêxeber dî,
 Hindî weku girtîyan tu ber dî,
 Herçî ku jibo xwera dî kî xerc,
 Herçî dî xezîneyan dî kî derc,
 Qehra weku dijminan dî ket def',
 Zecra weku zalıman dî ket ref',
 Edla ku jibo Xwedê tu xas kî
 Mezlûm-ı jî zalıman xelas kî,
 Sazê ku dî cengêda dî bêjî,
 Xwîna jî mîxalîfan dî rêjî,
 Hetta xurekê seyê şıkarê,
 Hetta elefê kerd-ı barê;
 Şahê! Lî te bit wesîyyeta mın:
 Wan serf-ı bî ke bî nîyyeta mın
 Me'fkır dî heqîqet û mecazê
 Bî'nvîse lî deftera cîhazê
 Da fexr-ı bî kım lî pêşê zavê
 Şermende ne bım dî weqt û gavê

Her çendî ku min qewî dirêj kîr
 Pîrbêjiye, ser lî te me gêj kîr
 Gorî teme meqsade me dûre
 Dûr bit jî te, merqeda me kûre
 Lew hinde qeder dî bêm bî diqqet
 Da bête dilê te rehm û rîqet
 Der heqqê min û Memê ne kî ar
 Gava dî mîrî Mem'ê birîndar,
 Ez dê bî cenazeyê wîra bîm
 Hetta veku meqberan teba bîm
 Weqtê dî mîrîm, bî dî tu destûr
 Da min bî kîrîm dîgel wî mestûr
 Min j'alî wî derbîder ne gêrî
 Bê perde dîgel wî min veşêrî»
 Zînê ku kîrîm wesîyyet axîr
 Xaîb geriya jî derdê hazîr, (1)
 Mîr go: «Tu here Memê bî bîne
 Ger dê mîrîbî ewî ve jîne
 Bawer tu bî ke, bî sîdîq û îman
 Bûme lî te û Memê peşîman
 Ger hun bî mîrîm, we ger ku ra bîm
 Na bit tu û Mem jî hev cuda bîm»

(1) Yanî derdê wê yê hazîr wînda bû.

LII

ZÎN DI ÇE CEM MEMÊ

Zînê ku bîhistî ev tekellim
Ev mîhr û wefa û ev terehhim
Ra bû xemilî jî payê ta ferq
Bû behrê hîsîn dî gewheran xerq
Dayîn û Sîtî û sed perestar
Xurşîd û meh û nicûmê seyyar,
Bîlcûmle bî der ketin jî bîrcan
Durdane bî der ketin jî dîrcan
Sed carîye û Sîtî û dayîn
Hel girtin ewê bî resm û ayîn
Zanî ku ne bû mîrad-î hasıl,
Bê xelwetê xasê şêxê kamîl (1)
Ew Zuhre, mîsal-î zerre reqqas (2)
Bû mehremê razê xelweta xas
Gava ku gîhane xelwexanê
Dergeh ve kîrîn lî hebsîxanê

(1) Şêxê kamîl: Yanî Memê.

(2) Ew zumre: Ew sîtêra Zuhre (Venus). Yanî Zîn.

Ew pêkve bî meş'el û fener çûn
 Dayîn û Sitî hinek dî ber çûn (1)
 Dîtin ku dî sahilê sedefwar (2)
 Ew xerqeyê behrê îşqê xwînxwar,
 Durdaneyê bêbuhayê canî (3)
 Der daye jî dest xwe rayegani
 Fanosê qefes we mayî bê tab (4)
 Gulzarê beden we mayî bê ab
 Wan pîrs-î kîrîn jî xelqê bendî
 Halê wî feqîr û mistemendî
 Xelqê ku digel Memê girîftar
 Gotin ku: «Me dî jî sethê diwar
 Berqek bî eceb Memê bî ser ket
 Şewqek jî serê Memê bî der ket
 Yek şîbhetê rojê, yek heyîv bû
 Yek şîbhetê zêr, û yek jî zîv bû
 Ew şems û qemer ku mittesl bûn
 Derhal-î bî yekve mîzmehîl bûn
 Gava weku pêkve mîqtebîs bûn
 Ew herdu lî dew'ê min'ekîs bûn
 Ew reng gerîyan minîr û rewşen
 Zindan lî me kîrne sehnê gulşen
 Mem jî bî vî rengî bê xeber bû
 Xwîna dilê wî bî derve der bû»

* *

Ey dîdayê dîl ne bûye meftûh (5)
 Înkâr-î ne kî tecellîya rûh

-
- (1) Qasekî lî pêş çûn.
 (2) Qeraxê wek sedef. Yanî qeraxê girtîxanê.
 (3) Ganê xweyê wek tena durra bêbuha hêja.
 (4) Fanosê qefes: Laşê wiyê wek qefesa fanosê ku bî çirayê rohnî dî be.
 (5) Kesê ku çavê dilê wî ve ne bûye.

Da fikr-ı ne kî ku ev hîlûle
 Yan nesxe, xırûce, yan dîxûle
 Da zen ne birî ku ev mesale
 Ya qewlê zaîfe, ya betale
 Xewna tu dî bînî, ev meqame
 Şey'ek jî şîhûde, natemame (1)
 Hemsîhbetîya Mem'ê mîkerrem
 Agah-ı kîrîn heval û hemdem
 Wî mîrşîdî qenc lî wan nezer kîr
 Qelbê wî dî qelbê wan eser kîr
 Hemxelwetîya Mem'ê grîftar
 Bû perdekuşayê yar û exyar



Dayîn û Sîti ku çûn bî serda
 Hindî ku ewan dîgel xeber da
 Gotin ku: «Memo! Tu ra be Zîn hat
 Rûha teye, bê guman, yeqîn hat»
 Ew teşnelebê zelalê dîdar
 Şadab-ı ne bû bî navê dîdar
 Hindî ku reha dîlî kîşandın (2)
 Hindî ku gulavê lê reşandın
 Wan seh ne kîrîn dî cîsmê canek
 Îlla jî serî dî çû duxanek
 Wî mîrde çîraxê nagîhanî (3)
 Dûkel jî serî dî çûye banî

(1) Tîşteki jî dîtina wî meqamîye, lê nivcoye.

(2) Reha dîl': Reha dîlê Memê, damara dîlê wî qolincê wî.

(3) Ew çîra ku jî nişkave mîrîbû, vemîrîbû.

Zîn hat û ji pêşve bû hewale
 Bedrê ku ve da ji ber xwe hale
 Berqe, ku ve da ji ber cemalê
 Xurşîd-ı numa dîgel hîlalê
 Zînê wehe gote wî bedîhî:
 «Qum ya ceseden nefextu fihî!» (1)
 Şewqa xeberê devê şepalê
 Ber bûye serê dûwê şemalê (2)
 Wî dûyî qebes ji şewqê ra girt
 Qendilê qefes qebes ku da girt, (3)
 Ew xelwetiyê dî î'tikafê
 Ra bû ve bî nîyyeta tewafê
 Ewwel ew' kîr bî sîdq-ı der dem (4)
 Tecdîdê wîdû bî abê zemzem
 Westa lî misella û meqamê (5)
 Wî cebhe gîhanda îstîlamê (6)
 Tewfek-du kîrîn lî dorê Beytê
 Perwaneyê per gîhande zeytê (7)
 Gava weku per lî wî dî sotin
 Wan çende kelam-ı pêkve gotin
 Perwaneyê go: «Tu xweş delîlî»
 Şem'ê wehe go: «Tu xweş xelîlî» (8)

(1) «Ra be, ey laşê ku min pîf kirîyê!». Ev bî zerê Erebiye.

(2) Bî ber serê dûyê fîndê ket, çû gîha dûyê serê fîndê. Mexsed jî fîndê Memê'ye.

(3) Ku vê çîrîskê çîra laşê Memê tîjî kîr, ronahiya xwe lî her derê laşê wî belav kîr û laşê wî wek qendîlekî vê xîst, rohnî kîr.

(4) Der dem: Dî wê wextêda.

(5) Misella: Cîyê nîmêjê. Meqam: Meqamê Bîrahîm Pêxember ku lî hember Mala Xwedê'ye. Yanî pêşberê Zînê.

(6) Enîya xwe gîhande Kevîrê Reşê dî diwarê Mala Xwedê'da. Mexsed jî kevîr xala rûwê Zînê'ye.

(7) Perwane: Yanî Memê.

(8) Şem'ê: Yanî Zînê.

Perwaneyê go: «Tu rehnumayî»

Şem'ê wehe go: «Tu canfezayî»

Perwaneyê go: «Tu dîlfirozî»

Şem'ê wehe go: «Tu sînesozî»

Perwaneyê go: «Tu çaresazî»

Şem'ê wehe go: «Tu dîlnewazî»

Perwaneyê go: «Tu padîşahî»

Şem'ê wehe go: «Tu qîblegahî»

Perwaneyê go: «Tu hûrê zatî»

Şem'ê wehe go: «Tu nûrê zatî»

Wan teşnelebêd-ı bê tekellîf

Wan soxîteyêd-ı bê teserrîf

Ev reng dî kîrîn bî yekve sîhbet

Lêk erz dî kîrîn kemalê ulfet

LIII

MEMÊ DI MIRE

Dayîn û Sîtî û ew perestar
Ew bendî û hebsî û girîftar,
Sergerm-î buwîn bî guft û goyê
Serbest-î buwîn jî bêhn û boyê
Wan gote Memê, ku: «Ey cegerxûn!
Em hatine da ne bî tu mecnûn
Zîn bû sebebê cinûniya te
Mîr bû sebebê zebûniya te
Mîr bû bî tera xwedan terehhim
Zîn hat û digel te kîr tekellim
Ger teşneyî, ev he abê heywan!
Wer xesteyî, hate ser te Luqman
Mecnûnî, xwe hate ba te Leyla
Ger Wamiq'î, ha jîbo te Ezra!
Ger bilbilî, gul jîbo te hazîr
Neylûferî, Mîhr-î bûye nazîr
Perwaneyî, şem'î wê eyîsa
Wer mîrdeyî, hate ser te Îsa
Dîwane me be bî vî hewayî
Bêgane me be, tu aşînayî

Hora ku te can û dîl dî desbû
 Zîn'a ku te daîma hewesbû,
 Çawa te dî vê we hate ba te
 Dînyaye, fenaye, hat û bate (1)
 Erzan me firoşe umrê zayî'
 Bêhûde me be lî canê bayî'
 Cama ecelê heta bî noşî
 Na bînî jibo xwe canfiroşî (2)
 Dîsan xwe bî aqlê aşîna ke
 Zencîrê cînûniyê reha ke
 Lewra ve kîrîn me qeyd û zencîr
 Ra bî bî mera bî çîne pêş Mîr
 Sahîb kereme, xwedan etaye
 Zîlla wî sîha perê Huma'ye (3)
 Vêk dane jibo te yar û ehbab
 Hazîr kîrîne bîsat û esbab
 Sabîtqedeme lî daweta te
 Rû daye te bext û dewleta te (4)
 Derhal-î dema bî çî mîqabîl
 Dê bo te bî ket mîrad-î hasîl
 Çawa te jî wî mîrade dîlxwaz
 Êw renga te dê bî ket serefraz»
 Weqtê ku Memê bihistin ev pend
 Ev renga he go ewê hunermend:
 «Ez na çîme hezreta çu mîran
 Ez na bîme bendeyê esîran
 Ev mîr û wezîrîya mecazî
 Ev şu'bede û xîyalebazî (5)

-
- (1) Hat û bate: Carna tê, carna jî nayê.
 (2) Canfiroşî: Kesê ku ganê xwe bî firoşe.
 (3) Siya wî siya perê teyrê dewletêye.
 (4) Rû daye te: Berê xwe daye te.
 (5) Dekê sêr û xîyalê.

Bîlcımle betal û bê beqane
 Bê aqîbetın, hemî fenane
 Mîrê ku mırın hebit, ne mîre
 Mazûlî hebit, ewî esîre
 Em çûne huzûrê Mîrê mîran
 Wî hakîmê hakîm û feqîran
 Şahîngehê mîr û padîşahan
 Bexşendeyê tuhmata gunahan
 Ê çê kirî neynîka cemalet
 Tîra xwe numa bî zîlf û xalê
 Fanosê beden kirî mitella
 Têda jî mera kirî tecella
 Ew Mîrê Hekîme, Zülcelal'e
 Bê ezl û texeyyîr û zewale
 Tezwîc-ı kîrın dî alema xeyb
 Te'bîb-ı kîrın bî emrê lareyb
 Bakûre û baxê izz û nazîn
 Sed şîkr-ı ku bîkr û serfîrazîn
 Haşa ku dî vê serayê fanî
 Bê cennetê Ednê cawîdanî,
 Heywan sîfet em bî kîn zînayê
 Bêhûde dî meskenê fenayê
 Terdamen û sernîkûn û merdûd
 Şermende bî çîne pêşê Mabûd
 Mabûd-ı jîbo me hor û xîlman
 Tezyîn kîrîne dî baxê Rîdwan
 Ew mîntezırın lî rîhleto me
 Fexrê dî kîn ew bî dawate me
 Lê cennetê aşîqan cudaye
 Mîadê lîqayê kîbrîyaye (1)
 Alîtire ew jî baxê Rîdwan
 Na kuncîne wî çu hor û xîlman

(1) Dema dîtina Xwdê'ye.

Hêvî dî kîn em ewî jî Mabûd
 Nînin me bî xeyrê wî çu meqsûd»
 Gava ewî kîr temennî axîr
 Dergah-î ve bû lî ber wî hazîr
 Teyrê ku qefes lî ber ve bûyî
 Ew renga firî, wekî ne bûyî
 Destê xwe jî qeydê gîl kîşan lî
 Çengêd-î dilê xwe ra weşandî
 Şehbaz-î jî qeydê merkeza fers (1)
 Perwaz-î kîr û gîhîstê Zîl'ers (2)

(1) Jî ben û qeydê merkeza axê, merkeza dinyayê.

(2) Firî û gîhîst Xwedê. Yanî mîr.

LIV

ŞİNA MEMÊ Û KUŞTINA BEKİR

Ew matemîyê ku baxeber bû
Ev renga jibo me newheker bû (1)
Go: Can ku ji hepsê ten cuda bû
Feryad û fîxan dî şehre ra bû
Bû welwele û fîxan û zarî
Bû zelzele, û bezîn hewarî
Bohtan ji mezîn heta biçûkan
Nîswan û keç û benat û bûkan
E'yan û ekabîr û ealî
Mîrza û ruwal û laubalî
Yek ferd-î ne ma dî şehre dîlxweş
Bîlcimle dî serxweş û mişewweş
Vêkra dî bezîn bî ser Memê've
Wan derdê bîrîn bî ser xemêve
Tacdîn û Bekîr bî ittîfaqî (2)
Bûn herdu lî erdekî mîlaqî

(1) Dengbêjê şînê. Yanî ji mera qala wê şînê kîr.

(2) Bî ittîfaqî: Bî rasthatin, bî tesadîf.

Go: «Ey sebebê fesadê alem!
 Şeytan sîfetê lı şıklê adem!
 Ey baysê fitne û fesadan!
 Wey maniê meqsed û mîradan!
 Ey perdedirê Memê û Zîne!
 Wey daxekeşê lı ser birînê!
 İblîsê xebîsê pîrnedamet!
 Bes nîne? Lı mın te kîr qıyamet
 Der heqqê Memê seqet xeber da
 Hetta ku lı mın te Mem bı der da
 Ev çende mınafıq û neyarî
 Hêja tu bı çavê mın dîyarî
 Mem dê bı mırît, tu dê bı minî?
 Hêj xweş bı gerî lı rû zemînî?»
 Hazır wî Bekır dı erdêra kîr
 Cismê bı bela jı can cuda kîr
 Gava ku gîhîşte ser bırayê
 Nûrek wî ne dî dı wê çırayê
 Tacdîn jı serê xwe tac û tomar
 Havêtine ser leşê Mem'ê jar (1)
 Dîn bû jı tehessıra bırayî
 Herçî ku dı dî wî ejdehayî,
 Fîlhal-ı dı kîr ku wî fena ket
 Teşbîhê Bekır dı erdêra ket
 Qet kes ne dı şî bı bît mîqabıl
 Bê şıbbe bı wî dı bûye qatıl
 Naçar-ı xeber bîrın jıbo Mîr
 Mîr hat û lı pê wî bestî zincîr
 Gava ku cenaze wan helanîn
 Şahıd ku jı meşhedê deranîn

(1) Tomar : Tac. Ser. leşê Mem'ê jar: Dı nusxekîda jı «Ser leşê bîrîndar»e.

Meşhûd-ı buwîn lı wan elamet
 Ra bû lı xelaîqan qıyamet
 Dêwê ku ve bestî wan bı tedbîr
 Bızdandî lı ber xwe qeyd û zincîr
 Zincîr û kemend ewî şıkênand
 Derwaze û perde wî helînand
 Ejder jı mîxareyê ku ber bû (1)
 Derhal-ı bezî dı naşê wer bû
 Tabûtê lı ser serê xwe danî
 Efxan dı gîhane asîmanî
 Hindî ku dı şehîrî ademî bûn
 Têkda bı l'basê matemî bûn
 Hindî ku hebûn dı şehîrê meşhûr
 Xatûn û mîxedderat û mestûr
 Gêsûvekirî, bı tayê terpûş
 Ser ta bı qedem hemî sıyehpûş
 Bê mî'cer û berqe'û serendaz
 Reş girtî jıbo Memê bı dılxwaz
 Neyyahe û mîhreban û dayîn
 Goyende bı nale şıbhê Goyîn (2)
 Wan mersîye dı'stiran bı aheng
 Zîn ra bûye pê, bı qameta şeng
 Nahîde sıfet lı dengê sazê
 Reqqase dı çûye ber cenazê
 Dam û ded û ademî û mûran
 Dar û ber û camîd û tıyûran
 Bîlcımle jıbo Memê dı nalîn
 Her yek bı meqamekî dı kalîn
 Telpê reşê wan sıyahepoşan
 Reh şıbhetê ewrekî xuroşan

(1) Ku ber bû: Ku der ket.

(2) Goyende bı nale: Bı nalînan dı peyivîn, dınalıyan.

Ew çende ji arizêd-1 gulgûn
 Vêkra dî werîn sîrîşkê pîrxûn,
 Goya ku dî feslê nûbuharî
 Baran-1 li gulşenan dî barî
 Ev matem û ev sîyahepûşî (1)
 Ev çareşev û îzar û pûşî, (2)
 Bohtan wî zemanî kîrne adet
 Bû resmê qedîmî ta qîyamet (3)

(1) Sîyahepûşî: Wergirtina cîlên reş, reş girêdan.

(2) Îzar: Pêstemal, bersîng.

(3) Resmê qedîmî: Rê û adeta mêjûyî, a berê.

LV

ZÎN DI BAŞÎYA BEKÎR'DA DI PEYÎVE

Weqtê weku çûne ser mezarên
Wan dî mîrîyek di nêv du daran
Havêtine erdê şîbhê murdar
Bê newheker û xwedan û xemxwar
Pîrsîn: «Eceb ev çî bê newaye?»
Gotin: «Bekîr'ê xwedan cezaye
Tacdîn jî rûwê dinê fena kîr
Alem bî fenayîya wî şa kîr»
Rawî wehe gote min rîwayet:
Zînê ku bîhîstî ev hîkayet,
Ev renga he gote Mîr û Tacdîn:
«Ey şah û wezîrê îzz-û temkîn!
Ez hêvî di kîm ne kîn înadê
Der heqqê vî menbeê fesadê
Lewra ku xwedanê îns û canan
Wî xalîqê erd û asîmanan,
Roja ewî hubbê da hebîban
Hingê ewî buxze da reqîban

Mewcûd-ı kırım dema jı madûm
 Em pêkve dı lazımn û melzûm
 Em sorguln, ew jibo me xare
 Em gencın û ew jibo me mare
 Gul hîfz-ı dı bın bı nûkê xaran
 Gencîne xwedan dı bın bı maran
 J'ewwelve eger çı wî cefa kır
 Axır bı mera ewî wefa kır
 Zahir wî eger mîxalefet kır
 Batın bı mera mîwafeqet kır
 Ger ew ne buwa dı nêv me haıl
 Îşqa me dı bû betal û zaıl
 Wî ger çı jibo xwera xırab kır
 Der heqqê me wî qewî sewab kır
 Ew bû sebebê heqîqeta me
 Daxıl gerîya terîqeta me
 Ew jî dı rêya meda şehîde
 Tehqîq-ı bı kın ku ew seîde
 Zînhare! Jı meşheda ku Mem tê
 Elbette jı merqeda ku em tê,
 Mehrûm-ı me kın Bekır, emanet!
 Em bûne bı wî seyî sıyanet
 Gava ku dı çîne nêv seîdê
 Kelbê me bîtin lı ber wesîdê»

**

Însafe jibo xwedanê însaf
 Ayîne dı bîtin ev qeder saf!
 Qet mîmkune av û abegîne,
 Ev renga ne ket qebûlê kîne?
 Haşa ku bı xeyrê puxtêyê îşq
 Kella ku sîwayê suxtêyê îşq,

Ev çende lı sahibê cefayê
 Ev renga kesek bî ket wefayê.
 Ev taife merhemetsırıştın
 Lew laîqê nîmeta bîhuştın (1)

(1) Ev taife: Ev bîr. Yanî bîra evındaran, kesên ku bî agirê evînê şewitîn. Merhemetsırıştın: Xwiyêd wan merhemet û dîlovaniye.

LVI

ZÎN JÎ DI MIRE

Elqisse: Şehidê îşqê cellad
Meqtûlê sîtem, qetîlê bê dad
Ew kuştîyê cirmê bê gunahî (1)
Teşbihê beratê padîşahî
Menşûr-ı kırım bî nûrê pakî (2)
Mestûr-ı dî nêv qubûrê xakî
Ew dur bî xezîneyê sıparın (3)
Ew mar-ı lî ber pîyan veşarın (4)
Daynandîne ber serî elamet
Yanî eve serwerê qiyamet
Serxeylê qebîlê pakebazan
Serdarê cemîê serfirazan

❖

Zîn hat û bî qameta senewber
Bû serw-ı lî ser wî sayeguster

-
- (1) Kuştîyê: «Kuştîyê» bû, me lî şûnê «Kuştîyê» nivîsî.
(2) Menşûr kırım: Nivîsîn, xemilandîn. Yanî kefen lê pêçan.
(3) Ew dur: Yanî Memê.
(4) Ew mar: Yanî Bekîr.

Bê perde mîsalê Ney dî nali
 Hıstır dî werîn elettewalî
 Eynî te dî go dî feslê Nisan
 Derya rîjîya jî ewrê dîsan
 Baran ku lî tîrbeyê dî barî
 Her dane dî bûne deh mîrarî
 Her dem ku dî kîr jî derdê dîl ah
 Wan matemîyan, —neûzu billah—
 Vêra bî newa dî gîrtin aheng
 Her neh felekan bî ser dî ket deng
 Cındî û sıpahî û emîran
 Derwêş û reîyye û feqîran
 Dîldar û şepal û nazenînan
 Horî û perî û xemrevînan,
 Vêkra dî kîrîm hewar-ı her kes
 Efxan dî gîhane çerxê etles
 Zînê ku ne ma qîwam û quwwet
 Nalî birîyan û ket jî qudret
 Rûnîştî lî ber serê Mem'ê jar
 Mem kîr bî tekellîmê xeberdar (1)
 Kî: «Ey malîkê mîlkê cîsm û canî!
 Ez baxçeme û tu baxevanî
 Baxê te gîhandî, bê xwedane
 Bê rûwê te ew jîbo çîrane?
 Ev xal û xet û îzar û gulzar
 Ev hîsn û cemal û baxê ruxsar
 Badamê sîyah û çeşmê şehla (2)
 Nar û bîh û sêv û şaxê bala
 Xweşreng û bî lezzet û bî tamîn
 Bê şîbhe lî xeyrê te heramîn

(1) Yanî pêra peyivî.

(2) Badamê sîyah: Behîvêd reş. Qey mexsed jê birûne. Çeşmê şehla: Çavê nêrgîzî.

Nexla bedena xwe ra weşînim
 Vî meyweyî cıme da weşînim
 Van sınıbîl û laleyêd-ı xerra
 Reyhan û binefşeyê mîterra
 Yanî ku îzar û zulf û xalan
 Ya qenc ewe ez bî dîm bî talan
 Manendê gulan lîbasê ker kîm
 Ax û xwelîyê bî serxwe wer kîm
 Zulfan hemî ta bî ta bî kêşîm
 Heqqê mine ca bî ca bî êşîm
 Ev bax û buhar û berk û esmar
 Enwar û şikûfe, cem'ê ezhar
 Nezra nezera tebûn bî carek
 Weqfa besera tebûn mîbarek
 u kîm ez ewan temamî
 re ne xun jî wan çu amî
 Lêkî xwe bî xw dî kîm tesewwîr:
 Belkî tu lî mîm bî bî texeyyîr,
 e ne bîr lî ba te meqbûl
 ku tu mîm bî gêrî mes'ûl
 Terkîbê wicûdê cîsm û canî
 Milkêd-ı tene, ne bê xwedanî
 bî bîrîn jî hîsnê mûyek
 u bî kî lî mîm tu sûyek
 Gava ku lî mîm bî kî îtabê
 Zanîm ku ne şîm bî dîm cewabê
 bî bîm wekî te medhûş
 ta digel te bîm hemaxûş (1)
 Laîq ewe tey bî kîm bîsatê
 Pakîze bî bîm jî îxtîlatê

(1) Hemaxûş: Hembêzî. Yanî tê kevîm hembêza te, ez û tu hevdu hembêz bî kîm.

Ya qenc ewe her bî vê cemalê
 Azerde ne kîm qe zîlf û xalê
 Teslîm-î bî kîm emanetê Heq
 Tefwîzê te bîm bî xeml û rewneq» (1)
 Ev renge eda kîrî heqafîq
 Bîzdandî jî alemê elafîq
 Hembêz-î dî merqedê weranî (2)
 Bê zar-î numa beden jî canî (3)
 Destê xwe bî dîl jî canê şuştin
 Goya ku şemal-î bû, ve kuştin
 Rûha xwe şîhande pêşê Barî
 Cîsmê xwe sipare wî mezarî.



Wan matemîyêd-î dîl bîrîndar
 Tekrar-î jî nûve kîrî hawar
 Efxanê jî canê hazîrînan
 Feryadê nîhadê nazîrînan,
 Sê roj û şevan jî fersê xebra
 Peyweste dî çûne ersê e'la
 Hetta weku Zîn bî resm û ayîn
 Techîz-î kîrm wekî dî zanîn
 Lehda ku Mem'ê meleknezer tê
 Yanî sedefa ku ew guher tê
 Ew çende lî ser girîn bî zarî
 Baranê sîrîşkê lê dî barî
 Ew çende lî ser buwîn guherbar
 Ser lê ve kîrî jî nûve tekrar

(1) Tefwîzê te bîm: Xwe bî sipêrîm te, xwe bavêjîm cem te

(2) Weranî: Gerand, gorê kîr hembêza xwe.

(3) Laş jî gan xuya bû. Yanî jê cuda bû û bê wî xuya bû, bî tenê ma.

Ew herdu guher di dircekîda
 Ew şems û qemer di bircekîda
 Bê wasîte wan kîrîn mîqarîn
 Bê fasîle ew bî hev sîparîn
 Hasıl: Ve kîrîn jî nûve sîndoq
 Mîr gote: «Memê! Jîbo te maşûq»
 Sê car-î jî qalibê seda hat (1)
 Awazê bî lefzê «Merheba» hat
 Hemyan ku bîhîstî sîrrê tehqîq
 Bîlcîmle kîrîn bî îşqê tesdîq

**

Tehsîn û sed aferîn jî wanra (2)
 Qet meylê dinê ne bû bî wanra
 Alûde ne bûn bî xak û xaşak
 Ev bû esera mehebbeta pak
 Pakîze û pakebaz-î ew gûn
 Dûşîze û serfîraz-î ew gûn
 Lebteşne û ber jî hev nexwarî (3)
 Hesretzede gûne pêşê Barî
 Xweş eyş-î kîrîn bî îşqê, wellah
 Xweş pêkve mîrîn, tebarekellah!
 Herçî bî cîwanî şîbhê Zînê
 Tebdîl-î bî ket bî îşqê, jînê
 Ya mîslê Memê bî îşqê ser det
 Eys û xweşîyê lî rê bî der det
 Elbette mîrad-î dê helînit (4)
 Herçî ku îrade dê bî bînit

(1) Jî qalibê: Jî laşê Memê.

(2) Tehsîn: Ev kelîma pesnêye, wek «Aferîn».

(3) Ber: Fîkî.

(4) Helînit: Bî gîre, bî sîtîne.

Yareb! Bî kelalê îşqê sadîq,
 Yareb! Bî kemalê sîdqê aşîq,
 Yareb! Bî şêrîniya cemalê,
 Yareb! Bî evîniya celalê,
 Yarebbî! Bî derdê hîcrê cangah, (1)
 Yarebbî! Bî zewqê weslê dîlxwah,
 Yareb! Bî helaweta hebîban,
 Yareb! Bî edaweta reqîban,
 Yarebbî! Bî nazê nazenînan,
 Yareb! Bî nîyazê xemguzînan,
 Yarebbî! Bî avê çavê bîlbîl,
 Yareb! Bî xunavê navê sorgul
 Yarebbî! Bî eşkê alê Mecnûn,
 Yarebbî! Bî rûyê Leylê gulgûn,
 Yareb! Bî Memê û wê evînê,
 Yareb! Bî tehessîra lî Zînê,
 Weqtê ku cuda di kî jî canî
 Bê behre ne kî jî îşqê, Xanî.
 Yanî jî welayeta Muhemmed
 Mehrûm-î ne kî tu yareb! Ehmed
 Çawa jî nîbîwwetê bî qale (2)
 Metleb jî welayetê wî hale (3)
 Daîm ewî guft û go welaye
 Lêkî ewî cîst û co belaye
 Qewlêd-î wî ser serî guzafîn
 Fîlêd-î wî cîmleten xîlafîn

(1) Hîcrê cangah: Dûrketîna Yarê, ku ganê evîndar pêraye.

(2) Jî pêxemberîyê bî zanîne, derheqqê pêxemberîyêda zanîna wî heye û di babetê dînda bî îlmê zahîrî bûye zana.

(3) Metleb: Daxwaz. Hale: Qenciya hal û dîle. Yanî di xwaze ku wek bî derê xwe, bî dilê xwe jî zana bî be û bî be dostekî qenc jî Pêxember'ra.

Zahır jî wera selîse guftar
Batın bî wera xebîse kîrdar
Manendê Memê ewê mîrmîcan
Teşbîhê Bekîr bî bexşe qencan

LVII

HER GÎYA LI SER KOKA XWE ŞÎN DI BÊ

Hîkmet ewe ew jî darê dînya
Çûn seyr-î kîrîm serayê uqba:
 Wan terk-î ne kîr cîbîlleta xwe
 Her yek xulqîn li xîlqeta xwe
Yanî ku li ser Memê û Zînê
Şîn bû jî zîraeta evînê
 Riskîn du eded nîhalê serkeş
 Ra bûn bî hewave herdu serxweş
Yek serwê sehê, û yek senewber
Sersebz û letîf û sayeguster
 Wan dest-î di gerdenêd-î yekra
 Qedda xwe dirêj kîrîm bî yekra
Şîn bû jî ewê berî jî xêrê (1)
Darek li qiyafeta Kîmêr'ê
 Ew dar-î jî rahetî berîbû
 Manendê xwedan-î b'stirîbû

(1) Ewê ku jî xêrê û qenciyê bê parbû Yanî Bekur.

Ra bû xwe gîhande herdu daran
 Bû manîê weslê herdu yaran
 Rahet wî ne şî bî ket mîdare
 Xesmaneyê kır wî aşîkare
 Dîsan xwe gîhande wan hebîban
 Ew lê pîçîya wekî reqîban
 Hasıl: Lî firû', eger usûlan (1)
 Ew lê fetilî wekî fuzûlan

**

Xelqê ku bî esl-î bedsırıştın
 Ew esl-î jî wan qe têtê şuştın?
 Çıl salî tu henzelê bî çînî,
 Sed avî bî dî bî hengivînî,
 Perwerde bî kî bî afitabê,
 Her dem bî reşînî lê gulabê,
 Her roj-î reha wî lê bî ker kî, (2)
 Wê fasîleyê tîjî şeker kî, (3)
 Xîzmet bî kırî tu hinde wane, (4)
 Ew bo te dî bîte Hindewane?
 Da fîkr-î ne kî dema ku ber det
 Ew xeyrê jî tehlîyê semer det

-
- (1) Firû: Şaxan û gulîyan. Usûl: Kurmên daran.
 (2) Reha wî û koka wî bî qelêşî.
 (3) wê fasîlêyê: Koka wî.
 (4) Hinde wane: Hinek dîn jî weha, ew qas jî.

LVIII

DAWIYA ÇIROKÊ

Agahê ji halê dewrê eyyam (1)
Ev renga he gote min serencam
 Go: Pîrekî mihredarê aşiq
 Qewlê wî ji rengê sibhê sadîq
Weqtê weku ew di bû mîraqib
Rûha wî di bû li cîsmê xalib
 Esrar-î di bûn li wî dîyarî
 Nêçîr di kîrî li ersê Barî
Xaîb ku di bû ji alema gîl
Xalib ku di bû li alema dîl
 Qelbê wî ji sîrrê lewhê mehfûz
 Her lehze di bû bî keşfê mehzûz
Zahir ku di bûn ji wî keramat
Ageh di kîrî Xwedan meqamat
 Wî pîrî bî xewn, eger bî îlham
 Ev renga he kîr heqîqet fîlam
Go: «Çûme dîyarê baxê Rîdwan
Min dî du hezar-î hor û xîlman

(1) Mîrovekî ku ji halê gera rojan haydarbû.

Bîlcımle dı gesreki emeldar
 Ew qesr-ı bitûn ji durrê şehwar
 Yek şıbhê Bekır bı tac û bınper
 Westayî lı ber derî mığerrerr
 Çoganekî heyzeran dı desbû
 Emma me nı zanî ew çı kesbû
 Mın gote wî: «Ey xwdan meratıb!
 Aya tu xwedanî, ya ne hacıb?»
 Go: «Şêx! Tu nı zanî ma ku kîme?
 Ez ew Bekır'ê ku qapûçime
 Ez mışterekê Memê û Zîn'im
 Lew l'êre he asîtannışınım (1)
 Ev qesre ku heşt tebeq eyanım
 Yek ya mine, heft tebeq dı wanım
 Ez l'êre emîn û dest bı darım
 Lêkîn dı vî mîlkî hışsedarım
 Her çendî bı şıklê pasîpanım
 Emma bı mekan şerîkê wanım»
 Mın gote wî: «Ey nîk û serencam!
 Wazîh bı ke halê bo mın î'lam
 Her çend kerema Kerîm'ı ame
 Barî bı çı da te ev meqame?»
 Go: «Şêx! Tu hêj ne bûyî arîf
 Emma dı dinê tu bûyî waqîf
 Ez ger bı xeber reqîbê wanbûm
 Lêkîn bı nezer hebîbê wanbûm
 Mın ew ji dinê bı paşve kêşan
 Mu'tad-ı kırım bı derd û êşan
 Xweşî dı dinê lı wan bı der dan
 Munqad-ı kırım bı dax û derdan
 Ew çende me dane wan siyaset
 Hetta weku bûn xwedan rîyaset

(1) L'êre he: Lı ~~êre~~ he. Yanî lı vıra hanê.

Lewra me lı derrê wan xeber da
 Hetta ku serê xwe tê bı der da
 Ev herdu cihan bı hev hewîne
 Ev derre lı derrê hev qewîne (1)
 Hetta weku ber ne dı tu yêkê
 Na bînî çu lzzetê ji yêkê
 Ew derre bı wan me daye berdan
 Kêşane bı asîman ji erdan
 Mın dayîye wan bitun bihustek
 Wan dayîye mın ji baxê, xıstek
 Şêx mayî lı gotına wî gohdêr
 Go: «Ey seqîyê te aqîbet xêr!
 Tacdîn ku tu kuştî bê cîneyet
 Barî bı wîra çı kır îneyet?»
 Go: «Efw-ı kır ew, cenabê Barî
 Bû cennetî, û ne çûye narî
 Xellaq-ı, xırabî-yû xebîsî
 Bexşîne wî, cennetê nivîsî
 Alem ku bı dest xırabîya mın
 Acız kırîbû fesadîya mın
 Kuştım wî jıbo nîzamê alem
 Bo rahetîya ewamê alem
 Zahır wî eger çı kır qebahet
 Batın buwe rahet ew qebahat
 Şolın hene zahîren xırabın
 Fîlm hene sûreten sewabın
 Yek edle lı sûretê cefayê
 Yek qehre dı kîswetê wefayê
 Lê perdekeşê rîmûzê hîkmet (2)
 Bê sır ne kır ew kînûzê qîsmet

(1) Ev derre: Ev herdu hewî. Lı derê hev: Lı dijê hevdû.

(2) Perdekeşê rîmûzê hîkmet: Ê ku perde kışandîye ser îşaretê hikmetan, û wan veşartîye. Yanî Xwedê.

Tewzî-1 ne kîr lî amê nasan
 Mexsûs ewî da nedîm û nasan
 Ew sır wî ne kîr jîbo me malûm
 Hîn mehremîn û hînek dî mehrûm (1)
 Sed şîkr-1 ezê xîrab, û Tacdîn
 Mehza bî teellîqa Mem û Zîn
 Mehrûm-1 ne bûn bî pîrgunahî
 Bûn mezherê rehmeta îlahî»



Ey dost-1! Bî dîl be yarê qencan
 Ya qenc-1 bî be neyarê qencan
 Ew qencîn û qencîyê dî zanîn
 Ew xeyrê jî qencîyê nî zanîn
 Hindî ku bî wan bî kî cefayê
 Ew dê bî kîrîn bî dîl wefayê
 Zînhare! Me be mihîb xîraban
 Ne dostê, ne dijminê kîlaban
 Ger dost-1 bî, dê bî kîr te murdar
 Wer dijminî, dê bî kîr birîndar
 Ev hîmmete xasê aşîqane
 Ev mertebe rahê sadîgane
 Xelqê ku wekî Bekîr şeqîne
 Fî'lêd-1 wî cîmle naheqîne,
 Yan şîbhetê Tacîdîn dî cebbar
 Qettal û delawer û cegerdar,
 Mafû bî ketîrî karameta wan
 Mexfûr-1 bî bîrî hîmmeta wan
 Teqwîyyetê wan bî bîrî mededkar
 Teb'îyyetê wan bî ketîrî sezawar.

(1) Mehremîn: Nêzikê wîne, bî wan razan dî zanîn.

Ev remze heqîqeta letîfe
 Îz'an bî ke nukteyê zerîfe
 Îz'an bî ke mes'elê, mîderrîs!
 Texmînê mesahetê, mîhendîs!
 Dîjmin ku jî îşqê behrewer bîn
 Bes, dost-î ne dê dî mî'teber bîn ?
 Ev renga teellîqa reqîban
 Bes, çende tefewwîqa hebîban?
 Xasma ku mîhîbb bî bîte mehbûb
 Ew talîbê heq bî bîte metlûb
 Heqqa ku tenê wî heq dî zanît
 Qet xeyrê wî kes bî heq nî zanît

LIX

EVÎNA RESTÎN

Ey mustemî meşal û teswîl!
Wey mîctehîdê qîyas û te'wîl!
Xanî ku jî camê îşqê dîn bû
Ew şoreşerab-î pê şêrîn bû
Ew çende ve xwar ewê ne heşyar
Agahî nema ewî jî guftar
Mestaneye ew, bî keyfê me'mûr
Dîwaneye ew, bî urfê mazûr
Mexmûre û badenoş û serxweş
Lew badefîroş û mişewweş
Herçî ku di bêjtîn, hewaye
Ger goh bî dinê, newayê Naye
Ew ney ne helal û ne herame
Bê perdeye, lê ne bê meqame
Kurî, Ereî, Derî û Tazî (1)
Terkîb-î kîrîn bî hezî û bazî
Hindek jî fesaneyêd-î Bohtan
Hindek di behane, hîn di buhtan

(1) Derî: Ev zaravekî Zarê Farisî'bûye. Tazî: Ereî.

Bohtî û Mihemmedî-w Silivî (1)
 Hîn le'l û hinek ji zêr û zîvî
 Xermuhre û morîk û mirarî (2)
 Hindek dî şefaf û hîn dî tarî
 Tersî'î kîrîn wekî bîçûkan
 Înane bî qeyserî û sûkan
 Hîn qîsse û hîn ji wan mîsalîn
 Hindek dî heram û hîn helalîn
 Her qîsse ji hîsse behremendîn
 Her emsîle, ger bî zanî pendîn
 Lêkîn wî xerez ji guft û goyê
 Meqsûd-î ji hinde cîst û coyê
 Zahirîkirîna cemalê îşqe
 Sabîtkirîna kemalê îşqe
 Îşq ayîneyê Xwedanumaye
 Xurşîde sîfet, xwedan zîyaye
 Xafil me be îşqê filheqîqe
 Ey rehrewê eqrebut-terîqe!
 Xweş cewhere, cînsê kîmîyaye
 Qedrê wî bî zan, giranbuhaye
 Teb'ê weku sîfr û bê cîlane
 Qelbê weku qelb û ya qelane,
 Ew cewhere, wan dî ket mîtella
 Ev seyqe le wan dî ket mîcella.
 Herçî ku kesek bî ket îrade (3)
 Ya îşq-î murîde, ya mirade
 Ayîneyê eksê bê mîsale
 Gencîneyê sîrrê bê zewale
 Kes nîne ji îşqê bê eser bî
 Mîmkun, ku ji zewqê bê xeber bî

(1) Ev navêd sê şîweyê Zaravê Kurmancî'ne.

(2) Xermuhre: Morîyên keran.

(3) Bî ket îrade: Bî xwaze, bî evîne.

Her kes bî qiyasê himmeta xwe
 Dê serf-ı bî ket îradeta xwe
 Lê ekserê amîyan nezanın
 Nefsa xwe jibo xwera nî zanın
 Nabalıx û ebleh û sefihın
 Ya zahıd û sofî-yû feqihın
 Ew cahıl û ummî-yû sefîlın
 Bê mırşid û rehber û delîlın
 Naçar-ı dî bîn lî îşqê bayî'
 Neqdê xwe dî dîn bî hısnê zayî'
 Hın serf-ı dî kın bî eysê dinya
 Hın pê dî kırım serayê uqba
 Ev herdu celeb dî bîn zîyankar
 Mehrûm-ı dî bîn jî zewqê dîdar

LX

GELO EV XEWNE YAN XIYALE? (1)

Saqî! Were bêje mîn, çî lewne?

Ev kewne xiyale, ya ne xewne?

Tabîr-î me ke ku ew betale

Teswîr-î me ke ku ew xiyale

Axaz-î eger çî rengheyate

Encamê heyatê wî memate

Yanî ku wicûde bê wicûde

Xweş xîlqete, heyfe bê xulûde!

Eflak û enasîr û mewalîd (2)

Exlat û tebayî'û meqalîd (3)

Vêkra dî bedî'ul-îştîrakî (4)

Têkda dî serîul-înfîkakî (5)

(1) Hozan dî vê pişkêda jîna însan dî sewirîne.

(2) Eflak: Felekî. Enasîr: Unsurên ku jîn û hebûyu ji wan çê bûne, ku av û agir û hewa û axin. Mewalîd: Tebîetên ku ji wan unsuran çê dî bin, ku şilî û germî û serma û zîwayîne.

(3) Exlat: Tîştên ku ji van tebîetan çê dî bin û ji cîvana wan tîn restê, wek mirovan. Tebayî: Tebîetîn. Meqalîd: Miftên ger-dûnê.

(4) Bedî'ul-îştîrakî: Bî awakî xweşik bî hevdûra hevparîn, xweş gihane hevdû û bî hevdûra vê jînê anîne rastê.

(5) Serî'ul-înfîkakî: Zû ji hevdû dî qetîn.

Serrısteyê gewhera beqane
 Sermayeyê îleta fenane
 Hindek dı seqîl û hın xefîm
 Hindek dı xefiy-yû hın letîfîm
 Her çendî jibo me esl û bêxın
 Her çar-ı jibo me axê şêxın (1)
 Ağır ve mırît, hewa hewaye (2)
 Av er çikiya, heba hebaye (3)
 Eflak-ı mîsalê asîyab'ın
 Hemware bî çerx û inqîlabın
 Dexlê lı wî aşî ademîne
 Metmûreyê erdê ardê lîne (4)
 Ew dane bî nobet û tewalî
 Daîm dı rîjın jı dev çewalî
 Herqî rîjiya dı bit mîcezza
 Jêkra dı bın û dı bit mîherra
 Texmîr-ı dı kın jı nûve tekrar
 Ew qalibê qelbe qabîlun-nar
 Ew çende dı kêşın ew sîyaset
 Razîne bî mertebe necaset
 Fîlcıme ne mırde û ne ehya
 Ber mûcibê «la yemûtu yehya» (5)
 Îlla ku nefîs û paketînet
 Yanî ku nufûsê nîkesîret
 Dehqan bî xîsûsiyet helînit
 Wê daneyê xasseten bî çînit
 Hetta ne rızît helak-ı na bît
 Naresket, û qence pak-ı na bît

(1) Axê şêxın: Şaxêd axêne.

(2) Hewa na mîne, wînda dı be.

(3) Heba hebaye: Ax tunne dı be.

(4) Tıştê ku dı bın erdêda veşariye, ardê nerme.

(5) Lı gorî fermana Xwedê ku dı bêje: «Xelkê dojê ne dı mırın û ne ve dı jîn».

Weqtê resîya û bûye xuşe
 Wê dê bî qutîn jiboyê tûşe
 Aşê dev û çeqçeqa zımanan
 Ava dehen û berê dıdanan
 Ew çend ewî deq dî dın, dî hêrın (1)
 Ew çende dî şehrê ten dî gêrın (2)
 Ew çend dî qutın wî ev emeldar
 Hetta we ku hûr bî bit wekî ar
 Hasil: Ku ji paşê wan cefayan
 Dê bête teserrîfa quwayan (3)
 Geh cazîbe batîne ve kêşit
 Geh masîke bi'gvişit, bî eşit
 Dem hazîme bêt, ewî bî ket hezm
 Dem daffie bêt, ewî bî ket kezm
 Tennûrê meîdde wî bî pêjit
 Herçî ku xırabe jê bî rêjit
 Tas'îd-ı bî kın heçî letîfe
 Tenzîl-ı bî kın, heçî kesîfe
 Paşê ji wî, eltefî cuda kın
 Temyîz-ı bî kın, ji hev bela kın
 Tebbaxê herareta xerîzê
 Sebbax û mîmeyyîzê temîzê
 Tewzî'ı bî ket lı cîsm û a'zan
 Mamûr-ı bî bın cîhat û erkan
 Dîza ceger û dilê zıcacî
 Teqtîr-ı bî kın meya mîzacî
 Hasıl: Ereqa meya heyatê
 Teqtîr-ı ku bû wekî nebatê
 Hêja ji zihûrê van şîûnan
 Bû qabilê alema bitûnan

(1) Deq dî dın: Dî kutin.

(2) Dî şehrê ten: Dî bajarê laşda.

(3) Teserrîfa quwayan: Bın hukmê quwwetên ku dî laşê mî-
rovthane.

Geh xûte dî xut dî behrê maî (1)
 Rengîn dî bitîn demek dîmaî
 Dem îqde dî bit jiboyê terkîb (2)
 Teswîr-1 dî bit bî nezm û tertîb
 Terkîb-1 ku bû mîsalê mîrcan
 Bû eksepezîrê pertewa can (3)
 Ew can çîye? Mîhceya nebatê
 Ew mîhceya menşea heyatê
 Hindî weku sakînê bitûne
 Xamûşe, û xwarîna wî xûne
 Weqtê ku jî mezreê xefayê
 Ew sebzeyê ter bî ket numayê
 Wî sebzeyî dem bî dem bî xûnê
 Dê av-1 bî dîn jî paşê bûnê
 Baran ne jî feyzê bit mededkar
 Ew dane dî bîte nexlê bê bar
 Sersebzê dî bit jî berk û baran
 Ger lê bî werit jî feyzê, baran
 Ew sebze ku bû nîhalê serkeş
 Sexweş gerîya jî meyweyê xweş
 Ew meywe dema gîha kemalê
 Bû mezherê pertewa cemalê
 Ger laîqê îzzeta Emîre
 Wer derxurê hezreta Qedîr'e (4)
 Wî hel dî gîrîm jîbo dîyarî
 Bê wasîte wî dî bin dîyarî

(1) Xûte dî xut: Nûq dî be. Behrê maî: Behra avê.

(2) Îqde dî bit: Bî benve tê rêzkîrîn, wek morîyan. Yanî lebatên wî li ber hevdu tên rêzkîrîn.

(3) Eksepezîrê pertewa can: Neynîka tirêja gan. Yanî dê gan tê kevê û ganî bî be.

(4) Xurekê pêşberê Xwedê. Yanî ku mirovekî qencbe û, sezayê dostanîya Xwedê'be.

Fîlhal-ı ku çû, di bîte mehbûb
 Navê wî li wê di bîte meczûb
 Ev nexline wafîrul-firûn
 Lê zêde di nadîrul-wîqûn
 Wer mayî wisan li ber hewayê
 Ew dê çite ma'sera cefayê
 Lazim ewe perwerek bî bînit
 Terbîyyetê derxureş helînit (1)
 Geh puxte bî afîtabê şer'ê
 Geh suxte bî mahîtabê wer'ê
 Gava pijîya gîha kemalê
 Weqta rijîya ji ser nîhalê,
 Hetta ne kevit ji ewcê îzzet
 Hetta ne gîhîte xakê zillet,
 Ew na bîte salîkê terîqî
 Wî na bine ma'sera heqîqî
 Ev rege he dest bî dest bî rêve
 Ew mertebe mertebe bî wêve
 Ew meywe bî xut kemalê xerbet
 Ew luqmeyê xweş bî bîte şerbet
 Ew meywe eger şêrîne, xame
 Wer tehle û tîrşe, natemame
 Hetta ne bî destê pîrê meyxwer
 Ew hel kelîtin di xummê ekber
 Gava ku di wêve kel bî ser ket
 Weqtê ji xumê mezîn bî der ket
 Yanî ku ji kesreta sîfatan
 Ew tey bî ketin tecellîyatan
 Elqîsse: Jî germîya cemalê
 Hasil: Ku bî şewketa celalê

(1) Derxureş: Xurekî. Yanî bê halekî wisan ku sezayê dostanîyê be.

Cewher ku temamî mîzmehîl bit
 Teşbîhê erez ku mînfeil bit
 Germîyyetê wan tecellîyatan
 Wan mîhriq û wan mîqewwîyatan
 Tenzîl-ı bî kîn jî wê xubarê
 Tes'îd-ı bî kîn jî wê buxarê
 Xalûs ku bî bit jî paşê tes'îd
 Hêja dî çîte meqamê tecrîd
 Cewher jî erez ku bû mîcerred
 Datînine bûteyê mîcedded,
 Êw bûte eger çî tengenaye
 Şehrayê fenayê dîkuşaye
 Hemrengê surahî-yû peyale
 Hindî weku sore, ya ne ale
 Hêja ne bûye rehîqê mextûm
 Hêja ne çûye meqamê malûm
 Hindî jî xwe wî hebit wîcûdek
 Nînin jî Xwedê ewî nîmûdek
 Bê meşrebeyê wefayê şahî (1)
 Êw na çîte meşreba îlahî (2)
 Fanî ne bîtin fenayê mîtleq
 Na bîntîn ew beqayê bîl-Heq
 Fanîti jîbo wîra beqaye
 Baqîti jîbo wîra lîgayê
 Emma ne bî ittîsal û îlhaq (3)
 Belkî ne bî înfîsal û îtlaq (4)

(1) Bê tasa wefadariya kêfxweşiyê.

(2) Meşreba îlahî: Cîyê vexwarîna xwedayî.

(3) Îttîsal û îlhaq: Zelîqîn. Yanî ne ku bî Xwedê've dî zelîqe û bî wîra dî be yek.

(4) Înfîsal û îtlaq: Cihêbûn û mayîna bî serê xwe. Yanî jî Xwedê cihê jî, bî serê xwe jî na mîne, Xwedê wî ber jî na de.

Ev renga dı ket mırâdê hasıl
Anca dı bite mırîdê wasıl (1)

**

Yareb! Çı dı bit, jı ber me koran
Carek tu ve dı hıcab û toran,
Bînende bı kî emêd-ı acız
Bê perde û bê hıcab û hacız,
Deryayê yeqîn bı ket temewwıc
Em jı bı kırîn demek teferrıc,
Ev zenn-û guman û ilm û teqlîd
Tebdîl-ı bı bın bı eynê tewhîd,
Esbab û wesîle qet ne mînın
Carek te mısebbebî bı bînın?
Îman me heyê bı zatê Wacıb
Îmkanîyeta me bûye hacıb (2)
Dîsan jı me her tu me xılas ke
Yareb! Me jıbo xwera xwenas ke
Ev seyr û sılûk û teyyê menzıl
Mexsûse jıbo mırîdê mıqbıl
Kengê jı mera dı bit mıyesser,
Xalıq jı ezel ne ket mıqedder?
Lewra ku xırabî-yû qebûlî (3)
Nînın bı fezaıl û fızûlî
Abıd bı rîyayekî helakın
Asî bı duayekî dı pakın
Alem ku wekî xıyalê zille
San'ı bı xwe hadı-yû mîdîlle
Ew tînîte menzera xıyalê
Ew tê xıte perdeya dalalê

(1) Anca: wê çaxê.

(2) Îmkanîyeta me: Hebûna meya ne zerûrî, aferanîya me.

(3) Qebûlî: Berdayına vê rêya durust.

Lê daye me cuz'ê îxtîyarî
 Nefsa me pelîd û hîlekarî,
 Ew jî birîye jî dest me naçar
 Em mane, û lutfê Heq mededkar
 Bes qenc-î jîbo me amîyanra
 Her ev bese bo me asîyanra:
 J'ewwelve Xwedê bî heq bî nasîn
 Her çendî qusûr û kêr û kasîn
 paşê bî dilê xwe jê bî tirsîn
 Dînê xwe jî alîman bî pîrsîn
 Çawa ku di bêjîn, em wisa bîn
 Hetta ku jî rû dinê fena bîn
 Pala xwe bî dîne lutfê Barî
 Belkî me bî bexşîtî jî narî

LXI

PAŞGOTIN Û PEYVA BI QELEMÊRA

Ey rakıbê waqî peyadê! (1)

Wey aşiqê sefheyêd-ı sade!

Ey şairê saxır û nîkûnser! (2)

Wey sahirê saxır û fîsûnkr! (3)

Ey haîmê wadîya dalalê!

Wey xawîyê da'weya kemalê!

Ey xameyê serteraşê bedreng!

Bes nameyê xweşqumaşê xweşreng,

Rûreş ke bî navê xett-û xalan

Bednam-ı bî ke bî Bê û Dal'an (4)

Hindî weku xet Xubar û hûre (5)

Ew xet ji letafetê ne dûre

(1) Sıwarê ku bî rastî peyaye.

(2) Saxır: Bê rûmet, nehêja.

(3) Sahirê saxır: Sêrbazê qeşmer. Fîsûnker: Ê ku çavan bî sûrê girê di de.

(4) Bê û Dalan: Herfên «B» û «D».

(5) Xet: Nivîsan. Xubar: Tewîrekî nivîsana Erebi'ye.

Gava ku ji reng' meşqê pîr bû
 Ya şibgetê Nesx û Sulsû gîr bû (1)
 Ew nasîxê nusxeya cemale (2)
 Bê rewneq û rohnî-yû kemale
 Lazım ewe dîlberêd-ı sade
 Xet lê ne bitın wekî qîlade
 Xweş zînete xet lı mahê ruxsar
 Hindî lı rûwan ne bûye hefsar
 Ey xame! Te jî gelek dirêj kîr
 Ev name, besê te pîr qîrêj kîr
 Her çendî kelam-ı şîbhê dur bît
 Bê qedr-ı dî bît, dema ku pîr bît
 Na bînî bî qîmetın cewahir
 Lewra ku dî hendikın dî nadîr
 Sehw-û xelet û xeta û nîsyan
 Mecmûeyê napesendê îsyan
 Tehrîr-ı kîrın te bê teemmîl
 Kî dê bî ketın jî te tehemmîl?
 Kes nîne bî ket jîbo te tehsîn
 Goyendeyê aferîn û nefrîn! (3)
 Ey bê edeba xîrabe bê ar!
 Kustax û sîtemker û sîyehkar!
 Hindî ku serê te mîn qelemkîr
 Ew çend te xetê xeta reqem kîr
 Hindî ku serê te mîn teraşî
 Ew çend-ı te kîr gunetelaşî (4)
 Fehhaşî te kîr pî rengê Xanî
 Neqqaşî te kîr mîsalê Manî

(1) Nesx û Suls: Navên du tewîr nivîsana Erebi'ne, herdu jî bî herfên gîr tên nivîsîn.

(2) Rûpela rindiyê reş dî ke û xîrab dî ke.

(3) Ey gotoxê aferinan û gotinên nefretê

(4) Gunetelaşî: Leza lı gunehan, xebata lı kîrînê gunehan.

Meşxûlî bese bî le'b û lehwan
 Toba xwe bî ke j'xeta û nîsyan
 Carek were ser terîqê tobe
 Hindî ne gîhîştiye te nobe

..

Ew betlê delawerê zeberdest
 Ewwel kemera tehewwirê best
 Bû rakîbê duldulê enamil (1)
 Derhal-î dîgel me bû mîqabil
 Kêşa jî zîmanê zilfecarek (2)
 Bû xîsmê dîgel me şehsîwarek
 Sîl bû, rîkîya jî wan îtaban (3)
 Ezman gerîya bî van cewaban;
 Go: «Ehmed! Eger tu nê xebisî,
 Herqî ku te go min ew nivîsî
 Qewlêd-î te qenc, eger xîrabîn
 Fîlêd te xeta, eger sewabîn
 Ey bedemelo! Tu qenc dî zanî:
 Tu qail û fail û xwedanî
 Neybûm û dî alema Neyistan (4)
 Meybûm, ne bî destê meyperestan
 Gava ku te ez bîrîm jî sazî (5)
 Ne deng-î dî min hebû, ne gazî
 Te dûr-î kîrîm jî nîk hevalan
 Melîcûr-î kîrîm jî mîlk û înanan

(1) Lî duldulê sertilîyan sıwar bû.

(2) Zîmanê: «Zebanê» bû, me lî şûnê «Zîmanê» nivîsî.

(3) Sîl bû: Xeyîdî. Rîkîya: Rîka me girt.

(4) Neybûm: Ez zîlbûm. Neyistan: Cîyê zılan, zîllek.

(5) Jî sazî: Jî zîllekê, jî nava zılan.

Bend û weslêd-ı min serabun (1)
 Ewwel te kırım bı emrê «kun», kun (2)
 Paşê ku te kîr debaxê îşqê
 Kun kîr dîlê min bı daxê îşqê
 Te pîf kîre cîsmê min dema can
 Hatın jî dîlê min ah û efxan
 Nefxa te lî min dîl û ceger sot
 Herqî ku te pîf kîrî, min ew got
 Ez lalım, û bê zıman û xamûş (3)
 Bê nefes û nefes, jî qısmê qamûş
 Bezma terebê bı min te xweş kîr
 Dîwanê guneh bı min te reş kîr (4)
 Her çendî ku zahırî heyım ez
 Sazende tuwî, wekî Ney'ım ez
 Ma Ney bı xwe tîşteki dî bêjît?
 Xame bı xwe reşheki dî rêjît?
 Katıb qelemê dî ket sıyehkar
 Sazendeye, Ney jî dest bı hawar
 Nay û qelem û kitab û nişan
 Tîr û hedef û keman û kêşan
 Mehkûmueleyhî'bûn dî teqdîr
 Hêj îsmê guneh ne bûyî testîr»



Yareb! Tu dî zanî Xanî'yê jar
 Teşbihê bı xameya girîftar,
 Qelbê wî dî dest tedaye elheq
 Destê wî dî dest xwe nîne mitleq

(1) Bend: Gırêk. Weslêd min: Movikêd min, parçeyên min. Serabun: Jî serî heta binî.

(2) Bı emrê «Kun»: Bı fermana «Bı be», wek fermana Xwedê. Kun: Qul.

(3) Zıman: «Zeban» bû, me lî şûnê «Zıman» nivîsî.

(4) Dîwanê guneh: Deftera gunehan.

Gava ku lı wî te ser qelem kır (1)
 Hergî te îrade kır, reqem kır
 Amır tuwî, ew bı emrê me'mûr
 Me'mûr-ı dı bin hemîşe mazûr
 Ger dayîye wî te îxtiyarek (2)
 Ew jî wî sipare te bı carek
 Peyweste dı dest te ser-qedembû
 Ew ger bı îlîm, we ger qelembû (3)
 Nef'û zerera xwe ew nî zanî
 Ya qenc-ı jibo xwera çî zanî?
 Çawa ku jibo tera rızaye
 Ew Ney sîfete, wî ew hewaye
 Wellah jî sefidî-yû sıyahî (4)
 Wî qesd û xerez tuwî, îlahî!
 Emma bı mirekkeba qebaîh
 Rûreş kırîne gelek sefaîh
 Xettê teye sernıwîşt û sermeşq
 Sîh sale xetê xeta dı ket meşq
 Lewra ku dema jî xeybê fek bû (5)
 Tarîx-ı hezar û gîşt û yek'bû (6)
 Îsal-ı gîhîşte çîl-û çaran (7)
 Wî pêşerewê gunahekarî

(1) Te wî aferand, yan jî te zanîn dayê, yan jî te qabiliyeta nivîsinê dayê.

(2) Îxtiyarek: Cuz'ekî îxtiyarî.

(3) Ger bı îlîm: «Ger îlîm» bû, lê jî ber ku wezna ferdê dı şikiye me «Ger bı îlîm» nivîsî.

(4) Sefidî-yû sıyahî: Sîpîtiyê û reşiyê. Yanî jî nivîsinê.

(5) Dema ku jî tunneyiyê qetîya. Yanî dema ku hate dinê, welidî.

(6) Ev tarîxa Hicriye, bı tarîxa Mîladî dı ke 1651. Hozanê nemır, dı vê tarîxêda hatiye dinê.

(7) Yanî umrê wî îsal bû 44 sal. Nexu nivîsîna «Mem û Zîn»ê dı 1695'anda temam bûye.

Vêk da jî menahîyan gelek mal

Yek pûl-î ne hîn jî hîsnê e'mal

Ewwel ku te da jî îşqê metle (1)

Axır bî de wî tu hîsnê, meqte' (2)

D A W Î

(1) Metle': Ronahî. Yanî te ronahiya evînê da serê û wî kir evîndar.

(2) Hîsnê meqte': Dawîbırîna qenc. Yanî wisa bî ke ku bî awakî qenc elaqe xwe jî dinê bî bire, dawîyekî qenc bî ke para wî.

FERHENG

(Sözlük)

A

Ab: Av (Su)

Aba: Bav û kalın (Atalar)

Abegîne: Cam, belûr (Cam, billûr)

Abîd: Peresdar (Abit)

Abîdane: Peresdaranî (Abitçe)

Abîdar: Bı av (Sulu)

Ac: Dîranê fil (Fildişi)

Acıl: 1 — Pêşende (Gelecek zaman). 2 — Nuha (Şimdiki zaman)

Adem: 1 — Mîrov (İnsan). 2 — Adem Pêxember (Hz. Adem)

Afaq: Asûwan (Ufuklar)

Afitab: Roj (Güneş)

Agah: Haydar (Haberdar)

Aheste: Hêdî (Yavaş)

Ahû: 1 — Xezal, (Ceylân). 2 — Kêmayî (Kusur)

Axaz: Dest pê kîrîna karekî (Bir işin başlangıcı)

Axıl: Axur, hevş (Ağıl, ahır)

Axûş: Hembêz (Kucak)

Al: Sor (Kırmızı)

Alat: Ambûrın, haletın (Aletler)

AlemeFrûz: Rohnîkîroxê gerdûnê (Dünyayı aydınlatan)

Ali: Bıınd (Yüce)

Alimul-xeyb: Zanayê bı tıştên nepenî (Gizli şeyleri bilen)

Alûde: Lewitî (Pisliğe bulaşan)

Am: Gıştî (Umûmî)

Amel: Xebat (Çalışma)

Aram: Hêsayî (Rahatlık)

Arasîte: Xemılandî (Süslenmiş)

Arif: Naskır (Taniyan)

Arız: 1 — Peydabûyî (Sonradan olan). 2 — Dêm (Yanak)

Arızî: Nû çêbûyî (Sonradan olan)

Arî: Rût (Arınmış)

Asefê Berxîya: Wezîrê Sılêman Pêxember (Hz. Süleyman'ın Veziri)

Asî: Gunehkar (Günahkâr)

Asımanî: Jı rengê asıman, heşîn (Gök rengi, mavi)

Asıtan: Hevş (Avlu)

Asiyab: Aş (Değirmen)

Asûde: Hêsa (Rahat)

Aş: 1 — Aş (Değirmen). 2 — Aşt (Barışık)

Aşıfte: Perîşan (Perişan)

Aşina: Naskîrox (Taniyan)

Aşıyan: Hêlîn (Yuva)

Ateşgede: Peresgaha ağırperestan (Ateşe tapanların tapınağı)

Atıl: Teral (Tenbel)

Ayîn: 1 — Rısım (Resim). 2 — Aheng (Tören). 3 — Wek (Gibi)

Ayîne: Neynık (Ayna)

Azerde, azerden: Renc (Eziyet)

B

- Bab:** 1 — Bav (Baba). 2 — Derî (Kapı)
Babeser: Bı dîtın, dîttox (Gözlü, gören)
Baç: Baçerê (Yol geçiş ücreti, baç)
Bade: Mey (Şarap)
Baxeber: Haydar (Haberdar)
Bais: 1 — Sebeb (Sebeb) 2 — Xızan (yoksul)
Bakûre: Ezep (Bakir)
Bal: Bask (Kanat)
Bala: Bejn (Boy)
Ban: Haf (Dam)
Banû: Xatûn, (Hatun)
Bar: 1 — Fîkî (Meyve). 2 — Bar (Yük)
Barîd: Sar (Soğuk)
Barî: Xwedê (Allah)
Barîgeh: 1 — Eywan (Salon). 2 — Felek (Felek)
Basır: Dîttox (Gören)
Bayî': Fîrotox (Satıcı)
Bazıl: Dayox, belavkîrox (Veren, dağıtan)
Bazî: Lîztın (Oynamak)
Bed: Pîs, zışt (Çirkin)
Bedayî': Tîştên xweşîk (Güzel şeyler)
Bedexter: Bedsîtêr, bê yom (Uğursuz)
Bedewî: Gundî (Köylü)
Bedxwah: Xêr nexwaz (Bedhah, kötü niyetli)
Bedîhî: Eşkera (Aşîkâr)
Bedr: Hîva tîjî (Dolunay)
Bedrûd: Rûzîşt (Çirkin yüzlü)
Bedsekal: Nîyetxîrab (Kötü niyetli)
Bedsîrîşt: Xwîxîrab (Kötü huylu, anlâksız)
Behaîm: Dewarın (Davarlar)

Behre: Par (Pay)

Behremend: Xwedî par (Pay sahibi)

Behrewer: Xwedî par (Pay sahibi)

Bekke: Bajarê Mekkê (Mekke şehri)

Belorî: Tıştê ji belor (Billûrdan olan şey)

Belûqîya: Cihûdekî hîlekarbûye (Bir hilekâr Yahudiy-miş)

Belwa: Bela, tecrîbe (Belâ, deneme)

Bena goş: Perîka goh (Kulak memesi)

Bend û baz: Hunermendî (Meharet)

Bexşende: Efûkar (Bağışlayıcı)

Benat: Keçin (Kızlar)

Bende: Kole (Kul)

Bendî: Girtî (Tutuklu)

Beng: Gîyakîye mirov pê serxweş dî be (Sarhoş edici bir ot)

Benî: Xulam, qûl (Hizmetçi, kul)

Ber: 1 — Kevir (Taş). 2 — Bergeh (Yön). 3 — Fikî (Meyve)

Ber bû me: Ber bî me hat (Bize doğru geldi)

Bercîs: Sîtêra Mîşterî (Jubiter yıldızı)

Ber dî barîn: Dî bîn bardane; yan jî xêr û bêr dî dîn, ked dî barînın, ber jî wan dî bare (Yük altındalar; ya da ürün verirler, ürün yağıdırırlar).

Berxîz: Ra be (Kalk)

Berî: Bê par (Yoksun)

Berk: Pelik (Yaprakcık)

Berq: Bîrûsk (Şimşek)

Berqe': Perde (Perde)

Berr: Bej (Kara parçası, deniz karşılığı)

Berzex: Bejê ziravê navbera du behran, sînor (İki deniz arasındaki ince kara parçası, sınır)

Besatîn: Bostanın (Bostanlar)

Beser: Dîtin (Görmek)

Best: Gırê da (Bağladı)

Beşaret: Mızgîn (Müjde)

Betî': Hêdîmeş (Ağır yürüyüşlü)

Bey': Fırotın (Satış)

Beyda: Deşt (Ova)

Beyt: 1 — Mala Xwedê (Kâbe). 2 — Şê'r (Şiir). 3 — Mal (Ev)

Beytê Meqsûd: Mala Xwedê ku xelk qesda çûyına wê dî ke (Halkın gitmek istediği Allahın evi)

Beytîl-eqsa: Mızgefta bajarê Qudîs'ê (Kudûs'teki Cami)

Beyyînat: Nişanên eşkera (Açık alâmetler)

Bezî: Camêrî (Cömertlik)

Bezlego: Qeşmer (Komik)

Bezm: Cıvata hengê (Eğlence meclisi)

Bê dad: Bê çare (Çaresiz)

Bêx: Kok û nejad (Kök ve soy)

Bêjen: Bêjîng (Kalbur)

Bê kêne: Bê kêrîn (Beceriksizdirler)

Bê newa: Bê hêz (Güçsüz)

Bêrite: Tewîrekî govende, jêra dî bêjîn «Govenda feqîyan»
(Bir halay çeşididir, «Fakiler halayı» denir)

Bê zar: Neçar (Çaresiz)

Bî bazîn: Bî lîzînî (Oynatalım)

Bîjarm: Pêk anîn (İfa etti)

Bî kalît: Bî nale (İnlesin)

Bî kêne: Bî kêrîn (Becerikli dirler)

Bîlh: Ehmeqî (Ahmaklık)

Bûmper: Tewîrekî sekbûye, belkî mertal be (Bir silâh, belki kalkandır)

Bûnyad: 1 — Hîm (Temel). 2 — Avayî (Yapı).

Bîrehne: Tazî (Çıplak)

Bîrhan: Delîl (Kanıt)

Bîtûnan: Zıkan (Karınlar)

Bî werîne: Wer ke (Serp)

- Bîdarî:** Heşyarî (Uyanıklık)
Bîh: Bîyok (Ayva)
Bîkr: Keçitî (Kızlık, bekâret)
Bilad: Welat (Ülke)
Bîcımle: Hemî (Hepsi)
Bîl Heq: Bî Xwedê, wxedayî (Allah hakkı için, ilâhî)
Bîlkul: Bî tevayî, hemî (Tamamen, hepsi)
Bîmar: Nexweş (Hasta)
Bîna: Bî dîtın, bî bênahî (Gören)
Bînende: Kesê ku dûr dî bîne (Uzağı gören)
Bîsat: Tîştê raxistî (Yaygı)
Bîşe: Dara mêşe (Meşe ağacı)
Bîz: Zık, bî mana turê bîn çena xezalan yê tîjî mîsk jî tê
 (Karın, ceylânların çeneleri altındaki misk kesesine
 de denir)
Buhran: Bê heşî (Kırız)
Buxar: Helma kelê (Kaynama buharı)
Buqrat: Zanakî Yunanî, bûye (Bir Yunan bilgini)
Bulhewes: Evîndarê ne jî dîl (Candan sevmeyen âşık)
Bû, Bo: Bêhn (Koku)
Bûse: Maç (Öpücük)
Bûş: Tevihev, têkılhev (Karışık)
Bûte: Şûşe (Şişe)

C

- Ca:** Cîh (Yer)
Cam: Qedeha meyê (İçki kadehi)
Camedirîde: Cıldırândî (Yırtık elbiseli)
Cametebdîl: Cılguhartî (Değişik kıyafetli)
Camîd: Hebûyê bê gan (Ruhsuz varlık)
Can: 1 — Gan (Ruh) 2 — Laş (Vücut).

- Canan, canan:** yar (sevgili)
- Canfeza:** Jînbexş, bexşendeyê kêfxweşîyê (Hayat, sevinç bahşeden)
- Canûb:** Alî (Taraf, yön)
- Cawîdanî:** Tîmmî (Ebedî)
- Cazîbe:** Hêza kêşanê (Çekici güç)
- Cebbar:** 1 Xurt (Güçlü). 2 — Zordest (Zorba)
- Cebhet:** Enî (Alın)
- Cebîn:** Herdu alîyên enîyê (Alnın iki yanı)
- Ced'an:** Gîrêkên por (Saç bükümleri)
- Cedel:** Mînaqeşe, pevçûn (Münakaşa)
- Cedîy:** Birca Karîkê jî 12 bîrcên rojê (Oğlak Burcu)
- Cegerrîş:** Cegerkul (Gönlü yaralı)
- Cela:** Rohnî (Işık)
- Celadet:** Mêrxasî, egîtî (Kahramanlık, yiğitlik)
- Celal:** Mezînatî (Büyüklik)
- Celew:** Hefsar (Yular)
- Celis:** Hevalê rûniştinê (Oturma arkadaşı)
- Cema:** Cîvîn (Toplanma)
- Cemad, Cemadat:** Hebûyên bê gan (Ruhsuz varlıklar)
- Cemaze:** Deve (Deve)
- Cemî':** Hemî (Hep)
- Cemîl:** Baş, meqbûl (İyi, makbul)
- Cemmaş:** Nukulxûz (Yamuk gagalı)
- Cenah:** Bask (Kanat)
- Cenan:** Dıl (Kalp)
- Cera:** Herîkandî (Akar, akıcı)
- Cerdan:** Talankerîn (yağmacılar)
- Ceres:** Zengıl (Çingirak)
- Cerh:** Bîrîn (Yara)
- Cewahûr:** Pîranîya «Cewher»e, hebûyê ku bî serê xwe dî kare hebûna xwe nîşan bî de, wek kevir. («Cevher»in çoğuludur, kendi başına varlığını gösterebilen varlık, taş gibi)

Cewcem: Em rastê mana vê kelîmê ne hatin (Bu kelime-nin anlamına rastlamadık).

Cewr: Sîtem (Zulüm, haksızlık)

Cewşen: Zîrx (Zırh)

Cez'e: Gırîna lî ser mirî, dîrandina cîlan û kışandina por jîbo mîrîna wî (Ölünün üzerinde ağlamak, elbiseleri yırtmak, saçları yolmak)

Cift: Cot (Çift)

Cîfû: Leyî, naser (Sel)

Cîûs: Rûniştin (Oturmak)

Cîndî: 1 — Sîpah (Asker). 2 — Xortê rînd (Güzel deli-kanlı)

Cînûd: Sîpahan (Askerler)

Cînûn: 1 — Dînîtî (Delilik). 2 — Dîn (Deli)

Cîr'e: Qurt (Yudum)

Cîrm: Guneh (Şuç)

Cîbîllet: Nejad û kok (Soy)

Cîhannuma: Nîşandayoxê dînê (Dünyayı gösteren)

Cîhanpenah: Kesê ku dînya pîştî xwe pê girê dî de (Dün-yanın güvendiği kimse)

Cîhat: Pîranîya «Cîhet»e yanî Rohelat, Roava, Bakur û Başur («Cîhet»in çoğulu, yani Doğu, Batı, Kuzey ve Güney)

Cîlwa: Rohnî (Aydınlık)

Coş: Keldayîn (Kaynamak, coşmak)

Cunbeş: Pêldayîn, hejîn (Dalgalanmak (sallanmak)

Cuz': Perçe (Parça)

Cûbar, Cûyebâr: Newal (Dere)

Cûdî: Çîyayê ku gemîya Nûh lî serê rawestîye (Nuh'un gemisinin durduğu dağ)

Ç

Çaha zîqenê: Çalıka navbera lêvê jêrîn û çenê (Alt dudakla çene arasındaki çukur)

Çak: Dırandî (Yırtık)

Çalak: Bı sıvıkî, bı lez (Çabucak)

Çapıkherekat: Kesê ku bı lez tev dı gere (Çevik davranan)

Çarane: Tewirekî cilê cengêbûye (Bir savaş elbisesiydi)

Çareebrû: Bırûreş (Karakaşlı)

Çaraperdaz: Dîtoxê çarê û havîlê (Çare bulan)

Çaşnigîr, çeşnigîr: Çêkîroxê kêfxweşîyê û hengê (Eğlen-ce düzenliyen)

Çawûş: Pêşleşger (Öncü askerler)

Çeng: 1 — Enîşk (Dirsek). 2 — Nivê Kulmê (Avucun yarısı). 3 — Tewirekî saz (Bir saz).

Çengî: Sazvanê saza çeng (Çeng sazının çalgıcısı)

Çerxe: Bı çerixe, bı bûre (Seğirt, geç)

Çest û çalak: Bı lez û çelengî (Çevikçe, çabucak)

Çeşm: Çav (Göz)

Çeşn: Heng (Eğlence)

Çillexane: Ciyê ku peresdar têda perestî dı kın (Abitlerin ibadet ettikleri yer)

Çırb: Xurekên rûnî (Yağlı yemekler)

Çıviyayi: Xuz (Yamuk)

Çihar erkan: Her çar goşe, yanî Rohelata bakurî, Roavaya bakurî, Rohelata başurî, Roavaya başurî (Dört yön, yani Kuzeydoğu, Kuzeybatı, Güneydoğu, Güneybatı)

Çiharum: Ê çaran (Dördüncü)

Çîn: Xûz (Yamuk)

Çîn çîn: Xelek xelek (Halka halka)

Çu: tu (Hiç)

D

Da': Jan (Hastalık)

Dad: 1 — Edalet (Adalet). 2 — Nav û deng (Şöhret).

Dafie: Hêza tehmdaynê (İtici güç)

Da heristî: Bı hevdûra da ket (Birlikte düştü)

Dair: Gêrbûyî (Yuvarlanan)

Daîrebend: Qora govendê ya gîlor (Halka gibi halay safı)

Daîye: Semed (Sebep)

Dalalê mitleq: Avarêtiya yekcarî (Mutlak sapıklık)

Dam: 1 — Davık (Fak). 2 — Heywanên kedî (Evcil hayvanlar)

Damad: 1 — Zava (Damat). 2 — Dîlan (Düğün)

Daman: Daw (Etek)

Dane: 1 — Tene (Tane). 2 — Tamikê nava davikê (Fakın içindeki yem)

Danış: Şêwr (Danışma)

Darû: Derman (İlâç)

Dasitan: Çiroka kevne (Destan)

Da'wet: 1 — Dua (Dua). 2 — Dîlan (Düğün).

Dawer: Xwedê (Allah)

Dawidî: Kesên lı ser dînê Dawid Pêxember (Hz. Davud'un dinine mensup olanlar)

Dayîn: Daye (Dadı)

